# DÎROK

## NAVÎN

# 2





## *AMADEKAR*

**Egîd Nasiro**

**Mihemed Elî**

## *LÊVEGER*

***Remezan Hemo***

***Rewendoz Zeynel***


**Ev pirtûk, ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**




# NAVEROK


## BEŞA 1

PÊŞKETINA OLÊN YEKXWEDAYÎ ........ 8
Hz. MÛSA Û OLA MÛSEWÎ ........ 12
Hz. ZERDEŞT ........ 15
Hz. MANÎ ........ 19
XIRISTIYANÎ ........ 22
MERCÊN DERKETINA ÎSLAMÊ ........ 26
FELSEFEYA Hz. MIHEMED ........ 29
SEDEMÊN PÊŞKETIN Û FIREHBÛNA ŞOREŞA ÎSLAMÊ ........ 31
BI PERGALKIRINA ÎSLAMA DIJBER Û DEMA EMEWÎ ........ 35
DEMA EBASIYAN ........ 38

## BEŞA 2

BERIYA ÎSLAMÊ TÊKILIYA KURD Û EREBAN ........ 47
DERBASBÛNA ÎSLAMÊ YA NAVA KURDISTANÊ ........ 51
DEMA EBÛ MUSLIMÊ XORASANÎ Û EBASIYAN ........ 54
SERHILDANÊN DIJÎ DESHILATIYA ÎSLAMA SUNÎ ........ 58
BANDORÊN ÎSLAMÊ YÊN LI SER CIVAKA KURD ........ 62
REWŞA HIN MÎREKIYÊN KURD ÊN DI PÊVAJOYA ÎSLAMÊ DE HATINE AVAKIRIN ........ 65
ÊRÎŞÊN XAÇPERESTAN ........ 70

## BEŞA 3

DI DÎROKÊ DE TÊKILIYÊN KURD Û TIRKAN ........ 75
PÊVAJOYA MELIKŞAH Û DI YEKÎTIYA KURD Û TIRKAN DE QUTBÛNA DESTPÊKÊ ........ 80
DEWLETA SELÇÛQÎ YA ANATOLÎ Û KURD ........ 83

DAGIRKERIYA MOXOLAN ........ 87

ÊRÎŞÊN HOLAKO Û TÊKÇÛNA ROJHILATA NAVÎN ........ 90

DEWLETA KARAKOYÛNIYAN ........ 94

## BEŞA 4

PÊŞKETIN Û BELAVBÛNA ÎMPARATORIYA OSMANIYAN ........ 100

DEMA ÎMPARATORIYÊ ........ 104

TÊKILIYA KURD, OSMANÎ Û SEFEWIYAN ........ 107

TÊKILIYÊN KURD Û SEFEWIYAN ........ 111

ROLA IDRÎSÊ BEDLÎSÎ Û PEYMANÊN KU KURDAN BI OSMANIYAN RE ÇÊKIRINE.114

PIŞTÎ PEYMANA KURD Û OSMANIYAN ŞERÊN HATINE KIRIN ........ 117

PEYMANA QESRÎ ŞIRÎN Û PARÇEBÛNA KURDISTANÊ ........ 122

LI KURDISTANÊ ENCAMÊN ŞERÊ DI NAVBERA KURD Û SEFEWIYAN DE ........ 125

## BEŞA 5

KAPÎTALÎZM ........ 133

ÇAVKANÎ Û SEDEMÊN PÊŞKETINA KAPÎTALÎZMÊ ........138

RONESANS ........ 142

AMÛRÊN KU KAPÎTALÎZMÊ JI BO PÊŞVEÇÛNA XWE BI KAR ANÎNE ........ 146

ŞOREŞÊN KU KAPÎTALÎZMÊ BI KAR ANÎN ........ 149

ŞOREŞA EMERÎKAYÊ........ 151

LI DIJÎ MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST RAPERÎNÊN GELAN ........ 154

LI DIJÎ MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST ŞOREŞÊN RIZGARIYA NETEWEYÎ........157

BANDORA KAPÎTALÎZMÊ YA LI SER ROJHILATA NAVÎN Û KURDAN ........ 161

**FERHENGOK** ........165







# BEŞA I

## PÊŞKETINA OLÊN YEKXWEDAYÎ

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1- Dîroka olên yekxwedayî û pêşketina wan, lêkolîn bike.
2- Derketina olên yekxwedayî, di civakan de rê li ber kîjan guhertinan vekirine? Lêkolîn bike.
3- Di encama olên yekxwedayî de çi guhertin di civakê de çêbûne?
4- Zerdeşt, di kîjan demê de derketiye û bandoreke çawa kiriye? Lêkolîn bike.
5- Têkoşîna Manî çawa bû û çi guhertin di civaka wê demê de çêkir?
6- 'Rêber APO' ji kîjan dema îslamê re dibêje, îslama dijber û çima? Lêkolîn bike.


# PÊŞKETINA OLÊN YEKXWEDAYÎ

## OLÊN YEKXWEDAYÎ Û KEVNEŞOPIYA HZ. BIRAHÎM

Hz. Birahîm weke bapîrê olên yekxwedayî, tê pejirandin û şoreşgerekî tund (radikal) e. Li Rihayê ji dayîk bûye û bi kiryara xwe, derbeyên gelekî mezin li pergalên Sumer û Misriyan daye. Van pergalan nûneriya şaristaniyên navendî yên dema xwe kirine.


Olên Yekxwedayî

Girêdayî pergala Sumer-Babil, li Rihayê sazûmaniya Nemrûd (Qral-Xweda) hebû. Li hemberî nûnerê şaristaniya navendî ya li herêma Nemrûd, di bin pêşengiya Hz. Birahîm de têkoşîn hat meşandin. Ev têkoşîn, hem li ser bingeheke etnîsîteyê, hem jî di çarçoveya kevneşopiya pêxemberan de pêk hat. Di encama vê têkoşînê de pûtên (senem) ku nûneriya zihniyeta pergala Qral-Xweda dikir, hatin şkandin. Ji ber vê yekê, Hz. Birahîm bi mencenîqê avêtin nava agir û nema karîbû li Rihayê bijî.










Divê mirov têkoşîna ku Hz. Birahîm bi rê ve biriye, di çend sergotaran de bigire dest.

**Şerê Hişmendiyê**



Hz. Birahîm, beriya her tiştî bi êrîşkirina ser zihniyeta heyî û avakirina zihniyeta xwe, dest bi kar kir. Ji ber ku pir baş di ferqa wê de bû ku weke tevahî pêxemberan avakirina civakê weke berhema zihniyetê digirt dest.

Têkoşîneke pir mezin li hemberî pûtên ku weke nûnerên Qral-Xweda û mîtolojiya ku di kesayetiya xwedayan de hêz dide pergala dewletê û wê weke şivanekî bi kar tîne û civakê jî, weke keriyekî diyar dike, daye meşandin. Hz. Birahîm şevekê dest davêje gurzê xwe û hemû pûtan dişkîne. Bi vî awayî, dest bi têkoşîna xwe dike.

Piştî ku Hz. Birahîm ji Rihayê derdikeve, mêşek diçe nava mejiyê Nemrut û di encama wê de Nemrûd dimire. Ev mirin, ne mirineke fîzîkî ye, mirineke ji mejî bû. Pê re pergala Nemrûd hildiweşe.

## Dawîlêanîna Qurbankirina Mirovan



Şoreşeke din a girîng ku Hz. Birahîm pêk anîbû, dawîlêanîna qurbankirina mirovan a ku wê demê dihat kirin, bû.

Qurbanîkirina mirovan, weke xelateke ku di van demên nêz de jî tê pêkanîn, hîn di wê demê de rakiribû. Li gorî gotinan, dema ku amadekariyên qurbanîkirina Îsmaîlê kurê xwe dikir, ji aliyê Xweda ve bi navbeynkariya Cebraîl, weke diyarî beranek ji bo Hz. Birahîm tê şandin û jê tê xwestin ku li şûna Îsmaîl, wî beranî bike qurban. Bi vî awayî, dawî li qurbanîkirina mirovan tê.

**Ji ber sê xalên sereke Hz. Birahîm neçar ma ku ji Rihayê derkeve.**


## Sedemên Bingehîn Ên Koçberiya Hz. Birahîm

1- Ji bo ku di nava vê pergala heyî de neyê pişaftin.

2- Heyîn û parastina qebîleya xwe ya komînal-demokratîk û awayê jiyankirina wan dana meşandin.

3- Meşandina têkoşîna xwe ya li dijî olên pirxwedayî.







## Pirsên Nirxandinê:

**1-** Hz. Birahîm pêxemberekî çawa bû û derbe li kîjan pergalê dabû?

**2-** Hz. Birahîm şerê çi kir û di dema kîjan qiralî de bû?

**3-** Sedemên bingehîn ên koçberiya Hz. Birahîm çi bûn?

**4-** Bersiva rast hilbijêre.

- Şoreşa duyemîn a Hz. Birahîm, şoreşa

**A)** Desthilatdariyê bû
**B)** Dawîlêanîna qurbanîkirina mirovan bû
**C)** Parastina pûtperestiyê bû

- Pêşniyara qurbanê, li ser

**A)** Xelîl bû **B)** Yaqûb bû **C)** Îsmaîl bû

## Hz. MÛSA Û OLA MÛSEWÎ



Çîroka jiyana Mûsa, li Misrê dest pê dike. Piştî Hz. Birahîm, pêvajoya civaka Cihû li Misrê sêsed sal di nava zor û astengiyan de derbas kiriye. Serpêhatiyeke tijî zor jiyaye. Rêbertî û pêxembertiya Mûsa, bi têkoşîneke ji nû ve avakirina netewekî ku bi koçberiya ji Misr û pêvajoya wê dest pê dike.

Qebîleyên Îbraniyan di bin yek neteweyî de kom kirin û ji bo pêkanîna wê, hewldanên afirandina nasnameyeke îdeolojîk a neteweyekî, yek ji hewldanên Mûsa ye. Li gorî ku tê payîn, koça ku di sedsala 13'an B.Z de dest pê kiriye, bi şêniyeke bi qasî 25.000 kesî pêk hatiye. Ev şênî, ji 12 qebîleyan bûn.




Li gorî ku agahiyên misoger ên di derbarê jiyana wî de tunene jî, lê tê bawerkirin ku di sedsala 13'an B.Z de jiyaye. Jêdera girêdayî jiyana wî, bi tenê pirtûka pîroz a cihûyan Tewrat e. Di Tewratê de jî jînameya Mûsa, tenê weke efsaneyekê tê ravekirin. Li gorî ravekirina Tewratê, di dema Firewnê Misrê Tutanxamon de hatiye dinyayê. "Bi fermana Xwedê" neteweya xwe (Qebîleya Îbraniyan) ji Misrê derxistiye, ber bi xaka ku “soza wê dayî” ve







dikeve rêwîtiyeke pir zor û asteng. Pêxemberê damezrînerê Cihûyan e. Ji ber vê yekê, ji ola Cihûyan re dibêjin **Mûsewîtî**. Navê Cihûyî jî, ji peyva "yahwe" ku peywira navê "yahowa" yê xwedê lê hatibû kirin, hatiye zêdekirin.

Di nava pêxemberan de yê ku herî zêde bi civaka xwe ve mijûl bûye, Hz. Mûsa ye. Bi rastî jî, bi hewldaneke pir mezin xebitiye ku reng bide civaka xwe, lê tevî vê jî, ji bo ku neteweya xwe bi civakîbûnê li pey rêgezên sincî û fermanên ku ji bo wî hatine, her tim xebata xwe domandiye.

**Deh fermanên ku ji Hz. Mûsa re hatine, ev in:**

**"Ez Yahowayê ku min tu ji koletiyê rizgar kirî":**

1. Ji derveyî min tu bawerî bi tu Xwedayên din nayînî.
2. Pût çênakî.
3. Xwe mezin nakî û bi navê Yahowa bi derewan sond naxwî.
4. Şeş rojan tu yê bixebitî, roja şemiyê jî bêhndanê bikî.
5. Rêz bidî dayîk û bavê xwe.
6. Kuştinê nekî.
7. Diziyê nekî
8. Derewan nekî.
9. Zina nekî.
10. Çav bernadî ser heyîna cîranê xwe.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Hz. Mûsa, di nava rewşeke çawa de derdikeve?


2- Armanca Hz. Mûsa ya ji komkirina qebîleyên Îbraniyan, çi bû?

3- Jêdera bi tenê girêdayî jiyana Hz. Mûsa, çi bû?

4- Jiyana Hz. Mûsa, di Tewratê de bi çi awayî hatiye ravekirin?

5- Fermanên ku ji Hz. Mûsa re hatine, çi bûn?







## Hz. ZERDEŞT



Beriya Hz. Zerdeşt li kurdistanê ola mîtraîzm hebû. Bi awayekî ola xwezayî ye. "roj" weke xweda bi nav dikin û pê bawer dikin. Ayînên wan rahîbên bi navê max, mag, magu bi rê ve dibin. Di nava ola mîtraîzmê de sîstema qast heye.

Hz. Zerdeşt ji nava mîtraîstan derdikeve û dixwaze di nava vê olê de guhertin û reforman pêş bixe. Ew têkoşîn bi sedsalan berdewam dike. Ji bo vê yekê kesên ku bi navê Zerdeşt tên binavkirin, ne tenê yek kes e. Ji yên ku pêşengiya reformasyona di nava mîtraîstan de dikin re Zerdeşt tê gotin.

Hz. Zerdeşt ê ku tê payîn di salên 1000'î B.Z de jiyaye, feylozofekî dema xwe ye ku xwedî zanist û ramanên pêşverû ye. Behsa sê pêxemberên ku ola Zerdeştî afirandiye tê kirin:



Zerdeşt

**1**- Zerdeştê ku di 3000'î B.Z de jiyaye, yê bi navê Mihabad.
**2**- Zerdeştê ku 2000'î B.Z yê bi navê Hoşeng (tê gotin ku ev Hz. Birahîm e).
**3**- Zerdeştê ku di sedsala 6-7'an B.Z de Zerdeşt bi xwe ye.

.

Li gorî hin nêrînan, Zerdeşt ne kesek e, weke kevneşopiyekê ye. Ya nêzî rastiyê, ew e ku derketina ola Zerdeştî di navbera salên 1000 û 600'î B.Z de ye.

Hz. Zerdeşt, ji Kurdên Medî ye û pirtûka pîroz a ola Zerdeştî "Avêsta" bi kurdî hatiye nivîsîn û ev jî kurdbûna wî piştrast dike. Ev pirtûk, ji aliyê şagirtên Zerdeşt ve di "Zend-Avêsta" de hatiye şîrovekirin. Ola Zerdeştî, ji aliyê Zerdeştê Sêyem ve hatiye birêkûpêkirin û belavkirin.

Hz. Zerdeşt, li Rojhilatê Kurdistanê li nêzî Ûrmiyê hatiye dinyayê. Di sedsala 7an B.Z de jiyaye. Li gel ku mêjûya jidayîkbûn û mirina wî nayê zanîn jî, tê payîn ku di temenê 77 salî de koça dawî kiriye. Li Ûrmiyê ji dayîk bûye, xwe kişandiye şkefteke nêzî heman cihî. Ola xwe, di pêvajoya xwevekişanê de pêş xistiye, pirtûka xwe li vê derê nivîsiye. Damezrînerê Zerdeştiyê ye.

## Felsefeya Hz. Zerdeşt

Divê Zerdeştî, tenê weke ol û Hz. Zerdeşt jî weke pêxember neyê nirxandin. Bi qasî ol û pêxembertî, felsefeya sinc û feylezofiyê jî, nirxandin di cih de ye. Weke çêkera ol a dualîzmê û erkên ku dane pêşiya civakê, ew hêjayî vê dîtinê ye. Ahûramazda, weke sembola Xwedayê qenciyê û Ehrîmen jî weke sembola xwedayê kirêtiyê tê zanîn.


Zerdeşt







Nûneriya qencî û kirêtiyê sedem û jêderên herî girîng ên heyîna têkoşîn û şerê di navbera van her du aliyan de ye. Ji ber ku her du jî sedemên bûyîna hev û du ne. Kirêtî, sedema hebûna qenciyê ye. Weke tarîtî û ronahî, şev û roj, mirin û jiyana ku nîşanî me dide; qencî û kirêtî jî, bi vî awayî hebûna xwe nîşanî me didin û mirovan ber bi lêgerînên baş ve dibin. Tişta ku di vê têkoşînê de herî bi bandor dibe, li dijî ronahî tarîtî, li dijî qencî kirêtî û li dijî Ahûramazda jî Ehrîman e. Wê demê jî, cîhana ku em li ser dijîn, wê ronahî, tarîtiyê têk bibe û aştî bi ser bikeve.

Her wiha, bi nêzîkatiya xwe ya ji jinê re, rêzdarî û wekheviyê bingeh digire. Girîngîdayîna paqijiyê, yek ji mijara destpêkê ye. Ked û hilberînê bingeh digire. Pîrozbûnê dide şînatiyê û xwezayê diparêze. Qurbanîkirina lawiran qedexe kiriye, ji şîr û rûnê wan sûdgirtinên baştir dîtine û hêza xwe di çandiniyê de pêşkêş kiriye. Di mijara sincê civakê de pir baldar e. Di vê mijarê de rêgeza; “***baş bihizire, xweş biaxive, rast pêk bîne**.*” ku ev weke nêzîkatiya wî ya sincî nîşan dide, weke biwêjeyekê gihîştiye ta roja me ya îro jî.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Behsa çend pêxemberên ku ola Zerdeştî afirandine, tê kirin û navê wan çi ne? Binivîse.

2- Bersiva rast hilbijêre

- Li gorî hin nêrînan, Zerdeşt

  A) Kesek e B) Kevneşopiyek e C) Destanek e

- Hz. Zerdeşt li Rojhilatê Kurdistanê, li nêzî ............. hatiye dinyayê.

  A) Ûrmiyê B) Çiyayê Lêlûn C) Silêmaniyê

- Pirtûka Zerdeşt

  A) Avesta ye B) Zend Avesta ye C) Zend e

3- Divê Hz. Zerdeşt û Zerdeştî, weke çi bên nirxandin?

4- Hz. Zerdeşt di mijara sincê civakê de pir baldar e. Di vê mijarê de kîjan rêgez bingeh girtiye?

5- Nêzîkatiya Zerdeştiyê ya ji jin û xwezayê re çawa bû? Binirxîne.








## Hz. MANÎ (215-276 P.Z)


Manî

Hz. Manî yê ku di sala 215'an P.Z de hatiye dinyayê zanyar, feylezof û kesekî oldar e ku dixwaze cewherê ola Zerdeştî, Xiristiyanî û Bûdîzmê bi sentezeke nû derxe holê, rastiya wan nû bike û bike rêxistineke cîhanî.

Hz. Manî, di dema Sasaniyan de jiyaye. Her çi qas serdemekê di qesrên Sasaniyan de maye jî, lê tevlî têkiliyên desthilatdariyê nebûye. Diyar dike ku olên herêmî û neteweyî, tenê rê li ber pirsgirêkan vedikin û nagihêjin xwedê.



Her wiha, aliyê baş û erênî yê hemû olan digire dest û dixwaze bi çêkirina sentezekê, olekî gerdûnî pêk bîne. Ji ber vê yekê, xwe weke xeleka dawî ya zincîra pêxemberan ku ji Birahîm heya digihêje Zerdeşt, Îsa û Bûda dibîne.
Hz. Manî di sala 276'an P.Z de ji aliyê Sasaniyan ve tê kuştin.


Belgeyeke ji sedsala 8'an

## Felsefeya Manî

Hz. Manî destpêkê felsefeyeke xwezayî di serdema xwe de pêş dixe. Li gorî Hz. Manî, gerdûn û hemû heyberên di gerdûnê de li ser bingehê dijberiya qencî-kirêtî, ronahî-tarîtî hatine avakirin. Ji bo ola ku pêş dixe, dibêjin Manîzm. Bingeha Manîzmê, xwe dispêre rêgeza "qencî û kirêtî" ya ola Hz. Zerdeşt. Di gerdûnê de rêgeza bingehîn, qencî û ronahî; giyan e, kirêtî û tarîtî; beden e. Hezkirin, kirêtiyê di nava qenciyê de dipişivîne û mirovan digihîne yekbûnê. Ji bo gihîştina vê armancê, pêwîst e ji hemû derew û girêdanan dûrketin çêbibe û wiha bê jiyîn.

Hz. Manî armanc kiribû ku beşê rasteqînî yê hemû olên beriya xwe yên ku bi sirûşan (wehiyan) hatine, weke Xiristiyanî û bi taybetî ola Zerdeştî bigihîne hev, oleke rast û cîhanî ava bike.

Eger ne ji ber komkujiyên paşverû yên Sasaniyan bûya, Manîtî jî, wê weke ola xiristiyanî, bibûya xwedî hêza belavbûyî. Zanyar di vê mijarê de hemraman in. Tê zanîn ku weke rêbaz belavî Ewrûpa jî, bûye û bandora xwe li serdema navîn kiriye. Kariye li rojhilat di nava Tirkên Ûygûr de xwe bigihîne asta ola fermî. Demeke dirêj jî weke ol hebûna xwe domandiye, lê piştre hêdî hêdî lewaz bûye û bi demê re li gel ola xiristiyanî bûye yek.



Dara jiyanê







## Pirsên Nirxandinê:

1- Hz. Manî kengî hatiye dinyayê û bingehê ola xwe ji kû girtiye?

2- Hz. Manî, çima xwe weke xeleka dawî ya zincîra pêxemberan dibîne?

3- Li gorî Hz. Manî, gerdûn û hemû heyberên di gerdûnê de li ser kîjan bingehê ava dibin?


4- Ji bo ku mirov bigihêjin yekbûnê, çi pêwîst e?

5- Kê derî li Manîtiyê girt?

6- Hevokên rast bi tîpa (R), yên şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bike.

- Hz. Manî di sala 215'an B.Z de hatiye dinyayê. ( )
- Hz. Manî di sala 276'an P.Z. de tê kuştin. ( )
- Hz. Manî armanc kiribû ku oleke rast û cîhanî ava bike. ( )

# XIRISTIYANÎ



Hz. Îsa

Xiristiyanî oleke yekxwedayî ye, koka xwe ji Rojhilata Navîn û ola Birahîmî digire. Ji Hz.Îsa re tê gotin **Îsayê Nesranî** û ji xiristyaniyê re jî **Îsawîtî** tê gotin. Beriya avakirina ola xiristyanî jî, têkoşîneke civakên pûtperestan li Qûdusê hebû. Lê ola xiristiyanî bi Hz. Îsa re, ango bi zayînê re dest pê dike, heya 30 salî P.Z bi mirina Hz.Îsa û şûnde ji aliyê hewariyên wî ve tê berfirehkirin. Li şûna yekxwedatiya Cihûyan sêkuça bav-kur-giyana pîroz cih digire. Di derbarê dayîkbûn û mirina Îsa de dîrokzan û nivîskar hizirên cuda cuda dibêjin.

Di cîhanê de xiristiyanî ola ku herî zêde bawermendên wê hene û ola herî belav e. Xiristiyan belavî hemû deverên Cîhanê bûne, lê herî zêde li Ewrûpa, Emerîka û Awûstûralya tê dîtin. Ji parzemînên din ên Cîhanê zêdetir li Asya û Efrîqa di nava baweriyên din ên olî de têkel dijîn. cara Yekem xiristiyanî li Anatolyayê belav bûye û gelên ku bawerî pê anîne Ermen, Suryan û Grek in.

Ola xiristiyanî, di destpêkê de ola civakên bindest bû. Lê bi pejirandina Împaratoriya Roma ya ola xiristiyanî re ku di sala 325’an de dibe ola împaratoriyê, piştî ku bû ola împaratoriyê, êdî dibe ola desthilatdariyê.

Pirtûka pîroz a xiristiyaniyê, Încil "Mizgînî" e.







## Di Xiristiyaniyê De Hz. Îsa



Mirovheziya Hz Îsa

Hz. Îsa ji kevneşopiya Hz. Birahîm tê û divê mirov weke yekem rêxistina civakî ya xizanan a dîrokê pênase bike. Ji ber ku derketina Îsa gerdûnî, mirovî, demokratîk û komînal bû.

Ji ber ku mercên derketina Hz. Îsa ji yên din cudatir bûn, serdema derketina olên din, rastî bihêzbûn û mezinbûna pergala koledariyê dihat, lê Hz. Îsa di kesayetiya Împaratoriya Roma de, rastî dema qeyran û dawîhatina pergalê tê.



Şîva dawî

Derketina Hz. Îsa, bêyî ku tu sînoran ji bo xwe binase, berteka hevbeş a hemû beşên civakê da der. Bi rastî, Împaratoriya Romayê di serdema xwe de împaratoriya herî

mezin bû ku hema bêje belavî sê parzemînên cîhanê bûbû. Li gorî xwe desthilatdarê cîhanê bû û her kes koleyê Romayê bû. Hemû beşên civakê yên ku ziyan ji pergala Romayê didîtin, bi Romayê re di nava nakokiyan de bûn û hêviyek wan ji "Mesîhê" rizgarker hebû. Di vê demê de Îsa, weke rizgarker di dîrokê de cihê xwe girt. Tişta ku ew mezinkirî jî, dijberiya pergalê û mercên dîrokî bûn. Hz. Îsa li hemberî koletiya gerdûnî ya Romayê bi şêweyekî "navnetewî" ku bikare bibe gerdûnî û pirsgirêkên hemû mirovan çareser bike, rabûbû.

**Rêgezên Felsefeya Hz. Îsa**

**Felsefeya Hz. Îsa xwe dispêre van rêgezên bingehîn:**

**1- Aştî**
**2- Sinc**
**3- Başî**
**4- Xweşiktî-ciwanî**
**5- Hezkirina mirovan (Mirovhezî)**







## Pirsên Nirxandinê:

1- Hz. Îsa, bingehê ola xwe ji kû girtiye?

2- Çima, xiristiyanî weke yekem rêxistina civakî tê pênasekirin?

3- Bi pejirandina Împaratoriya Romayê ya ola xiristiyanî re, çi guherîn di olê de çêdibin?

4- Hevokên rast bi tîpa (R), yên şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bike.

- Li şûna yekxwedatiya Cihûyan, sêkuça bav-kur-giyana pîroz cih digire. ( )
- Xiristiyanî herî zêde li Ewrûpa, Emerîka û Awûstûralya tê dîtin. ( )
- Xiristiyanî, cara yekem li Angolayê belav bûye. ( )
- Pirtûka pîroz a xiristiyaniyê, Tewrat e. ( )

5- Rêgezên felsefeya Hz. Îsa, çi ne?

## MERCÊN DERKETINA ÎSLAMÊ

Îslamiyet ku mezheba dawî ya kevneşopiya Hz. Birahîm e di nîvgirava Erebistanê de derketiye. Hz. Mihemed pêxemberê Îslamê ye, di sala 571'ê P.Z de li Mekeyê ji dayîk bûye. Meke cihekî bazarê yê navendî yê qebîleyên Ereban e ku lê dihatin gel hev, kirîn û firotin dikirin. Cihekî ku xiristiyanî, cihûtî û pirxwedaperestiyê lê jiyaye. Hz. Mihemed ji malbateke hejar a malbata Haşimî ya ji eşîra Qureyşiyên bazirgan e.



Erebîstan


Bavê wî Ebdulah û dayîka wî Emîna ye. Ew di temenê şeş salî de bû, ku dayîka wî jiyana xwe ji dest da. Dikeve xizmeta bazirgana bi navê Xedîce ku di wê pêvajoyê de bi bandor e, piştre pê re dizewice. Bi vê zewacê re çîna xwe ya xizan derbas dike. Her ku bazirganî pêş ket, nakokiyên di navbera eşîra Qureyşiyan û yên din de zêde bûn. Ji ber ku ew arîstokratên eşîran bûn, destûr nadin pêşketina Hz. Mihemed. Ev, şerê çînî yê di nava eşîrê de ye. Xedîce û Hz. Mihemed rola pêşkêşiyê ji çînên bazirgan re dikirin. Tê texmînkirin ku konfederesyona eşîran şêweyê rêveberiya Mekeyê bû. Xwediyê karekterê koledariyê bû. Di Mekeyê de sê pûtên mezin ên bi navê Lat, Menat û Ûzza hebûn. Vê rewşê karekterê-taybetmendiyên rêveberî û hiyerarşiya Sumeran diyar dikirin. Ola wan a fermî







pirxwedaperestî ye. Ji ber vê sedemê, Hz. Mihemed dijberî pirxwedaperestiyê ye.




Dema ku Hz. Mihemed ji dayîk bûyî, du împaratoriyên bi navê Bîzans û Sasanî desthilatdariya xwe li ser nîvgirava Erebistanê dimeşandin. Li başûrê rojava, li ser Yemenê bandora xiristiyanên Hebeşîstanê belav dibe. Cihû belavî hemû aliyên nîvgiravê bûbûn û sûd ji qeymaxa bazirganiyê digirtin. Rahîbên Suryanî zêdetir di rewşa muxalefetê de bûn. Qebîleyên ereban ên xwecihiyên bingehîn ên nîvgiravê tevlîheviyek a civakî-aborî dijiyan. Di vê pêvajoyê de ew pir tengav bûbûn. Ereb her weke li benda mûcîzeyekê bûn. Îslamiyet, navê vê mûcîzeyê bû.

Ew pêvajoyeke wisa bû, ku şer û pevçûnên dijwar ên ramyarî, olî û mezhebî dijiyan. Têkoşîna civakî, di bin qalikê ayînî de dihat birêvebirin. Ev pêvajo, bi hêviya ku Mehdî wê careke din vegere û cîhanê bi rê ve bibe. Hz Mihemed, di aliyê têgihîştina demê de gelekî xwedî huner bû. Bawer dikir ku ew dikare bibe pêxemberê ku li bendê ne. Dema dikeve riya bazirganiya Şam-Mekeyê ji rahîbê Nastûrî Behîrayî pir

agahiyan distîne. Ji nava qebîleyên ereban ên ku di tarîtiya nezaniyê de ne û her tim di nava pevçûnê de ne, weke rojekê derdikeve, wê dema kêfxweşiyê were. Sedsala 7'an pêvajoya derketin û belavbûneke berfireh a îslamê ye. Îslam di rastiyê de têkiliyên koledariya hişk û girêdanên etnîk ên ku li beramberî pêşketinan dibin asteng, li ser bingehê bajarvaniyê diguhere. Şoreşa hişmendî ya civaka feodal a ku dibe sazûmaniyeke pêşketîtir û çêkera wê ya îdeolojîk amade dike. Îslam, şoreşa dawî ya mezin a şaristaniya Rojhilata Navîn e. Heya nêzî sedsala 12. ji bo pêşketina civaka feodal, rola îdeolojiya bingehîn û çêbûna polîtîkayê dilîze.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Hz. Mihemed, bingeha  ola xwe ji kû girtiye?

2- Meke, cihekî çawa bû?

3- Dema ku Hz. Mihemed bi Xedîceyê re dizewice, dikeve kîjan qonaxê?

4- Beriya îslamê, rewşa qebîleyên ereb çawa bû?

5- Hz. Mihemed, agahiyên xwe ji kê digire?

6- Di rastiyê de îslamiyet çi diguherîne?






## Felsefeya Hz. Mihemed

Hz. Mihemed di derbarê pêvajo û cih de xwedî agahî bû. Dagirkeriya Bîzans û Sasaniyan a ku li ser herêmê dihat meşandin, bandorên rizandinê li ser civakê didan jiyîn. Pirsgirêkên civakê yên ku ji ber van her du pergalan dijiyan, têgihîştibû, ku pêwîst e bi şêweyekî radîkal ji her du pergalan, qutbûn çêbibe. Ew bi xwe jî, weke Hz. Îsa koleyan û jinan nêzî xwe dibîne. Ji civakên Mûsewî û Suryaniyan bandor dibe, lê dibîne ku ew nikarin pirsgirêkên civakê çareser bikin. Di çavên wî de pûtên Mekeyê kevneşopiyeke ku dema xwe qedandî ye.

Peyama "Pêxemberê Dawî" ya ku ji kevneşopiya Birahîm tê, pir bala wî dikişîne. Wêraye reforma sêyem a mezin li ser wê kevneşopiyê pêk bîne.

Di destê wî de Quran û hedîs hene, ev bi qasî bernameyeke ramyarî û îdeolojîk, bi berfirehî sincekî nû diyar dike. Rêgezên aboriyê jî hene. Her wiha, zagonên şer jî ji nû ve ava dike. Di derbarê ji nû ve şîrovekirina xweda de sirûşên wî pir dişibin kevneşopiyên (deh fermanên Mûsa). Zelal e ku hewl daye sincekî nû bide qebîleyan û armancên nû yên ramyarî bi pêş bixe.

Di pêvajoya ku Hz. Mihemed li Medîneyê de, gihîşt hêzeke ramyarî, xeyalên xwe zelaltir kirine. Di mizgefta Medîneyê de pirsgirêkên civakî gotûbêj dike. Di civakê de her kes di mijarên bingehîn de nêrînên xwe diyar dikir û hesab dipirsî. Hevgirtiyên civînan û rêvebirina wan bi şêweyekî demokratîk bûn. Jin, kole, hemû netewe û komên etnîk tevlî dibûn. Jinan li gel zilaman bi hev re nimêj dikirin. Heya mirina Hz. Mihemed mizgeft vê rola xwe dilîze. Perestin



Pirtûka Pîroz a Îslamê

(nimêj, rojî, zekat) di çarçoveya xebatên perwerdeyê yên bihêzkirina kesayeta ku armanc dikir de bûn. Diyar e ku di destpêkê de şovenîzma rêgezperestî û Neteweperestî tune bû. Cudahî di navbera çîn û qebîleyan de tune bû. Her wiha, di civînên destpêkê yên di mizgeftan de rêveberî û fermandar dihatin hilbijartin. Gelek biryarên ku bêdadiyê ji holê radikin, hatin girtin. Îslama ku di rewşa derketinê de ye, ji demokrasî û dadweriya civakê re vekirî bûn, jixwe dema ku ev tevlîbûna demokratîk nebe, ne gengaz bû ku ew qas qebîle, xizan û çîna navîn di cih de bikevin tevgerê.

Xizanên qebîleyê bi rastî jî, ji navê îslamê û di riya xweda de bêguman bûn. Lê arîstokrasiya qebîleyan û beşekî mezin ê di asta fermandariyê de hîn Hz. Mihemed dijiya, ketin nava hizirînên berjewendiyên xwe. Dizanîn ku têgeha xweda propagandeya wî karî ye. Pêvajoya çar xelîfeyan jî di nav de, di nava 20 salan de desthilatdariyê dixin destê xwe. Îslamiyet, di pêvajoyeke ji tevgerên Mûsewî û Îsawî kurtir de weke pergalekê ket destên hêzên şaristanîperestan. Hîn pêncî sal bi ser derketina wî re derbas nebûbû, li Şamê bû hêzeke şaristanî ya klasîk. Li gel kuştina Ehlî-Beyt, gelek taybetmendiyên wî yên erênî jî hatin kuştin. Ne îslam, "dijberê îslamê" li pey xwe hişt.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Hz. Mihemed, kê nêzî xwe dibîne?
2- Hz. Mihemed, bi çi awayî li pûtên Mekeyê dinêre?
3- Rola mizgeftê ya di dema Hz. Mihemed de çi bû?
4- Piştî mirina Hz. Mihemed, çi guherîn çêdibin?
5- Valahiyên li jêr, dagire.

Di destê Hz. Mihemed de ........... û ........... hene**,** ev bi qasî bernameyeke ......... û îdeolojîk, bi berfirehî sincekî nû diyar dike. Rêgezên .............. jî hene. Her wiha, zagonên ........ jî ji nû ve ava dike. Di derbarê ji nû ve şîrovekirina .............. de sirûşa wî pir dişibe kevneşopiyên ....... ................. Mûsa.







## Sedemên Pêşketin û Firehbûna Şoreşa Îslamê



Meke, Cihê Derketina Îslamê

Belavbûna îslamiyetê ya ber bi bakur û rojava ve û şerê di navbera wan û dewletên xiristiyanan de.

Îslamiyet oleke ku di demeke kurt de, împartoriyeke berfireh damezrandiye. Her çi qas xiristiyanî piştî têkoşîneke 300 salî bûye desthilatdar jî, îslamiyetê di demeke kurt a bi qasî 30-40 salan de karîbû împaratoriyên ji kevneşopiyên dewletan ên hezarê salan bi bin bixe. Di vê derê de bi qasî ku civakên wê demê alozî dijiyan, împaratoriyên hezarê salan jî di qonaxa rizînê de bûn. Ev rewş di pêşketina îslamê de roleke girîng dilîze.

Îslamiyet di salên 610'an de li bajarên Meke û Medîne yên di nîvgirava Erebistanê de pêş ket. Îslamiyet ji aliyê sê împaratoriyên mezin ên wê serdemê yên weke Bîzans, Sasanî û Hebeşîstanê yên xwedî ol û bîrdoziyên cuda ve hatibû dorpêçkirin. Ger li beramberî van, têkoşîn pêş nekeve, li gel van şer neyê kirin û ev neyên şkandin, wê şansê pêşketina îslamiyetê nebûya. Hz. Mihemed û derdora wî ya nêzîk, di zanabûna wê de bûn. Dema ev zanabûn û rastî li gel îdeolojiyê bûn yek, berfireh bûn û weke neçariyekê lê tê. Heya Anatolya, nava Asya, tevahiya Bakurê Efrîqa û Îspanya pêş ketin û hemû hêzên hatin beramberî wan şkandin.



Dîmenek Ji Şerê Misilmanan

Hz. Mihemed di jiyana xwe de, hemû derdor û qebîle xistin bin çavdêriyê. Şerkirina li hemberî hêzên mezin, sînordarkirina wan, berfirehkirina qadên ku ol lê belav bibe weke neçariyekê bû. Bi vê armancê li beramberî împaratoriya Bîzansî dest bi êrîşan kir. Hz. Mihemed, di rojên xwe yên dawî de bi vê armancê artêşek a di bin fermandariya Usama Bin Zeyd de şand ser artêşên Bîzans ên ku di axa Sûriyê de bûn, lê ji ber ku Hz. Mihemed koça dawî kir, bêyî ku şer çêbibe, ev artêş bi paş de vegeriya. Piştî mirina Hz. Mihemed, desthilatdarî ji nû ve tê sazûmankirin. Ji nû ve dest bi şerên fetihê kirin û yên di nîvî de mane berfireh û temam kirin.

Cara yekem di pêvajoya xelîfetiya Ebûbekir de ew û împaratoriya xiristiyanan (Bîzansî) sala 634'an hatin pêşberî hev. Artêşa ku di bin fermandariya Xalid Bin Welîd de hatiye amadekirin ji bo ku Iraq were bidestxistin ket ser rê, li aliyê din jî bi armanca çûna ser Şamê û desteserkirina împaratoriya Bîzansê êrîş amade kirine. Fermandarên bi nav û deng ên weke Emir Bin As, Ebû Sûfyan, Ebû Ûbeyde Elcerah, Şerhebîl Bin Hesne fermandariya van artêşên îslamê dikirin. Artêşa di bin fermandariya Xalid Bin Welîd a ku Iraq bi dest xistiye jî, tevlî van hêzan bû û artêşa îslamê hat temamkirin. Di peravên çemê Yermûk de ew û artêşa Bîzans ketin nava şer û artêşa Bîzans hat şkandin. Encamên vî şerî, ji bo îslamê rolek a diyarkirina vîna şer









pêk anî. Di encama vî şerî de di serî de Iraq, Libnan, derdora Şam û Sûriyê ket destê artêşên îslamê.

Piştî vî şerî, ji sala 640'î û şûn ve li aliyekî ber bi Misr, Efrîqaya Bakur, ji aliyê din ve ber bi qadên di bin desthilatdariya împaratoriya Sasaniyan ve dest bi êrîşan kirin. Di sala 641'ê de Misr bi tevahî hat bidestxistin. Di salên 670'yî de Tûnus, 674'an de Cezayîr û 676'an de jî Fas bi ser axa împaratoriya îslamê ve tê zêdekirin. Piştî wê jî, artêşên di bin fermandariya Tariq Bin Ziyad de Endulisa Îspanyayê bi dest dixe. Artêşên îslamê, ji aliyê bakur û rojava ve li tevahî peravên Derya Spî ya Efrîqayê belav bûye, li Ewrûpayê jî heya Pîreneyan belav dibe.

Dewleta Emewiyên, Endelusî ya li Îspanyayê di sala 756'an de hat damezrandin û bi qasî 300 salî jiyana xwe berdewam kir. Di sala 1031'ê de ev dewlet tê hilweşandin. Lê civaka îslamî ya li wê derê demeke zêdetir heyîna xwe berdewam kir. Artêşên îslamê di salên 668, 674, 717 û 781'ê de çar caran Qestantîniya ku yek ji navenda xiristiyanan bû, dorpêç kir, lê nikarîbû bi dest bixe.

## Dema Çar Xelîfeyan

Piştî mirina Hz. Mihemed, Hz. Ebûbekir (632-634) dibe xelîfeyê îslamê. Hz. Ebûbekir yekem xelîfeyê bi riya hilbijartinê hatiye ser kar û bi awayekî xwezayî dimire. Piştî wî, Hz. Umer (634-644) dibe xelîfe, di vê demê de bi şer û pevçûnên dijwar û rijandina xwîna pir zêde, Kurdistanê dagir dikin. Ji bo ku Hz. Osman bibe xelîfe, ji aliyê Hz. Umer ve Şûrayek tê avakirin û ji aliyê wê Şûrayê ve xelîfetiya Osman tê dayîn. Hz. Osman di navbera salên (644-656) dibe xelîfe. Piştî Hz. Osman, Hz. Elî di navbera salên (656-661) de dibe xelîfeyê îslamê yê çarem.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Ji bo avakirina împaratoriyekê çi cudahî di navbera îslam û xiristyaniyê de hebû?

2- Îslamiyet li kû derdikeve û ji hêla kê ve dorpêçkirî bû?

3- Hz. Mihemed di rojên xwe yên dawî de, kû der kiribû armanca êrîşên xwe û bi fermandariya kê bû?

4- Artêşa îslamê, çawa temam dibe?






## BI PERGALKIRINA ÎSLAMA DIJBER Û DEMA EMEWÎ (661)

Emewî, xanedaneke ku piştî çar xelîfeyan (632-661) bûne desthilatê dewleta erebên misilman. Piştî kuştina Hz. Elî, di sala 661'ê de Emewî tên ser desthilatdariyê û di sala 750'î de ji aliyê Ebasiyan ve tên hilweşandin.




Dewleta Emewî

Piştî mirina Hz Elî, Mûawiye bûye xelîfeyê serkêşiya dewleta îslamê. Ji ber ku Mûawiye ji malbata Emewiyan e ji bo hemû demên xelîfeyên ku ji koka wî tên re dema Emewî dibêjin. Her çi qas Mûawiye bûye xelîfe jî, lê ne zêde rihet e. Ji ber ku kurê Hz. Elî, Hz. Hesen ketiye nava tevgerekê. Ji ber vê jî, di navbera misilmanan de şerekî nû yê navxweyî rû dide. Ji ber ku Hz. Hesen nedixwest di navbera misilmanan de şer derkeve, hin şert û merc dan pêşiya Mûawiye û xwe ji şer paş ve kişand. Li gorî wan mercan, dema Mûawiye bimire, cihê wî birayê Hz. Hesen, Hz. Huseyin wê bibûya xelîfe. Mûawiye ev daxwaza wan pejirand. Dema Mûawiya, ji milekî ve metirsiya




hundirîn û ji milê din ve jî tevgerên fetihkirinê berdewam dikirin, li ser girava Rodos û Girîtê re êrîş hatin kirin. Cara yekem, Stenbol ji aliyê hêzên leşkerî yên îslamê ve hat dorpêçkirin. Lê belê, bi saya sûrên stûr ên Stenbolê û agirê bi mencenîqan davêtin, ji dorpêçê rizgar bû.

Saziya bi navê dîwan a ku di dema Hz. Umer de (634-644) derketiye, Emewiyan zêdetir pêş xist. Xelîfeyan bi riya karmendên mîna wezîran, dest bi rêvebirina karên dewletê kirin. Axên Emewî li herêman hatin cudakirin û rêvebirin, lê ev herêm girêdayî dewleta navendî ya li Şamê bûn. Dewleta Emewî, ji dewleta îslamê zêdetir, bûye dewleteke Ereban. Emewiyan erebên misilman û misilmanên ne ereb, ji hev cuda dikirin. Ji erebên ne misliman re digotin: **Mewalî**. Sedemeke herî girîng a hilweşîna dewleta Emewî, ew cudakirin bû. Weke encameke ya siyaseta erebkirinê, erebî zimanê fermî û yekane yê dewletê bû. Hatiniyên dewletê bi bacên ku ji pêwîstiyên olî tên û ji xenîmetên ku di encama fetih û cihgirtinê de dihatin bidestxistin bûn. Di dîroka îslamê de cara yekem pereyên zîv-zêr di dema Abdulmelik de (685-705) hatine bikaranîn.



Di dema Emewî de sînorên dewleta îslamê li rojhilat, ava Seyhûn, li rojava jî heya Okyanûsa Atlas, li Bakur jî heta Çiyayên Pîrenan û heya Rojhilata Navîn berfireh dibe. Îslam, ji rewanî zêdetir, bi heyberî ve dihat pêş. Xelîfetî, weke çandeke ji bav derbasî kur dibe, ev çanda xelîfeyan ta ku ji aliyê Komara Tirkiyê ve, di sala 1924'an de hat rakirin, berdewam bûbû.









Xanedaniya emewiyan di sala 751'ê de ji aliyê ebû mislimê xoresanî ve hat rûxandin. Li cihê wan Ebul Ebasê Kufeyê dibe xelîfeyê yekem û bi vî awayî dewleta Ebasiyan tê damezrandin.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Çima, navê xanedaniyê, dibe Emewî?

2- Hz. Hesen, bi kîjan mercan ve bi Mûawiya re şer radiwestîne?

3- Gelo Dewleta Emewî, dewleteke îslamî bû? Şîrove bike.

4- Sînorên dewleta Emewî, heya kû diçûn?

5- Bersiva rast, hilbijêre.

- Cara yekem pereyên zîv-zêr di dema …………. de (685-705) hatine bikaranîn.

  A) Ebûbekir B) Ebdulmelik C) Osman


- Ji misilmanên ne ereb re digotin:

  A) Sehabe B) Ehlibeyt C) Mewalî

- Dewleta Emewî di sala ……….. ‘an de tê rûxandin.

  A) 750 B) 650 C) 550

## DEMA EBASIYAN (750-1258)



Ebul Ebas

Emewî, pêkhateyeke aristokrat e. Di nava cîhana îslamê de nijadperestiya ereb, di nava ereban de jî berjewendiyên xwe bingeh digirin. Gelên din biçûk dibînin, baceke pir mezin davêje ser milên wan û wan dixin bin zextên mezin. Emewî, ji ber xwedî dewleteke despot a klasîk bûn, ji aliyê her beşê civakê ve rastî nerazîbûn û bertekên mezin hatine. Herî zêde jî civakên ku li Iraq û Îranê dijiyan, nerazîbûn nîşan didan.



Li rex dijberiya gelan, beşek ji van jî dixwestin xelîfetî ji malbata pêxember re bê dayîn. Bi taybetî, piştî kuştina Hz. Hisên, malbata Ebasî hewl didan xelîfetiyê ji destê Emewiyan derxînin. Bi vî awayî, di pêşengiya Ebasiyan de têkoşînek a desthilatdariyê dihat meşandin. Bertekên civakên din û têkoşîna desthilatdariya Ebasiyan dibin yek û di encama wê de dawî li desthilatdariya Emewiyan tê.

Ebasiyên ku bi pêşengiya Ebû Muslimê Xorasanî bûne rêveberê îslamê, dest bi komplo, xapandin û kuştina Ebû Muslim dikin. Ji ber ku ji hêza Ebû Muslim ditirsiyan, bi komp-loyeke ji aliyê Ebû Cehfer ve hatiye amadekirin. Ebû Muslimê xoresanî ji aliyê xelîfeyên ebasiyan ve, ji bo hatina şahiyekê tê vexwendin. Di şahiyê de bi komployê tê kuştin.







Ebasiyên ku li bajarê Bexdayê desthilatdariya xwe ava dikin, ji bilî Endelûsê li ser tevahî cîhana îslamê bûne desthilatdar. Desthilatdariya Ebasiyan ji aliyê 9 Xelîfeyan ve hatiye birêvebirin. Yekemîn daxwaza wan, dewletê bi hêz bikin. Bi demê re her ku hêza dewletê lewaz dibe, hêza Xelîfetî û serweriya Ebasiyan jî, lewaz dibe. Gelek dewletên serbixwe yên weke Karhanî, Fatimî û Bûweyhî derdikevin holê. Di encamê de di sala 945'an de paytexta Ebasiyan Bexda ji aliyê Bûweyhiyan ve hat dagirkirin. Xanedana Ebasiyan hat hilweşandin, lê ji ber bandorên olî û ramyarî destûr hat dayîn ku xelîfetî ji Ebasiyan re bimîne. Xelîfetiya ebasiyan heya salên 1258'an P.Z berdewam dike.



Ebû Muslim

## LI ROJHILATA NAVÎN PÊŞKETINA DOGMATÎZMA OLÎ

Dema Ebasiyan ku weke pêvajoya temambûna şaristaniya îslamê dihat binavkirin, li gel hewldanên ku îslamê di reformê re derbas bike, di bin navê îslamê de gelek terîqet û hwd. gavavêtin çêbûne. Tevahî lêgerînên felsefî û hewldanên ku îslamê di reformê re derbas bikin, "Xezalî" ew tev weke kafir





Dewleta Ebasiyan



Farabî

ragihandine û xwestiye ku bîrdoziya fermî ya dewletê bike desthilat. Ji ber ku ev gotin tev, guneh in. Li gorî vê, bi dana pêkanîna taeta (ji bo desthilatiya dewletê), bi berdevkîkirina wê derdikeve pêşiya hemû nîqaşên felsefî yên ku di wê demê de dihatin kirin. Heya wê rojê, deriyê nîqaş û şîroveyên ku di asteke diyar de çêdibû û aqilên dixebitîn tên astengkirin. Bi vî awayî, mirovan tînin rewşa nehizirînê û wiha hin pêşketinên îslamê bi dawî dibin. Tenê civak nehatiye perçiqandin, hêza ramanî ya ku jixwe di bin zextên dewletê de bû, nû diket xizmeta dewletê û hat hilweşandin.

Îmamê Xezalî, di mercên ku civaka îslamî bi paş ve diçû de derket holê. Farabî û Ibnî Sîna bi kafirtiyê tawanbar kirine. Ibnî Ruşd ku feylezofekî îslamê yê Endelusê ye, ji ber ku ev nêzîkatî red kirine, hatiye şewitandin. Pirtûkên wî jî, hatine şewitandin û bi her cureyên zext û êşkenceyê re rû bi rû mabû. Bi heman awayî, Ibnî Bace Erebê feylezof ku di sala 1138'an de miriye, bi bêoliyê hatiye tawanbarkirin û weke xwedênenas hatiye ragihandin. Ev, bi temamî daxwaza serweran bû ku di nava civakê de her tiştî bixin bin kontrol û serweriya xwe.


Xezalî

Her wiha, li gorî Xezalî, xwedîtî bi awayekî herî guncaw di rêza yekemîn de bi şer tê bidesxistin. Di rêza duyemîn de jî, ji bazirganiyê tê bidestxistin. Eşkere ye ku bi nêzîkatiya cîhadê ya ku wê demê di meriyetê de bû, xenîmetên dihatin bidesxistin û bazirganiya ku mirov zêde pak negire. Yanî, li gorî pêdiviyên pratîk, da pêşxistin û ji bo ku her kes li gorî wê tev bigere, fermaneke olî dixwestin. Şaristaniya îslamê ji sedsala 12'an û pê de ji hundir ve ji ber girtina deriyên hizirînê, ji derve jî ji ber êrîşên Moxol û êrîşên Xaçperestan, ketiye pêvajoyeke rawestîn û paşketinê ku êdî neyê rewşa xwe ya berê. Heta sedsala 13'an ku li ser navê şaristaniya rojhilat gavên xwe yên yekemîn li Ewrûpayê davêtin, rola xwe ji bo







pêşketina şaristaniyê dilîst. Paşê kete pêvajoya rawestandinê (1200-1500), pêvajoya paşketinê ji 1500'î heya roja me tê. Ev pêvajo, di dema Osmaniyan de bi awayekî astengî hatiye berdewamkirin. Pêvajoya Osmaniyan her çi qas weke parastina mezin a rojhilat a li hemberî şaristaniya rojava be jî, ji ber ku di aliyê birdozî, ramyarî û aborî de pergala wê paşverû bû, vê jî serkeftina wê asteng kiriye û nekariye hilweşandina wê asteng bike. Di pêkhateya ola îslamê de dema ku em ber bi sedsala 12. ve tên, wê felsefe û zanist li hemberî dogmatîzma olî têk biçin. Deriyên ramanê bi temamî tên girtin, zihniyeta dogmayan, tevnên zihniyeta cehaletê li civaka Rojhilata Navîn tên avêtin û dorpêç dikin. Li Ewrûpayê jî, piştî sedsala 12'an bi bermahiya ku ji rojhilat û Grek (Yewnan) bi dest xistin, wê bingeha şoreşa zihniyetê ava bikin. Xiristiyanî tevî zextan mereqa zanistê zêde dike. Bi bermahiyên civaka xwezayî ku hîna jî zindî ne, derbaskirina dogmayên xiristiyaniyê ku ji şîroveyê re vekirî ne, wê bi qasî umeta îslamê, ne asteng be.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Helwesta gelan, a li beramberî nijadperestiya Emewiyan çi bû?

2- Kîjan serleşkerî, dewleta Emewiyan hilweşand?

3- Dawiya Ebû Muslim, çawa bû?

4- Çend dewletên ku ji ber lewazbûna Ebasiyan cuda bûn, bi nav bike?

## EM ZANISTA XWE PÊŞ BIXIN

Danasîna îslamê ya herî zanistî, mirov dikare di vê çarçoveyê de bigire dest ku wê gelek girîng be. Bi serê xwe di rewşa dogmayên olî de ravekirina îslamê, tê wateya zêdetir perdekirin û xistina nava tarîtiyê. Desthilatdariya feodalîzmê, ji ber serweriya xwe ya zêde, ravekirina îslamê ya olî ya dogmatîk, weke xweda nayê guhertin, pêşwazî dike û li ser hemû gelên Rojhilata Navîn raman û sincê ku bi sedsalan weke zîhniyeteke mûtlaq dibe serwer. Îslam, di nîvgirava ereban de weke çîna bazirgan dane nîşandan, weke derketineke 3. a mezin e. Li Misr, Mezopotamya, Yemen û Habeşîstanê, di navbera van de, yên ku bi bazirganiyê mezin dibin, di nava qebîleyên Ereban de yekîtî, weke hêzeke ramyarî pêwîstiyên xwe tîne cih. Pêngava dawî ya şaristaniya ji kokê Semîtîk in. Hemû Erebên çolê yên ku zêdetir paş de mane û bi şaristaniyê ve nehatine girêdan, di bin navê îslamê de tên gel hev û tên rewşa hêza şaristaniya feodal. Hizira ku têgeha qebîleyê derbas dike, di îslamê de pir bi hêz dibe. Ji ber vê sedemê, qebîle û eşîrên di serdema navîn de, belav û ji giyana yekîtiyê dûr dijîn, dikevin nava girêdana neteweke nêzîktir. Netewe, kategoriyeke feodal e ku xweserî serdema navîn e, di navbera etnîsîte û neteweyê de cihekî cuda digire. Zêdetir bi bazirganî û axê ve di nava netewiyetê de yekîtiyeke girêdayî madî bi hêz dike. Axa-feodal û bazirganên bajaran, di vê hola neteweyî de tên rewşa desthilatiyeke bihêztir. Pêşxistina Emewiyan netewiyetiya ereban, ji ber sedemên madî ne. Netewiyetî zêdetir di nava beşên jêr de pêş dikeve. Di vê pêvajoyê de erebtî kirine behaneya hestên mezinatî û xwe mezindîtinê û şoveniya netewgerî hatiye jiyîn. Di bin perda îslamê de hem çîna desthilat hem jî netewetî di nava hev de dixwazin bidin jiyîn. Yên di îslamê de li desthilatiyê, piraniya xwe ji bo newetiya ku girêdayî wê ne avantaj çêkirine. Çînên serwerên ereb, faris û tirk ên di îslamê de hatine desthilatiyê, ji bo neteweya ku endamê wê ne, taybetiyeke pêşketîtir dane qezenckirin.

**RÊBER ABDULLAH OCALAN**







## EM ZANISTA XWE PÊŞ BÊXIN

Ji vê dema îslamê re dema feodaltî tê gotin. Lê bêyî ku em ji aliyê dîrokî û erdnîgarî ve cudahiya di navbera wê û feodalîzma rojava de piştguh bikin, wê bi vê şêweyê xwe yê şaristaniyê ve, li ser tevahî herêmê bandora xwe nîşan bide. Îslama 650'an cihên ku kurd lê dijîn û erdnîgariya wan bingeh digirin û fetih dikin. Dema li ser herêmên çandinî yên berfireh û navendên bajaran desthilatiya xwe tam ava dikin, Gelê kurd di herêmên çiyayî de li hemberî mirovên biyanî berxwedana xwe ya kevneşopî berdewam kiriye. Dema termê damezrînerê îslamê Hz. Mihemed hêj li erdê bû, nakokî û pevçûn hatin jiyîn, li Kerbelayê bi şehadeta Hisên û kes û karên wan re digihêje asteke nû. Dema ku civaka Emewiyên ji federasyona Qureyş beşeke serweriya di nava desthilatiyê de dixin destên xwe, ji derveyî beşeke hejar û Ereban, li ser gelên din, zêdetir ji zextan re rê vekiriye. Îran bingehekî xwe yê şaristaniyê yê hêza xwe ya berê, li hemberî van zextên ehlîbeytê îslamê yên li cem wan cih digirin, îslamê li gorî şert û mercên xwe dide guhertin û bi şeklê şîatî pêş dixe. Ev berxwedanî dibe sedem ku di nava îslamê de cudahiyeke bingehîn pêk bê û li gorî şert û mercên herêmê guhertinê di xwe de çêke, ev jî dibe mînaka yekem. Di nava kurdan de dayîna beramberiya van çi qas di qadeke bi sînor de be jî, bi şêweyê elewîtiyê çêbûye. Di cihên deşt û navendên bajaran de jî, ev malbata Emewî ya ku li ser deshilatdariyê yek şîroveya wan ya îslama sunîtî serwer bûye. Destpêkê di ereban de û car din di nava gelek neteweyan de, ji bo van beşên beriya niha dibe zêdehiyek. Ev parçekirin û cudahî, bi awayekî bingehîn dibe mijara gotinê. Di bingeha vê cudahiyê de jî, civakîbûna nû çêbûna çînayetiyê tê rûniştandin. Di şeklê civakê yê koledarî û çêkera wê ya çînayetî de guhertinek tê jiyîn.

## EM ZANISTA XWE PÊŞ BÊXIN

Îslam ji dema Emewiyan û pê ve ji eslê xwe dûr ket. Ji wê demê û pê ve li ser sê xetan îslamiyet hat meşandin.

**1- Îslama deshilatdariyê (seltenet).**

Ji dema emewiyan û pê ve dest pê dike û heya îro tê. Îslamiyeta ku ji aliyê deshilatdariyê ve û li gor bercewendiyên deshilatdariyê tê şîrovekirin, îfade dike. Wek mînak: Emewiyan, Ebasiyan, Osmaniyan îro jî Siûdî, Îran, Tirkiya, Sûriya û hwd. Hemû deshilatdar dibêjin ku em li ser xeta îslamê dimeşin. Li gor vê dewlet û deshilatdariya xwe rêxistin dikin. Nêzîkatiyek li hember gelê xwe û gelên derveyî xwe nîşan didin. Ku lêkolînek li ser van dewletan çêbe wê xuya be ku nêzîkatî, siyaset, aborî, sazbûyîna dewletê û hwd. Ji hev û du cuda cuda ne. Heya car car dijberî hev û du ne. Ji ber ku şîrovekirina îslamê li ser berceweniyên van deshilatdariyan e, ew cudabûyîn derdikeve. Yanî îslama deshilatdariyê ne nûnertiya xeta Hz. Mihemed dike, dewlet û deshilatdarî di bin navê îslamê de bercewendiyên xwe diparêzin.

**2- Îslama civakî:**

Beşên civakê yên ku nebûne parçeyeke dewlet û deshilatdariyê. Bi şêwaza terîqet û mezheb û şêweyên cuda xwe birêxistin kirine. Pêwîstiyên civakê yên exlaqî, olî, madî û civakî pêk tînin. Di nava demê de ew mezheb û terîqet her çi qas kêmasiyên wan çêbin jî, di bingeh de nûnertiya parçeyek îslama rast dikin.

**3- Îslama kesayetî:**

Di nava civakê de mirovên ku tevlî îslama deshilat û mezheb û terîqetan nebûne, îfade dike. Di vir de terîqet û mezheb an jî dewlet di navberê de tuneye, mirov bi xwedayê xwe re rû bi rû ye. Aliyên madî manewî şopandina xeta Hz. Mihemed dike.







## PIRSÊN NIRXANDINA BEŞÊ

**1-** Afirandin û girtina deriyên guftûgoyê, çi dide têgihandin? Veke.
**2-** Baweriya ola yekxwedayî di hizirên mirovan de rê li ber çi guhertinan vedike?
**3-** Şert û mercên derketina Hz. Birahîm, tu çawa dibînî? Şîrove bike.
**4-** Hz. Birahîm, têkoşîneke çawa li hemberî zîhniyeta wê demê meşand?
**5-** Sedemên bingehîn ên koçberiya Hz. Birahîm, çi ne? Diyar bike.
**6-** Hz. Mûsa nûbûnên çawa ji ola yekxwedayî re anîn. Çima 10 ferman pêşkêşî gelê xwe kirine?
**7-** Têkoşîna Hz. Mûsa, li hemberî kîjan desthilatdaran e û helwesteke çawa nîşan dide?
**8-** Zerdeşt, rêbazeke çawa ji bo belavkirina nêrînên xwe bi kar aniye?
**9-** Di dîrokê de behsa çend Zerdeştan tê kirin?
**10-** Zerdeştê 3. di kîjan pêvajoyê de jiyaye û ji bo kurdan girîngiya wî çi ye? Veke.
**11-** Hz. Îsa, şêwazeke çawa ji bo belavkirina nêrînên xwe hilbijart û çima pêwîstî bi vê rêbazê dît?
**12-** Fermanên Hz. Îsa çi ne û bandoriyeke çawa li ser civakê kirine? Veke.
**13-** Ola xiristiyanî di kîjan pêvajoyê de pêş ketiye?
**14-** Sedemên derketina şoreşa îslamê, çi ne? Veke.
**15-** Şoreşa dijberî îslamê çi ye? Veke.
**16-** Di nava îslamê de pêvajoya Emewiyan çawa ye? Veke.
**17-** Di nava îslamê de pêvajoya Ebasiyan çawa bû? Veke.
**18-** Çima di olên Rojhilata Navîn de dogmatîzm pêş ket û vê rewşê rê li ber çi vekir? Binirxîne.
**19-** Sedemên pêşneketina civakên Rojhilata Navîn, çi ne? Binirxîne.

# BEŞA 2

## DI DEMA ÎSLAMÊ DE REWŞA KURD Û KURDISTANÊ


### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1-** Ji beriya îslamê, rewşa civaka kurd çawa ye? Lêkolîn bike.
**2-** Di dîrokê de şêweyê rêveberiya kurdan çawa bûye? Lêkolîn bike.
**3-** Dema ayîna îslam derbasî Kurdistanê bûye, kurdan helwesteke çawa nîşan dane? Lêkolîn bike.
**4-** Karekterê dewletên kurdan ên ku di pêvajoya îslamê de ava bûne, çawa ye û xwedî kîjan taybetmendiyan e?
**5-** Sedemên seferên Xaçperestan ên ji bo Rojhilata Navîn çi bûn? Lêkolîn bike.






## BERIYA ÎSLAMÊ TÊKILIYA KURD Û EREBAN



Di dîrokê de têkiliya kurd û ereban di Mezopotamya û Rojhilata Navîn de têkiliyên herî kevnar in. Vê têkiliyê ji Neolîtîkê dest pê kiriye. Dema ku çanda Aryen û Semîtîk weke du çandan ji hev cuda dibin, ji wê demê û şûn de têkilî di navbera her du çandan de derdikeve. Ev têkilî carinan bi nakok, carinan jî baş meşiyaye. Civakên Aryen û Semîtîk di heman demê de bi şêweyekî erdnîgarî bi navên Mezopotamya jor û Mezopotamya jêr ji hev hatine cudakirin. Çanda Aryen nûnertiya çanda çandinî û niştecihbûnê dike. Çanda Semîtîk jî nûnertiya çanda şivantî û koçberiyê dike. Bi taybetî, şaristaniya civaka Sumer, weke afirîneriya hevbeş a van her du çandan muhra xwe li dîrokê daye.

Êrîşên qebîleyên bi koka Semîtîk ên ku ji herêmên çol ên başûr ta Yemenê pêşketî û demboriya xwe heya çanda El Ubeyd (5000-4000 B.Z) dirêj dibe, rawestîn çi ye, nedizanîn. Di pêvajoyên Akad, Babil û Asûran de ev belavbûnên heya ber bi bakur ve, ku bi piştgiriya împaratoriyan pêş ketin, bi dagirkirinên ereban ên bi destpêkirina sedsala 5'an B.Z ku pêş ketin, bêhtir bilez bûn. Serdema Babil, bi taybetî serdema Asûran, a ku bi Hamûrabiyê ji Sargon derbas dibû, dest pê dike û bi Asûr Banîbal bi dawî dibe (1900-625



Li Kurdistanê Çanda Aryen û Semîtîk

B.Z), bi rewşa xwe ya êrîşên 1300 salan re, hemû çêkerên nijadî (etnîk) yên Rojhilata Navîn bi hovane fetisandibûn. Çêkera nijadî ya ser û bin nebûye hema bêje nema bû. Her alî di nava matmayîbûnê de û bi êş dinaliyan.


Gilgamêş

Di giştî de eniyek a "Federasyona Qebîleyan" ji her alî ve li ber damezrandinê bû û li hemberî emperyalîzma koledar, berxwedanek bêhempa dihat jiyîn. Çanda kurdan jî, li hemberî Sumeran û hêzên şaristaniyên Ekad, Babil, Asûr û Ereb ku Semîtîk bûn her dem di rewşa berxwedanê de bû. (Kurtiyan) em dikarin vê di vegotinên mîtolojîk ên xwedawenda çiya (Nînhûrsag) de jî bibînin. Di rastiyê de destana Gilgamêş di cewherê xwe de têkoşîna parastina hebûn û azadiya Kurtiyan a li beramberî şaristanîbûna Sumeran rave dike. Ketina nava Kurtiyan a şaristaniyê, tenê bi berxwedanê re rû bi rû namîne, bingehê sazîbûn û zihniyeta xwe jî saz dike. Hûrî bi Kurtiyan re ji heman kokê tên. Ji 2000 B.Z. û pê de, hatiye diyarkirin ku Hûriyan di riya şaristaniyê de gavên girîng avêtine û bi xanedaniya Gudea re li ser bajarên Sumeran (2150-2050 B.Z.) desthilatî bi dest xistine. Çanda Hîtît û Mîtanî, li beramberî hêzên Babil û Asûr ên koka wan Semîtîk in û li ser çanda Sumeran hatibûn damezrandin, dibin yek û di 1596 B.Z de bajarê Babil dagir dikin. Li hemberî hêza Asûran ya di 1200 B.Z de bilind dibû, Hûrî derbasî çanda qebîle ya kevn dibin. Hatiye diyarkirin ku bi navê Konfederasyona Naîrî di rewşa yekîneyên qebîle yên lewaz de jiyaye. Di 612 B.Z de jî, bi navê Medan pêşengiya berxwedana gelan kiriye û dawî li zordariya Asûran a ku koka wan Semîtîk in anîne.


Ev pêşketinên dîrokî yên bi xetên bingehîn hatin diyarkirin, radixe holê ku têkiliya kurd û ereban xwedî dem-







boriyeke dirêj e. Di vê têkiliyê de bandorbûnên beramberî hev û berxwedanên kurdan hene. Bi taybetî, dema ku ereban xwe weke hêza şaristaniyê birêxistin kirin û êrîş li hemberî Kurdan pêk anîn, bi berxwedanê re rû bi rû hatine. Dema ku bi navê ola îslamê xwestin Kurdistanê bi dest bixin, ev kevneşopiya dîrokî hatiye domandin. Di van berxwedanan de çanda kurdan û bi taybetî jî baweriya wan diyarker bûye. Di vê çarçoveyê de kevneşopiya Zerdeşt, ji kevneşopiya ola Semîtîk cudatir, li hemberî kolebûyînê, di jiyana azad de bandorker bûye. Di navbera wan de ji vî alî ve cudahiyeke bingehîn heye. Di dema desthilatiya îslamê de, bi derbxwarina kevneşopiya Zerdeştî bi xwe re kolebûn jî aniye. Di bingehê dijminahiya îslama desthilatdar a li hemberî kevneşopiya Zerdeştî de, ev di têgeha kolebûyîn û çînbûneke hişk a îslamê de radize.


Derwêşê Evdî

Xala kolebûn û kolebûyîna kurdan bi navîna tevlîbûna îslama desthilatdar re, têgiştin pir girîng e. Vîna jiyana azad a di çanda kurdan de, bi îslama desthilatdar re şkestineke mezin jiyaye. Nimûneyeke herî girîng, destana Derwêşê Evdî ye. Ev destan, di kesayeta Êzîdiyan de, berxwedana kurdbûna ku dixwaze, li hemberî pişaftin û tunebûnê, xwe li ser piyan bigire, rave dike. Di her kêliya ku Derwêş, ji çiyayên Şengalê xwe berdida deşta Musilê de, di rastiyê de li hemberî feodalîzma erebên misilman, berxwedaniyeke bi mêrxasî, pêşkêş dikir. Ev jî, çandeke hezarê salan bû. Koka wê digihêje Sumeran, dibe ku bigihêjê beriya wan jî. Xwediyê rayeke ku diçû heya şerên navbera qebîleyên çolê yên Semîtîk û qebîleyên çiya-deştî yên Aryenî. Derwêşê Evdî nûnerê vê

çandê yê herî dawî bû. Dîrokeke deh hezar salî û kevneşopiya neteweyekî herî kevn, rave dikir.
Aryen û semîtîkan (kurd û ereb) bi hev re di avabûna sumer, têkçûna akad, meşandina şaristaniya kasît û babil û têkbirina Asuran de cih girtine. Di encamê de kurdan li vê herêmê di avakirin, meşandin û rûxandina şaristaniyên semîtîk de rol lîstine.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Li Mezopotamyayê, têkiliya kurd û ereban çawa bû?


2- Çanda kurdan, li hemberî Sumer û hêzên şaristaniyê çawa li ber xwe da?

3- Hîtît û Mîtanî, li hemberî kê dibin yek û çi dikin?

4- Cudahiya di navbera kevneşopiya Zerdeştî û olên Semîtîk de çi bû?

5- Destana Derwêşê Evdî di rastiyê de tê çi wateyê?






## DERBASBÛNA ÎSLAMÊ YA NAVA KURDISTANÊ


Xalid Bin Welîd

Êrîşên yekem ên îslamê li ser Bîzans, Sasanî û Misrê kirine. Nasîna kurdan a îslamê, rastî van salan tê. Kurd Di sala 633'an de cara yekem bi îslamê re rastî hev tên. Di dema Hz. Omer de ji sê aliyan ve êrîşên derve hatine destpêkirin. Artêşa di bin fermandariya Umer Ibnul As de ber bi Misrê, artêşa di bin fermandariya Xalid Bin Welîd de ber bi Bîzans û Kurdistanê, artêşa di bin fermandariya Saad Bin Ebî Weqas de ber bi Sasanî, Rojhilat û Başûrê Kurdistanê ve êrîş dan destpêkirin. Artêşa di bin fermandariya Saad Bin Ebî Weqas de, di sala 636'an de li Qadiseyê bi artêşên Sasaniyan re tên beramberî hev. Di vî şerî de Sasanî bi bin dikevin. Piştre, di sala 642'yan de di şerê navendî de Sasanî dîsa bi bin dikevin û dewleta Sasanî hildiweşe. Piştî vî şerî, tevahiya erdên Sasaniyan dikevin nava sînorên dewleta îslamê. Rojhilat û Başûrê Kurdistanê jî, ji aliyê artêşên îslamê ve tên dagirkirin.

Artêşa di bin fermandariya Xalid Bin Welîd de di şerê Yermûkê de Bîzansê bi bin dixe. Piştî vî şerî, Sûriyê û Bakurê Kurdistanê tê dagirkirin. Eger piştî şerê Yermûkê împaratoriya Bîzans têk neçûbe jî, êdî li ser Rojhilata Navîn bandoriya hêza serwer nemaye. Fermandarên Xalid Bin Welîd heremên weke: Dîlok, Gimgim, Meletî, Semsûr, Xarpût û Çewlikê dagir dikin. Artêşa di bin fermandariya Xalid Bin Welîd de jî heremên weke:

Mûsil, Zaxo, Colemêrg, Wan, Mêrdîn, Amed û Sêrtê dagir dike. Ketina îslamê ya Kurdistanê pir bi astengî û bi êş çêbûye. Bi taybetî, nêzîkatiyên îslamê yên desthilatdar, ên weke dagirkerî û mêtingerî, bûne xalên bingehîn ên vê êşê, armanc kiribûn ku van talan û dagirkeriyan bi têgeha cîhadê binixumînin.

Kurdan îslamiyet bi yek şêwazî pêşwazî nekirine. Nêzî sêsed salî li beramberî îslamê li ber xwe dane. Berxwedan li her herêmekê bi rengên cuda cuda pêş ketiye. Herêmên çiyayî radest nebûne û li ber xwe dane, herêmên deştê jî li ber xwe nedane û neçar mane ku îslamê bipejirînin. Hinek herêman jî ji bo ku xwe radest nekin, terîqet û mezhebên cuda pêş xistine. Hinek herêman jî piştî bi sedsalan şer kirine, îslamiyet pejirandine. Bi vî awayî li beramberî îslamê bertekên cuda derketine.

Emewiyan sê êrîşên mezin anîne ser tevahiya Kurdistanê. Heremên Bakurê Kurdistanê bi tevahî hatine dagirkirin. Di sala 678’an de êrîşa yekem di bin fermandariya Memûn de artêşa ereb herêmên Serhed û Koçgirî dagir dike. Ew dem, ji bo Kurdistanê demeke tam a hilweşînê ye. Kurd û farisan di sala 640-660’î de li hemberî artêşên ereban şer kirine. Êrîşa duyem 690’î li ser Rojhilatê Kurdistanê pêk tê. Di sala 708’an de fermandarê Emewî yê bi navê Hecac ku xwînrij e, zilamên ku destên wan karibe şûr bigire, hemûyan dikuje, yên ji ber dimîne jî, dike para xenîmetê.

Bi taybetî, mezheb û derdorên rikber, li Xorasanê li derdora Ebû Muslimê Xorasanî ku pêşengekî kurd e, xwe birêxistin dikin. Ji ber dûrahiya Xorasanê ya ji navenda Emewiyan, hem jî ji ber ku bi çiyayên bilind tên parastin, hem ji ber derfetên gihîştina gelek cihan xwediyê derdorên mûxalif ên desthilatdariya Emewiyan dest bi kombûnê dikin. Ji ber ewlehî û



Ebû Muslimê Xuresanî







baweriya bi malbata Ehlilbeytê, ew derdorên ku palvedidin xanedana Ebasiyan a ku piştre hatiye binavkirin û bawerî pê anîne. Ji ber ku malbata Ehlilbeyt, ji aliyê malbata Emewiyan ve rastî komkujiyê hatibû. Ji bo gelên hatine perçiqandin jî, dibe nîşaneya berxwedana li hemberî Emewiyan. Ebas-Bin Ebdulmutelib, mamê Hz. Mihemed e. Ji wan kesên ku ji nijada Ebas-Bin Ebdulmutelib tenê re tê gotin; Ebasî. Ebû Muslim piştî amadekariyên xwe bi dawî kir, di sala 746'an de li dijî Emewiyan dest bi raperînê dike. Di sala 751'ê de artêşa Xelîfe Merwan têk dibin. Di heman salê de dikevin paytexta Emewiyan 'Şamê' û dawî li xanedana Emewiyan tînin. Ebû Muslim, xelîfetiyê radestî Ebasiyan dike. Bi vî awayî, di dema dewleta îslamê de dema xanedana Ebasiyan dest pê dike.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Şerên Îslamê yên li ser Kurdistanê, kengî û di bin serweriya kê de bûn?

2- Sûriye û Bakurê Kurdistanê, çawa tên dagirkirin?

3- Ketina îslamê ya Kurdistanê, bi çi awayî bû?

4- Fermandarê Emewî Hecacê xwînrij, çi tîne serê Kurdistaniyan?

5- Bersiva rast, hilbijêre.

- Fermandar Ebû Muslim
A) Tirk e B) Faris e C) Kurd e

- Ebû Muslim di sala 751'ê de dikeve paytexta Emewiyan
A) Şamê B) Bexdayê C) Helebê

## DEMA EBÛ MUSLIMÊ XORASANÎ Û EBASIYAN (745-749)


Ebû Muslimê Xorasanî

Piştî ku Ebasiyan xelîfetî wergirt, paytexta dewleta îslamê bû Bexda. Karê destpêkê yê xanedana Ebasiyan kiriye, qetilkirina Ebû Muslimê Xorasanî bû. Ebû Muslim, li Kurdistan û Rojhilata Navîn kesayetekî girîng û bi hêz bû. Weke hêvî û pêşengê gelan, Ebû Muslim derdikeve ser dika dîrokê. Her wiha, bi pêşengtiyeke rast ji bo gelan têkoşîn meşand. Ebû Muslim di sala 718'an de ji dayîk dibe. Zarokatî û ciwantiya wî li Kûfeyê derbas dibe. Wê demê, Kûfe cihekî bi tevgerên xwe yên ramyarî li dijî Emewiyan dijiyan. Ji ber vê sedemê, weke dijberekî Emewiyan mezin bû, ji aliyê girîngiyên endamên nijada Ebasiyan ve pir bal dikişand. Ji ber ku ew kesên ku ew li Kûfeyê nasîbûn bi heyranî ji riya wî re nêzikatiyek nîşan didan. Ebû Muslim di demeke kin de li Mezopotamyayê bû kesayetekî nimûne ku pir were hezkirin. Lê


Şerê Ebasiyan







piştre dubare vegeriya wê derê û tevgerên xwe domandin.

Bi taybetî, piştî salên 745'an, Ebû Muslimê Xorasanî li dijî Emewiyan dest bi kiryarên bangeşeyê (propoganda) dike. Tevgera Ebû Muslim ji Erzrûmê heya Xoresanê belav dibe. Di vê serhildanê de kurd, azerî û fars jî cih digirin. Cihên li derdorê digere û di nava mirovan de kiryarên xwe didomîne. Piştî qonaxeke diyar ku wê kengî raperîn çêbibe û wê kengî dest bi tevgerê bikin, hêdî hêdî zelal bûn. Aliyên ne ereb, li hemberî ereban dikevin tevgerên serhildanê. Emewî dixwazin bi riya hevalbendî û nijadî wan bikişînin gel xwe. Lê Ebû Muslim bi Ebasiyan re peymanan çêdike û hewldanên Emewiyan vala derdixe.

Emewî ji pêşketinên li Xorasanê agahdar in û dikevin tevgerê. Dibêjin herî kêm hevalbendî û yekîtiya ereban çêkin û bi hev re tev bigerin. Lê belê, tu encam negirtin. Ji ber ku Ebû Muslim dikeve tevgerê, bajaran yek bi yek digire û di herêmê de serdest dibe, yekîneyên Emewiyan ên ku bi ser wan de dişînin, têk diçin. Bi vê binketinê re desthiladariya Emewiyan li Xorasanê hema bêje bi tevahî ji holê radibe. Serdestiya Emewiyan li vê derê bi dawî dibe û serdestiya Ebasiyan ava dibe. Ebul Ebas Eseffah asta xelîfetiyê digire. Ebû Muslim jî, ji bo avakirina rêxistinê li Xorasanê ji nû ve weke parêzger (walî) tê erkdarkirin. Ebû Muslim, di rakirina xanedaniya Emewiyan de xwedî kedeke mezin e. Di avakirina dewleta Ebasiyan de di rêzên pêş de cih girt. Her ku diçe,




Dewleta Ebasî

hêzê bi dest dixe. Bandor û hêza wî ya li heremê her ku diçe, zêde dibe. Ev jî dibe sedem ku rêveberiya Ebasiyan jê nerazî û

biguman bin. Ebû Cehferê Mensûr ku birayê xelîfe bû, nerihetî dijiya. Wisa dihizirî ku divê ev kesayet ji holê were rakirin, li hemberî wî hewldan bên destpêkirin, her çi qas dixwest jî, nikarî Xelîfe qanih bike ku Ebasî bi saya Ebû Muslim li şûna Emewiyan derbasî xelîfetiyê bûbûn. Dizanîbûn ku Ebû Muslim hêviya hemû kesên hatine perçiqandin û kesayetekî pir bi hêz e û ev rewş li pêşiya desthilatdariyê astengeke mezin e. Ji bo wê, Ebû Muslim bi xapandinekê vedixwînin Bexdayê. Li vir bi komployekê Ebû Muslim dikujin. Di heman demê de wan derdorên nêzî wî jî bi darve dikin. Bi kuştina Ebû Muslim re Rojhilata Navîn şêweyekî nû digire. Di dîrokê de ji tevgera ebû muslimê xoresanî re, tevgera feqîran jî tê gotin.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Karê destpêkê yê ku Ebasiyan kiriye, çi bû?

2- Ebû Muslimê Xorasanî, kesayetekî çawa bû?

3- Desthilatdariya Emewiyan, bi çi awayî ji holê radibe?

4- Xelîfetiya Bexdayê, çima û bi kîjan rêbazê Ebû Muslim da kuştin?

5- Cihên vala, bi gotinên guncaw dagire

Ebû Cehferê Mensûr ku ............ xelîfe bû nerihetî dijiya. Wisa dihizirî ku divê ev ............... ji holê were rakirin, li .............. wî hewldan bên destpêkirin, her çi qas dixwest jî ....... .......... qanih bike ku Ebasî bi saya ...... ............. li şûna Emewiyan derbasî xelîfetiyê bûbûn.






## SERHILDANÊN LI DIJÎ DESHILATIYA ÎSLAMA SUNÎ

Dema ku îslamiyet hat kurdistanê, kurdan xweradestî nepejirandin. Hinekan, demekê şer kirin û xwe radest kirin. Hinek ji wan qet radest nebûn, hinek ji wan jî rêbazên xwe guhertin û berdewam kirin. Awayên berxwedanê yên ku li hemberî deshilatiya îslamê pêş ketîn gelek in, çend ji wan awayên bingehîn ev in:

**Mazdek:**


Mazdek

Tevgera Mazdek weke berteka li hemberî pergala koledar a Sasaniyan derketiye holê. Ji kurdên Hemedanê ye. Ev tevger, 496’an P.Z derdikeve. Bi qasî ku tevgereke olî ye, ew qas jî komînal û ramyarî ye. Ji bo dîtina çareseriyê, ji bo pirsgirêkên civakî jî xwedî taybetmendiyeke felsefî ye. Armanca wî, xwestiye ola Zerdeşt ji ola fermî ya dewletê dûr bixe û li gorî serdema xwe guncaw bike. Ev tevger û ola wî, weke Mazdeîzm an jî Mazdeyetî tê pênasekirin. Mazdeîzm di nava azerî, fars û kurdan de di rêjeyeke girîng de belav bûye. Împaratoriya Sasanî ku bilindbûn û belavbûna vê baweriyê ji xwe re weke metirsiyeke mezin dibîne, li hemberî wan çend êrîşên leşkerî pêk tîne. Serhildana Mazdek, ji aliyê Akhûnan (qebîle û dewletekî  tirkan) ve tê perçiqandin, Mazdek radestî Sasaniyan dikin û li sêdarê dixin. Lê belê, baweriya Mazdek

hebûna xwe didomîne. Herî dawî, xwe bi navê Huremî li Rojhilata Navîn birêxistin dikin.

**Huremî:**

Huremî berdewamiya Mazdeîzmê ye. Ew jî, heman rêgezên Mazdeîzmê diparêze. Di sedsala 8'an de piştî serhildana Ebû Muslimê Xoresanî li Rojhilatê Kurdistanê derdikeve. Hurem navê jinekê ye. Jina bi navê Hurem pêşengiya vê tevgerê dike. Navê tevgera wan huremdîn (ola xweşik) e. Wekheviya jin û mêr diparêze. Tevgereke komînal e. Weke sembol cilên spî li xwe dikin û serê xwe bi şaşikên sor girêdidin. Ev tevger nêzî 5 salan dewam dike û piştî wê ji aliyê ebasiyan ve tê hilweşandin.

**Yarîsan:**

Li derdora çiyayê Dalaho û nêzî Kirmanşaha Rojhilatê Kurdistanê ji salên 640'î û pê ve pêş dikeve. Piştî salên 640'î bi hatina îslamê ya Îranê re ola Zerdeşt qedexe dike. Civaka zerdeştî ya li vê derê ji ber ku pir rastî komkujiyan tên, ji bo xwe biparêzin rêxistina Yarîsan ava kirine û navê xwe guhertine, lê baweriya Zerdeştiyê berdewam kirine. Yarîsan tê wateya civaka dost. Bi riya mûzîkê perestinê dikin. Di Yarîsaniyê de rankarnasyon heye. Jin di nav wan de pîroz e. Jin di nava civakê de, hem di rêveberiya civakî de, hem jî di rêveberiya olê de cih digire. Heya roja îro jî ev baweriya li Rohilatê Kurdistanê berdewam dike û şaxekî herî bi hêz yê ku di nava kurdan de li hember îslamê li ber xwe dide.

**Kakayî**

Ji salên 640'î û şûn ve li Başûrê Kurdistanê li derdora Kerkûkê kurdên heyî bi navê Kakayiyan rêxistinek pêş xistin. Taybetiyên wan dişibin Yarîsaniyan. Kakayî jî tê wateya koma dostan. Ew jî weke şaxekî Ehlelheq tê şîrovekirin. Pir taybetiyên xwe ji Elewîtiyê jî digire. Ew jî heya îro weke xeteke berxwedêr berdewam dike.







**Elîyulahî:**
Li Rojhilatê Kurdisanê di nava kurd û azeriyan de pêş dikeve. Taybetiyên şîea û yarîsan tê de hene. Ji her du aliyan jî bandor dibin. Elî weke xwedê dibînin.

**Qarmatî:**
di sedsala nehan de pêş dikeve. Pêşengê wê kurdekî bi navê Qarmatî ye. Qarmatî ji Hemedana Rojhilatê Kurdistanê ye. Nêzî dused salî li Rojhilatê Kurdistanê bandor kiriye. Qarmatî, xwe ji bajar dûr kiriye. Ji ber ku bajaran weke cihê xerabiyê dibîne. Ji bo vê jî li gund û kelehên serê çiyan dijî. Hemû endamên Qarmatiyan kar dikin, piştre berhemên xwe tînin û dayîk li gorî pêwîstiyan belav dikin. Jin pîroz e û wekheviya jin û mêran heye. Sembola wan jî roj û ronahî ye.

**Êzdayetî**:
Beşeke zerdeştiyan e. Ji salên 1100 P.Z û pê ve li derdora Şengalê bi pêşengiya Şêx Adî şêweyekî berxwedanê pêş xistine. Pirtûka wan ya pîroz Mishefa Reş e. Li gorî Êzîdiyan, Êzdayetî ola herî kevnar e û xwedê despêkê ola Êzdayetî daye erdê. Êzdayetiya îro senteza îslam û zerdeştiya ku Şêx Adî pêş xistiye. Sîstema qastê di nava êzîdiyan de heye, pîr, xatûn, mirîd, biratiya axiretê, şêx qastên êzîdiyan e. Zewaca bi kesên li derveyî olê re qedexe ye. Di nava qastan de çûn û hatin û zewac çênabe. Cihên wan ên pîroz îro Laleş û Şerfedîn in.

**Babek:**

Babek, di sala 795'an de li Erdebîlê hatiye dinyayê. Rêberekî tevgera Huremiyan e ku bi dirêjahiya 22 salan li hemberî Ebasiyan şer dikin. Bi hatina Babek re Huremî di demeke kurt de di rêjeyeke girîng de mezin dibin. Ji xwe re Keleha Bezz kirine navend. Xelîfeyê Ebasî Mutesim ji bo çewisandina vê tevgerê, bi Împaratoriya Bîzansan re aştiyê çêdike û hemû hêza xwe ji bo vî şerî, bi kar tîne. Kesek bi navê Efşîn ku tirk e tê ser artêşê. Efşîn hemû hêza di destê xwe de bi rêbazên pir hovane bi kar tîne. Di herêmê de yek ji cihê niştecihbûnê yê nehatî wêrankirin nahêle. Bi hezaran mirov, bêyî ku cudahî bixe nava zayend û temenê wan dikuje. Serhildana Babek ku li hemberî Ebasiyan lewaz dibe, bi ketina Keleha Bezz a di sala 837'an de serhildan tê perçiqandin. Her çi qas Babek çembera êrîşê diqetîne û li herêmên Serhed xwest hêza xwe dîsa komî ser hev bike, bi xiyaneta Sehil Bin Sûnbat re dîl dikeve û radestî Ebasiyan tê kirin. Lê di sala 838'an de bi êşkenceyê tê kuştin.



Babek



Keleha Bezz







## Pirsên Nirxandinê:

1- Mazdek kî ye û li hemberî kê derketiye?

2- Armanca Mezdek ya olî, çi bû?

3- Ji bo têkbirina tevgera Babek, Xelîfe Mutesim çi dike?

4- Yarîsaniyan kîjan bawerî bingeh girtine?

5- Hevokên rast bi tîpa (R), yên şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bike

- Serhildana Mazdek, ji aliyê Akhûnan (qebîle û dewletek a tirkan), tê perçiqandin.
- Efşînê tirk, hemû hêza di destê xwe de bi rêbazên pir hovane bi kar tîne.
- Babek, bi îxaneta Sehil Bin Sûnbat dîl dikeve û radestî Ebasiyan tê kirin.
- Kakayî li Rojhilatê Kurdistanê derketine.
- pêşenga Qarmatiyan jina bi navê Hurem e.

## BANDORÊN ÎSLAMÊ YÊN LI SER CIVAKA KURD

Civaka kurd jî, ji şoreşa îslamê ku li rex wê rû dida bandor dibû. Kurd piraniya xwe bi îslamiyeta desthilatdariyê û bandorên wê yên hilweşîner re rû bi rû mane. Bi taybetî, êrîşên dagirkeriyê yên xanedana Emewiyan ên li Kurdistanê, bûne sedema bandorên hilweşîner. Koma desthilatdar a eşîrperwer, dema ku desthilatdariya wan a Sasaniyan hildiweşe, girêdana xwepêşkêşkirina aristokratên xwe yên bi desthilatdarên îslamê re dereng namîne û tevlî dibe.

Di dema êrîşên Emewiyan de piştî berxwedaneke kurt û çend derbeyan, koma desthilatdar a kurd ji ber berjewendiyên xwe îslam pejirandine. Sedema ku ev koma desthilatdarên kurd bi awayekî ew qas zû erebûyîn pejirandine, ji rastiya wan a hevkarîperestiyê tê. Ji bo berjewendiyên wan, di vê pêvajoyê de Zerdeştî zêde sûd nade wan. Di vê rewşê de îslama desthilatdar ji bo wan zêdetir bi sûd e. Ji ber vê yekê, piştî berxwedaneke kurt îslamiyet hilbijartin. Desthilatdarên kurd, ji jiyana xwe û armancên desthilatdariyê, nikarin ji hevkariyê pê ve tiştekî din bikin. Ji ber vê sedemê, ji avakirina pergalê zêdetir, her dem nokeriya pergalên din ên desthilatdar kirine.

Belavbûna îslama desthilatdar bi xwe re Erebûyîn jî anî. Koma desthilatdar a ereb hem di aliyê ziman, hem jî di aliyê kesayetî de xwestine pişaftinê bi giştî belav bikin. Bi taybetî, Quran bi zimanê erebî ji aliyê desthilatdarên ereb ve hatiye bikaranîn. Bi vî awayî, xwestine ku zimanên din jî bihelînin.



Artêşa Îslamê

Derbasbûna wê ya Kurdistanê, li ser vê bingehê çêbûye. Koma desthilatdar a






kurd ji bo berjewendiyên xwe, erebûyîn bi kûrahî jiyaye.

Desthilatdarên faris, ji ber berjewendiyên xwe jî be, îslam li gorî taybetmendiyên desthilatdariya xwe guhertine, lê desthilatdarên kurd tam bi radestiya erebûyîn û hevkariyê bingeh girtine. Bi vî awayî, beşek a civakê hatiye pişaftin.

Piraniya mîrekiyên ku di van pêvajoyan de hatine avakirin, bi giranî li ser erdnîgariya Kurdistanê û pêkhateya civaka kurd hatine sazkirin. Lê belê, ji ber ku komên desthilatdar ên van mîrekiyan di rêjeyeke girîng de pişaftî ne, ev mîrekî zêdetir di bin bandora desthilatiya ereban de mane. Ev mîrekiyên ku bi civakî kurd in, pêkhateya wan ya jor xwedî taybetmendiyeke ereban e.

Ev biyanîbûyîna bi vî awayî ya di çîna jor de xwe di ziman, rêxistinkirin û çînbûyînê de jî, daye diyarkirin. Erebî zimanê pêvajoyê yê zanist û dîplomasiyê ye. Bi awayekî giştî desthilatdarên civakên din jî bi vî awayî zimanê dîplomasiyê bi kar anîne. Lê belê, komên desthilardar ên civakên din, di têkiliyên di civaka xwe de ziman û çanda xwe bi kar anîne. Lê komên desthilatdarên kurd li gel karanîna zimanê erebî di dîplomasiyê de di jiyana civakî de jî, ji bilî erebî ziman bi kar nanîne. Hema bêje di pergala mîrekiyan de xwe weke xelîfetiyeke biçûk nîşan dane û bi rêxistin kirine. Ji bilî hin mîrekiyên kurdan ên hatine sazkirin, bi awayekî giştî van mîrekiyan ji sazîbûna ereban û zarîkirinê wêdetir gav navêtine.

# Pirsên Nirxandinê

1- Bandorên îslama desthilatdar ên li ser civaka kurd, çi bûn?

2- Sedemên ku koma desthilatdarên kurd bi awayekî ew qas zû erebûyînê dipejirîne, çi ne?

3- Desthilatdarên ereb, bi çi rengî dixwestin çand û zimanê gelan bihelînin?

4- Çima mîrekiyên ku kurdan ava kiribûn, di bin bandora erebî de bûn?

5- Bersiva rast hilbijêre.

- Êrîşên dagirkeriyê yên xanedana emewiyan, li Kurdistanê bûne sedema bandorên

A) Hilweşîner B) avabûnê C) Sazbûnê

- Koma desthilatdar a kurd ji bo berjewendiyên xwe, erebûyîn bi kûrahî

A) Red kiriye B) Guhertiye C) Jiyaye







# REWŞA HIN MÎREKIYÊN KURD ÊN DI PÊVAJOYA ÎSLAMÊ DE HATINE AVAKIRIN (800-1100)

## 1- MERWANÎ

Merwanî, di sala 985'an de ji aliyê Bad (Baz) Bin Dostik ve hatiye avakirin. Paytexta wê Farqîn (Sîlwan) e. Bad, weke berteka li hemberî stemkariya Ebasiyan a li ser civaka kurd derketiye. Ev rastî pêvajoyeke ku ji lewazbûna Ebasiyan tê.

Merwanî, di pêvajoya Bad Bin Dostik de destpêkê Erdîş (Ercîş) û derdora wê digirin. Piştî wê, herêmên Amed, Farqîn û Nisêbînê ku di bin desthilatdariya Buweyhiyan de têk dibin û Mûsilê dixin bin fermandariya xwe.

Di êrîşa xwe ya li ser Bexdayê de bi ser nakeve û di heman demê de neçar dimîne dest ji Mûsilê jî berde. Di sala 991'ê de dema Mûsil di destê Hemdaniyan de bû, dîsa dixwest bi dest bixe, di şer de bi bin dikeve û dimire. Hesen Bin Merwan li şûna Bad, tê ser text. Di sala 1011'an de tê jehrkirin, Ebû Nasir Bin Merwan ê ku jehr daye wî, tê ser text. Ebû Nasir 40 salî fermandariya xwe didomîne. Girêdana xwe ya bi xelîfeyê Ebasî re diyar dike, li ser navê xelîfe pereyan çap dike û salane bacê dide. Kurê Ebû Nasir, Mensûr tê cihê bavê xwe. Mensûr bi Alparslan re li hev dike û dikeve şerê Melazgirê. Di dema Mensûr de Selçûqî bi artêşeke mezin êrîşî dewleta



Mîrekeke Xweser A Kurdan

Merwaniyan dikin. Di sala 1085'an de Dewleta Merwanî, ji aliyê Selçûqiyan ve tê rûxandin.

## 2- ŞEDADÎ

Di sala 951'an de ji aliyê Mihemed Şedadî ve hatiye avakirin. Paytexta wê, bajarê Diwîn e ku nêzîkî Êrîvanê ye. Di sala 955'an de hemû herêma Serhed û Azerbeycanê dixe bin desthilatdariya xwe. Di sala 971'an de bajarê Gênceyê dixe bin destê xwe. Ev bajar, bû paytexta bingehîn a Şedadiyan. Bi Gurcî, Rûs, Ermenî û Bîzansiyan re şer kirine.

Mîrê Şedadiyan Ebû Ensar Şalwar (1049-1067) di van şeran de serkeftinên mezin bi dest dixe. Herêmên Hanî, Qers, Agirî, Tebrîz, Tiflîs, Erdexan, Wan û Mûşê dixe bin fermandariya xwe. Lê piştre, Şedadî bûn du parçe (1075). Bi belavbûna desthilatdariya Selçûqiyan a li herêmê re, Şedadî jî, dikevin bin destê wan.

## 3-BUWEYHAN

Li ser bingehê şîatiyê hatiye avakirin. Ji sala 932 ta 1055'an desthilatiya xwe domandiye. Yê ku navê xwe dayî vê xanedaniyê Ebû Sûca Buweyh e. Kurên wî Elî, Hesen û Ehmed sê mîrekiyên cuda ava kirine. Li Îran, Xorasan û tevahiya Mezopotamyayê. Dema Ebû Duweyle ku dewletê dike yek, dema zêrîn e. Piştî mirina wî, dîsa hatiye parçekirin. Di dema yekirinê de Bexda hatiye stendin û xelîfeyê Ebasî bi giştî êdî di bin bandora Buweyhan de ye. Dema welat tê parçekirin, beşên Îran û Xorasanê ji aliyê Xeznewiyan ve, tê hilweşandin. Beşa











Mezopotamyayê jî ji aliyê xelîfeyê Ebasî ve, bi alîkarî xwestina ji Selçûqiyên jêr ên ku di bin desthilatiya Tûxrûl Bey de ne, di sala 1055'an de hatiye rûxandin.

## 4- EYÛBÎ


Selahedîn

Ji aliyê fermandarê mezin ê kurd Selahedînê Eyûbî ve, tê avakirin. Selahedînê Eyûbî di sala 1138'an de li Tekrîtê ji dayîk bûye. Bavê Selahedînê Eyûbî, Eyûb û mamê wî Şêrko di xizmeta mîrê Mûsilê Nûredîn Zengî de bûn. Selahedîn bi saya bav û mamê xwe, hunera rêvebirin û artêşê fêr dibe. Selahedîn di 14 saliya xwe de tevlî artêşê dibe. Piştî ku Selahedîn û mamê xwe Şêrko li Şamê demeke diyar di artêşê de xizmetê dikin, bi fermana Nûredîn Zengî weke serfermandar bi artêşekê re ber bi dewleta Fatimî ya Misrê ve dikevin rê. Dewleta Fatimî ji şerkirina bi vê artêşê re, ditirse. Ji ber vê, riya lihevhatinê hildibijêre. Şêrko dibe wezîrê dewleta Fatimî. Piştî demeke kurt Şêrko dimire, Selahedîn tê cihê wî. Di sala 1171'an de Selahedîn, dawiyê li dewleta Fatimî tîne.


Demekê bi navê Nûredîn Zengî desthilatdariyê bi rê ve dibe. Di sala 1174'an de serbixwebûna xwe diyar dike. Li vir, li dijî xaçperestan dikeve nava amadekariyeke mezin. Artêşekê ji hemû gelên Rojhilata Navîn (kurd, tirk,


Rizgarkirina Qudsê

faris, ereb…) ava dike. Gewdeyê bingehîn û hêza lêdanê ya artêşê ji kurdan pêk dihat. Vê artêşê, pirî caran bi xaçperestan re şer kiriye, herî dawî bi şerê Hetîn xaçperest rastî binketineke berçav tên û Quds tê rizgarkirin. Piştî vê rizgarkirinê Misir, Sûrye, Yemen û Iraq, dikeve bin kontrola Selahedîn. Piştî van serkeftinên Selahedînê Eyûbî, êrîşa sêyem a xaçperestan, dest pê dike. Selahedînê Eyûbî ev êrîşa ku ji artêşên sê dewletan pêk dihat, bi bin xist. Selahedînê Eyûbî di 4’ê Adara 1193’yan de li Şamê weke Fermandarê Rojhilata Navîn, tê nasîn û çavên xwe li jiyanê digire. Selahedînê Eyûbî weke kesekî kurd ê girîng muhra xwe li dîroka cîhanê û Rojhilata Navîn dixe.







## Pirsên Nirxandinê

1- Kî Mîrtiya Merwanî ava dike û li hemberî zilma kê radibe?
2- Ebû Nasir, çawa tê ser text û çi dike?
3- Dema Ebû Duweyle Mîrtiya Şedadî dike yek, çi dike?
4- Şerê Selahedîn bi Xaçperestan re çawa pêk hat û kê cihê xwe di nava artêşê de digirt?

5- hevokên rast bi tîpa (R), yên şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bike.

- Mensûr bi Alparslan re li hev dike û dikeve şerê Melazgirê. ( )
- Merwanî di sala 1085'an de ji aliyê Emewiyan ve, tê rûxandin. ( )
- Paytexta Şedadiyan, bajarê Diwîn e ku nêzîkî Êrîvanê ye. ( )
- Selahedînê Eyûbî di 4'ê Adara 1193'yan de li Qudisê weke fermandarê Rojhilata Navîn, tê nasîn. ( )

# ÊRÎŞÊN XAÇPERESTAN

## DI DEMA ÊRÎŞÊN XAÇPERESTAN DE REWŞA EWRÛPA Û ROJHILATA NAVÎN



Êrîşên Xaçperestan

Rojhilata Navîn, bi şoreşa îslamê re di dema feodalî de pêngaveke mezin avêtiye. Di heman demê de ev şoreşa Rojhilata Navîn, şoreşa herî dawî ye jî. Rojhilata Navîn bi hêza xwe ya ku ji dîroka xwe digire pêngavên mezin avêtine. Lê belê çi qas derfetên vê hêza dîrokî hebe, di heman demê de neyîniyên wê jî, hene. Cara yekem rewşeke xerabûnê ya 5000 salî û zihniyeta dewletparêz heye. Di heman demê de, ji ber ku ji destpêka mirovahiyê ve di rewşa navendekê de ye, dogmatîzm û ji rê derketineke ku xwe ji hemû pêşketinên ji derveyî xwe re digire, dijî. Lê di serdema navîn de hîna jî, Rojhilata Navîn di rewşa navenda zanist, felsefe û ronîbûyînê de ye. Di şaristaniyê de hîn jî, navend e. Ewrûpa di vê demê de di nava pêvajoyeke tarî de dijî. Ji dema Grek û Roma ve tu derketin pêk naniye. Xiristiyanî di rewşa ol û saziya bîrdozî ya desthilatdar de ye. Di nava xwe de girtî ye û li riyeke derketinê digere. Her çi qas civaka Ewrûpa di nava demeke tarî



German knights of the Teutonic Order confront heavily-armoured Mongol horse-warriors at the Battle of Liegnitz, 1241.







de bijî jî, lê hîna jî civaka xwezayî dijî û di nava civaka dogmatîzmê de zêde najî.

Ji ber van sedeman Ewrûpa, êrîşkirina li ser Rojhilata Navîn weke yekane riya derketinê dibîne. Ji bo vê, êrîşên xaçperestan tên lidarxistin. Ji ber ku li ser cil û mertalên kesên tevlî vê êrîşê bûne xaç hebû, ji wan re **xaçperest** tê gotin. Xaç nûneriya ola xiristiyanî dike. Eger dîn û aborî weke sedemên vê êrîşê bê nîşandan jî, lê di rastiyê de ev şerekî şaristaniyan e. Nasnameya bîrdozî ya vî şerê şaristaniyê îslamiyet û xiristiyaniyetê ne. Di nava salên 1095-1272'yan de bi şerekî heşt êrîşên xaçperestan hatine lidarxistin.

**Encam û Şerên Xaçperestan**

1. Tevî sozên serkeftin û dagirkirinên papa û dêrê, ev êrîş bi binketinê bi dawî bûne, bawerî û girêdana bi papa û dêrê ve kêm bûye.
2. Pirsgirêka di navbera mezhebên katolîk û ortadoksan de germtir bûye.
3. Desthilatdariya navendî ya feodalîzma Ewrûpa, bi hêztir dibe.
4. Di encama van êrîşan de di rêjeyeke bilind de di nava hev de pişaftina çandan çêbûye.
5. Ji ber ku tecrubeyên di qada aborî û hilberînê de ji Rojhilata Navîn hatine wergirtin, li Ewrûpayê di asteke bilind de hilberîn hatiye bidestxistin.
6. Pisûle, kaxez, barûd û pêşketinên teknîkî derbasî Ewrûpayê dibin.
7. Bermahî û tecrubeyên di qada felsefe, bijîşkî, astronomî û fîzîkê de dibin Ewrûpayê. Vê rewşê ji bo serdema ronîbûyîna Ewrûpayê bingeh ava kiriye.

Rojhilata Navîn di encama van şer û êrîşan de dikeve dema paşveçûyînê. Ji hundir ve qedexekirina derfetên guftûgokirin û felsefeyê û ji derve jî, êrîşên xaçperestan û Moxoliyan, nehiştine ku êdî Rojhilata Navîn bi ser xwe ve bê û her dem paşdemayînek jiyaye.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Di serdema navîn de, rewşa Rojhilata Navîn û ya Ewrûpayê çi bû? Binirxîne.


2- Ji ber kîjan sedeman, êrîşên xaçperestan tên lidarxistin?

3- Çend encamên êrîşên xaçperestan binivîse.

4- Cihên vala, bi gotinên guncaw dagire.

Rojhilata Navîn di encama van şer û êrîşan de dikeve dema ....................... . Ji hundir ve qedexekirina derfetên ........................ û ..................... û ji derve jî, êrîşên xaçperestan û ....................., nehiştine ku êdî Rojhilata Navîn bi ser xwe ve bê û her dem .............................. jiyaye.







## PIRSÊN NIRXANDINA BEŞÊ

1- Beriya îslamê rewşa Kurdistanê çawa bû û xwedî kîjan taybetmendiyên civakî û ramyarî bû? Binirxîne.
2- Beriya îslamê bandora baweriya Zerdeştî ya li ser kurdan çi bû?
3- Kurdan, çima û çawa îslam pejirandin?
4- Desthilatdarên kurd bi hevkariya hêzên derve, îslam çawa bi kar anîn?
5- Hêzên derve yên weke ereb û osmanî, çawa îslam ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîn?
6- Di navbera kîjan salan de û di dema kîjan xelîfeyê îslamê de, îslam derbasî Kurdistanê bûye?
7- Ebû Muslimê Xorasanî, kî ye û çi kiriye?
8- Serhildana Mazdek, di kîjan salan de û li kîjan herêman derketiye?
9- Serhildana Babek, kîjan salê û li hemberî kê serî hildaye?
10- Piştî ku kurdan îslam pejirand, bandoreke çawa li ser civaka kurd kiriye?
11- Merwanî kî ne?
12- Desthilatdariya Merwaniyan li kîjan herêman belav bûye û xwedî desthilatdariyeke çawa bûn?
13- Merwanî, kîjan salê û bi destê kîjan hêzan hatiye têkbirin?
14- Şêweyê desthilatdariya Şedadî û Buweyhiyan çawa bû û çima têk çûn?
15- Sedemên êrîşên xaçperestan ên li ser Rojhilata Navîn çi bûn?
16- Encamên êrîşên xaçperestan, çi ne û êrîş di kîjan salan de dest pê dikin û heya kîjan salan berdewam dikin?

# BEŞA 3

## DI DÎROKÊ DE TÊKILIYÊN KURD Û TIRKAN

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1- Têkiliyên kurd û tirkan di kîjan salan de û çawa dest pê kirine? Lêkolîn bike.
2- Gelo eşîrên kurd û tirkan di dîrokê de bi hev re di nava têkiliyeke çawa de bûn û nakokiyên wan çi bûn? Lêkolîn bike.
3- Kurd û tirkan gelek peyman bi hev re çêkirine, lê çima ev peyman negihîştine encamê?
4- Di salên 1000- 1200'î de rewşa kurdan çawa bû? Lêkolîn bike.
5- Di dema dagirkeriya Moxolan de rewşa kurd û Kurdistanê çawa bû? Lêkolîn bike.






## DI DÎROKÊ DE TÊKILIYÊN KURD Û TIRKAN


Di dîrokê de têkiliyên kurd û tirkan, bi taybetî bi koçberiya tirkan a ji ber hin sedemên cuda ji Asya Navîn û gihîştina wan a Rojhilata Navîn dest pê dike. Ji aliyê tirkan ve kom bi kom bi pejirandina misilmantiyê, ya bi armanca xwebicihkirina di nava hêza şaristaniyên Rojhilata Navîn de, ev têkilî bi leztir bû.

Dema ku ereban çînî di sala 751'ê de li Talasa Asya Navîn bi bin xistin, tirkan îslamiyet û şaristaniya Rojhilata Navîn nasîne. Ji aliyê tirkan ve pejirandina îslamiyetê, bi taybetî di destpêka salên 900'î de ye. Di dema Ebasiyan de, li aliyê Îran û Xorasanê dewletên tirkan hatine avakirin. Dewletên weke: Xarezmî, Xeznewî û Karahanî, di navbera Asya Navîn û Rojhilata Navîn de weke pirekê hatin avakirinin. Lê zextên Çîn û Moxolan ên li Rojhilat, tirk bêhtir neçarî koçberkirina ber bi Rojava ve kirine. Di vê demê de bi taybetî di hilweşîna dewleta Buweyhiyan de, bandora van hêzan heye. Împaratoriya Selçûqî ya mezin bi şerê Dandanakan a bi Xeznewiyan re, di sala 1040'î de hat damezirandin. Di sala 1055'an de bi rûxandina Buweyhiyan re ber bi rojava ve belav dibe. Di wê demê de tirkan her çi qas dewlet û rêxistinên xwe yên avaniya jor û desteya jor pêş xistibin jî, lê di çîn, beşên civakê û nava gel de dest-hilatdariya xwe bi cih nekirine.



Dewleta Selçûqiyên Mezin

## ÎMPARATORIYA SELÇÛQIYAN




Tirk di destpêka sedsala 9’an de ji ber sedemên cur bi cur koçberî Rojhilata Navîn bûne. Yek ji van qebîleyan Oxûzî bû. Oxûzî, li hundirê Îranê bi cih dibin. Di wê demê de li wir du împaratoriyên bihêz Karahanî û Xeznewî hebûn. Oxûziyan hewl didan di navbera van her du împaratoriyan de cihekî ji xwe re bibînin, lewra jî dem bi dem bi lihevdanan re ji xwe re cihek bi dest dixistin. Oxûziyên ku tim bi Xeznewiyan re di nava dijberî û pêşbaziyekê de bûn, di bin pêşengiya Tûxrûl û Çaxrî Beg de di sala 1040’î de bi şerê li Dandanakanê re Xeznewiyan bi bin dixin û Împaratoriya Selçûqî ya Mezin ava dikin. Di 15’ê Kanûna 1055’an de Selçûqî dikevin Bexdayê û dawî li desthilatiya Buweyhiyan tînin. Lê di hemû qad û cihên ku dixwazin xwe lê bi cih bikin de, çandên pir bihêz hene. Astengî û konseptên weke neheliyan, an jî nepejirandin hene.

## SEDEMÊN PEYMAN Û YEKÎTIYA KURD Û TIRKAN

Her çi qas Selçûqî di Rojhilata Navîn de weke hêzek girîng derketibin holê jî, her tim rastî helandin û pişaftineke civakî hatine. Ji ber vê rewşê, pêwîst dike ku li ser navê îslamê bikevin cihên şaristaniyan yên ku îslam lê tune û li wê derê bi cih bibin. Ji ber van sedeman, dewleta Selçûqî di dema Alparslan de, dest bi xwegihandin û êrîşî sînorên Bîzansê kiriye. Selçûqî bi taybetî di navbera salên 1055-1065’an de ji bo li Kurdistan û Rojhilata Navîn bi cih bibin, bi kurdan re têkoşîna hevpar a li dijî dijberên xwe meşandine. Lê vê yekê, ji bo kurdên ku yek ji gelên girîng ên Rojhilata Navîn û çanda Aryen







in, serkeftineke leşkerî, ramyarî û civakî bi dest nexistiye. Kurd û tirkan di sala 1071'ê de yekîtî û peyman saz kirine. Ev yekîtî û peyman, di navbera Merwanî (di heman demê de begtî û eşîrên din jî hene) û Împaratoriya Selçûqî ya Mezin de pêk hatiye.

## ŞERÊ MELAZGIRÊ Û ENCAMÊN WÎ

Piştî sazkirina vê yekîtiyê, artêşa bingehîn a Selçûqî dikeve tevgerê. Kurdên li Hemedan, Colemêrg û cihên din jî tevlî vê artêşa bingehîn dibin. Artêşeke pir mezin, artêşa yekîtî û peymana kurd û tirkan di sala 1071'ê de di Deşta Melazgirê de, bi artêşa Bîzansî re tên beramberî hev. Li gorî hin jêder û belgeyan 20 hezar û li gorî hinan jî, 40 hezar leşker û siwarên kurd, tevlî vî şerî bûne. Artêşên hevgirtî û peymandar ên Bîzansiyên ku di bin fermandariya Romen Diyojen de ne, ji sed hezarî derbas dibû, ji bo dubare Azerbeycanê bi dest bixe, ketibûn ser rê. Artêşên hevgirtî û peymandar ên kurd û tirkan jî, bi qasî 90 hezar kesî bûn. Alparslan û artêşa kurd a hevgirtî jî, di ser Wanê re digihêjin deşta Mûş-Melazgirê. Her du artêş, li vê derê dest bi şer dikin. Di şer de, dema ku artêşa Selçûqî



Şerê Melazgirê

dest bi xwepaşvekişînê dike, siwarên kurd dikevin qada şer. Çarenûs û encama şer, bi vê pêngavê zelal dibe. Artêşa Bîzansî ya ku xwe li beramberî siwarên kurd nagire, hildiweşe û Împaratorê Bîzansî Diyojen,dîl tê girtin.

## Encamên Şerê Melazgirê

**1-** Bi vî şerî, ji tirkan re deriyê Anatolyayê vedibe.
**2-** Kurd, ji zexta Bîzansiyan rizgar dibin, aramtir û pêşketîtir dijîn.
**3-** Kurd û tirk, êdî tim di nava têkilî û girêdanekê de dest bi jiyana nû dikin.
**4-** Çanda xwecih a kurd û çanda koçerî ya tirk, yekbûn û têkildariyeke berbiçav dijîn.
**5-** Qebîleyên tirk ên ku di nava sînor û derdora sînorên Kurdistanê de dijîn, dikevin bin bandora kurdan û dest bi pişaftinê dikin.
**6-** Çînên desthilatdar ên kurd û tirk, ji vê demê û pê ve dest bi jiyan, têkilî û pirsgirêkên nêzîktir dikin.
**7-** Li dijî şaristaniya rojava(Ewrûpa), qadeke biewle û parastî tê sazkirin.
**8-** Çîna desthilatdar a tirk, li Anatolyayê tê rewşa hêzeke ramyarî ya girîng, piştre mîrîtiyên kurd dixe bin desthilatdariya xwe.






## Pirsên Nirxandinê:

1- Çima Selçûqî, neçarî koçberiya ber bi rojava ve dibin?

2- Qebîleyên Oxûz, bi çi awayî cihê xwe di nava Karahanî û Xeznewiyan de digirin?

3- Çima Selçûqî, di dema Alparslan de êrîşî sînorên Bîzansiyan dikin?

4- Di şerê Melazgirê de serkeftin, bi çi awayî çêdibe?

5- Encamên şerê Melazgirê, binirxîne.

## PÊVAJOYA MELIKŞAH Û DI YEKÎTIYA KURD Û TIRKAN DE QUTBÛNA DESTPÊKÊ

Piştî ku Alparslan di sala 1072'yan de dimire, kurê wî Melikşah diçe ser textê Selçûqiyan. Di navbera salên 1072 û 1092'yan de sultantî kiriye. Qonaxa herî pêşketî û ronî ya Împaratoriya Selçûqiyan e, di heman demê de qonaxa ku dest bi paşketinê kiriye. Sînorên împaratoriyê ji Anatolyayê, ta Okyanûsa Hindî dirêj bûne. Xelîfetiya Ebasî bi temamî ketibû bin desthilatiya Selçûqiyan, her weke ku bûbû karmendekî Selçûqiyan. Melikşah, li gorî polîtîkaya yekîtiya kurd û tirkan a bavê xwe, dimeşand. Her çi qasî ew yekîtiya di navbera wan de demekê berdewam kiribe jî, lê piştre dest bi dagirkirina axên Kurdistanê kiriye. Destpêkê, dewleta Merwanî ya ku navê fermî yê yekîtiya di navbera wan de bû, hilweşand û bajarên Mêrdîn, Amed, Çewlik, Bedlîs û Wan dagir kirin. Piştre jî, dawî li mîrîtiya Şedadiyan anî û herêma Serhedê dixe bin destê xwe. Bi taybetî, di encama van dagirkirinan de, ev yekîtî xerab bû, derdorên civaka kurd û rêveberan piştgiriya xwe ya ji bo dewleta Selçûqiyan bi paş de kişandin. Piştî qutkirina vê piştgiriyê, Împaratoriya Selçûqî, di demeke kurt de dikeve qonaxa xwe ya paşketinê. Ji ber ku bi palpiştiya kurdan li Anatolyayê berfireh dibû, xwe li Rojhilata Navîn dida pejirandin û di warê leşkerî û ramyarî de vê yekîtiyê, her du gel serkeftî dikirin. Piştî xerabûna vê yekîtiyê, di pêşketina wan de rawestîn çêdibe.



**Melikşah**







## SERDEMA HERZEMŞAH

Di sala 1141’ê de bi serhildana li dijî Selçûqiyan hatiye avakirin. Herzemşahan, desthilatdariya xwe li Îran, Xorasan û Rojhilatê Kurdistanê saz kiriye. Xwe weke berdewamiya Selçûqiyan dizanin. Her çi qas sultanê tirk e, di nava gel û derdorên rêveberiya qesrê de giraniyek a gelên herêmê heye.




Dewleta Herzemşah

Rêveberiya qesrê, weke dewletên din ên tirk, ji faris û kurdan pêk tê. Di sala 1194’an de li Rojhilata Navîn û Kurdistanê desthilatdariya xwe saz dikin. Xelîfetiya Ebasî jî, dixe bin destê xwe. Parêzvaniya xelîfetiya Ebasî digire ser milên xwe. Herzemşahî, qonaxa xwe ya herî bihêz, di dema Eladîn Mihemed de dijîn. Di vê demê de heta hundirên Asya Navîn diçin. Bi Selçûqîyên Anatolyayê û Eyûbiyan re li Rojhilata Navîn têkoşîna desthilatdariyê dimeşînin. Li dijî xaçperestan alîkarî bi dewletên din re nekiriye. Ji ber ku alîkarî nekirine, di Rojhilata Navîn de rêzdarî û nirxê wê kêm dibin. Di dema Eladîn Mihemed de bi zext û bacên giran stemkariyê li gelên herêmê dikin. Ji ber vê sedemê serhildan, bê aramî û dijberî

dest pê dike. Di sala 1231'ê de bi mirina Celaledîn Mihemed re, dewleta Herzemşahan ji holê radibe.

## Pirsên Nirxandinê:


1- Di dema Melikşah de çi guhertin di têkiliyên kurd û tirkan de çêdibin?

2- Di dema Melikşah de Xelîfetiya Ebasî, dikeve rewşeke çawa?

3- Çima di Rojhilata Navîn de rêzdarî û nirxê Dewleta Herzemşahî kêm dibin?

4- Sedemên paşketina Împaratoriya Selçûqî, çi ne?







# DEWLETA SELÇÛQÎ YA ANATOLÎ Û KURD


Êrîşên Xaçperestan

Beşeke girîng a Anatolyayê, piştî şerê Melazgirê kete bin destê tirkan. Di vê demê de Anatolya, weke herêm û qadeke Selçûqî ya mezin hatiye birêxistinkirin. Di dema Melikşah de vê berfirehbûnê berdewam kiriye. Lê piştî xerabûna yekîtiyê, ev berfirehbûn kêm bûye û piştî demekê jî bi giştî rawestiyaye. Bîzansî dubare bi hêz bûne û dest bi tengavkirina tirkên li Anatolyayê kirine.

Dewleta Selçûqî ya Anatolyayê dema Melikşah dimire, di 1092'yan de hatiye sazkirin. Her çi qas pêşveçûnek pêk anî be jî, lê li dijî êrîşên Xaçperest û Bîzansiyan bi tena serê xwe nikariye li ber xwe bide. Di serî de Îznîk, neçar maye destê xwe ji tevahiya Anatolyaya Rojava bikşîne. Di encama vê binketinê de tirk di Anatolyaya Navîn de dest bi tengavbûn û perîşanbûnê dikin. Konfederasyona Şêwirmend a ku di sînorên Kurdistanê de hatiye sazkirin, Selçûqiyên Anatolyayê tengavtir dike. Şêwirmendî, bi saya yekîtiya konfederal ya kurd re, bi binxistina xaçperestan a di sala 1100'î de vê yekîtiyê bi hêztir dike. Kiliçarslan li nêzîkî Mûsilê di şerê ku bi Selçûqiyên Mezin re kirî de, bi bin ketiye û miriye. Di vê demê de desthilatiya ramyarî ya herî girîng a Anatolyayê ketiye destê Şêwirmendiyan. Di dema Şêwirmendiyan de Rûknedîn Mesûdê Yekem sultanê Selçûqiyên Anatolyayê ku dubare li yekîtiya bi kurdan re digere,

di sala 1145'an de ji Kurdistanê re balyoz û nûnerên xwe şandine, lê kurdan bi Şêwirmendiyan û atabegê Mûsilê Nûredîn Zengî re yekîtî saz kirine. Kurdan bi Selçûqiyan re yekîtî çênekirine. Nûredîn Zengî, kurdan û Şêwirmendiyan, başûr û rojhilatê xakên Selçûqiyên Anatolyayê xistine bin destên xwe. Rûknedîn Mesûdê Yekem, ji bo ku xwe û dewleta xwe biparêze, ji Bîzansiyan alîkarî xwestiye. Piştî vê êrîşê, tirkên Anatolyayê di navbera Enqere, Konya û Kayserî de dorpêçkirî mane û tengav bûne. Di êrîşa duyem a xaçperestan de kurd, Şêwirmendî û Selçûqiyên Anatolyayê ji bo biratiya îslamê hevgirtî bûne. Bi saya vê yekîtiyê, di sala 1147'an de li Eskîşehîrê artêşa xaçperestan bi bin xistine. Lê tirkên Anatolî û kurdan yekîtiyek saz nekirine. Rûknedîn Şah, piştî di sala 1155'an de dimire, di navbera kurên wî de ji bo sultaniyetê, şer derdikeve. Heta sala 1160'î di nava wan de şerê navxweyî çêbûye. Di sala 1160'î de Kiliçarslanê duyem bûye sultanê Selçûqiyan. Piştî Kiliçarslanê duyem dibe sultan, yekîtî û peymana xwe ya bi Bîzansiyan re piştî demekê bi dawî kiriye. Di sala 1174'an de komeke mezin a balyoz û nûnerên xwe tevî xelatên cur bi cur, li ser navê kurdan ji sultanê kurdan Selahedînê Eyûbî re rêdike û daxwaza peyman û yekîtiya bi wan re dike. Selahedînê Eyûbî dibêje: Eger kurdan weke parazvanên xwe bipejirînin, ew ê jî vê yekîtiyê bipejirîne. Kiliçarslanê duyem vî mercî dipejirîne, piştî saleke din Kiliçarslanê duyem tê gel Selahedînê Eyûbî û sûltaniya wî ya mezin dipejirîne. Piştî vê dîrokê, dewleta Selçûqî ya Anatolyayê dubare dest bi berfirehbûnê dike. Li beramberî Bîzansiyan dîsa dikeve rewşa desthilatbûnê.

Kiliçarslanê duyem di sala 1176'an de artêşa Bîzansî di şerê Mîryakefelon de bin dixe. Bi vî şerî re tirk li Anatolyayê xwecih û herdemî dibin. Li gorî ku hin dîrokzan diyar dikin, di vî şerî de eşîrên kurdan jî cih girtine. Her çi qas ber bi rojava û bakurê Anatolyayê ve berfireh dibe jî, lê hêza wê ya berfirehbûna ber bi rojhilat ve tuneye. Tirkên Anatolyayê,






zêdetir ber bi rojava, ango xakên Bîzansê ve berfirehbûna xwe berdewam kirine.



Silêman Şah

Piştî Kiliçarslanê duyem dimire, kurê wî Silêman Şah dikeve cihê wî. Silêman Şah vê yekîtî û peymanê berdewam dike. Di sala 1196'an de dawî li mîrtiya Selçûqiyan a Anatolyayê aniye. Dema ku Silêman Şah di sala 1204'an de dimire, tirkan berfirehbûn û bicihbûna xwe ya li Anatolyayê di asteke girîng û mezin de zêde kirine. Di sala 1205'an de Selçûqiyên Anatolyayê herêmên li qeraxên Derya Spî xistine bin destên xwe. Di serdema Xiyasedîn Keyxûsrew de, peywendiyên kurd û tirkan kêmekî sekinîne û lewaz bûne. Di vê demê de her du civak jî xwe tevlî nakin. Her du civak jî bê dijmintî, jiyana xwe berdewam dikin. Tirk, zêdetir belavî rojava dibin û kurd jî, pêşveçûna xwe berdewam dikin. Selçûqiyên Anatolyayê di dema vî sultanî de bûne dewleteke navendî û bi riya parêzgeran, ango waliyan, rêvebirina tevahî xakan bi navendê ve hatiye girêdan.



1. Xiyasedîn Keyxûsrew

# Pirsên Nirxandinê:

1- Çima tirk di Anatolyaya Navîn de dest bi tengavbûn û perîşanbûnê dikin?

2- Ruknedîn Mesûdê Yekem, ji bo ku xwe û dewleta xwe biparêze, çi dike?

3- Çawa Dewleta Selçûqî ya Anatolyayê dubare dest bi berfirehbûnê dike?

4- Kiliçarslanê duyem di sala 1176'an de, çi serkeftinê bi dest dixe?

5- Di serdema Xiyasedîn Keyxûsrew de, peywendiyên kurd û tirkan, di çi rewşê de ne?







## DAGIRKERIYA MOXOLAN


Cengîzxan


Damezrînerê Împaratoriya Moxol, Cengîzxan e. Ev nav, piştî sazkirina dewletê stendiye. Navê wî yê yekem, Tîmûçîn e. Împaratoriya Moxol di navbera salên 1206-1268'an de jiyaye. Mezintirîn Împaratoriya dîroka cîhanê ye ku xwediyê sînorên hevgirtî ye.

Sînorên vê împaratoriyê, ji Kendava Besra heta Sîbîrya, ji Asya Navîn ta Viyanayê dirêj bûye. Di heman demê de hov û çavsortirîn împaratoriya dîroka cîhanê ye. Di mejiyê pir gelan de, bi tirsnakiya xwe bi cih bûye. Artêşa Moxol, di jiyana Cengîzxan de tu carî bi bin neketiye. Hemû welatên ku ketinê de, talan û qirkirin pêk anîne. Ev împaratorî, ji çanda koçeriyê zêdetir, tiştekî din nizane û tevahî jiyan û aboriya wan jî, spartine vê. Aboriya dewletê jî li ser talanê ye. Li gorî berxwedana cihên cîwarbûnê, yan jî welatên dagir dikin, nêzîkatiya dagirkirinê cuda ye. Yê li ber xwe dide, ger bajarek an jî welatek be, hemû zilamên wî bajarî, yan jî welatî tên kuştin, jin û pîşekar weke dîl ji Asya Navîn re tên birin. Bajar, an jî welatê berxwedêr tê serûbinkirin. Ger bajar li ber xwe nedabe, tevahiya gel derdixin derveyî bajêr, bajêr talan dikin û dest li gelê bajêr nayê dayîn. Bi van rêbazan, tirs belavî nav gelan dibe, bi vê re di her dagirkirinekê de, berxwedana gel tê astengkirin.



Cengîzxan di sala 1206’an de Moxol û qebîleyên li Asya Navîn gihandin hev û împaratorî ava kir. Di sala 1215’an de tevahî Çîn dagir kiriye. Moxolî di sala 1218’an de jî, bi binxistina Herzemşahiyan re dikevin Rojhilata Navîn. Di sala 1220’î de beşeke mezin a Kurdistanê dagir kirine. Bajarên weke Şarezor, Amed, Xelat û Wanê serûbin dikin û bi hezaran mirovan dikujin. Li beramberî vê talan û dagirkeriyê, kurd neçar dimînin xwe vekişînin çiyayan. Yên li bajaran dijîn jî, di bin her cure stemkarî û zextê de jiyana xwe berdewam dikin. Moxolî, tevahî pirtûkên ku bi hezarê salan kom bûne, dişewitînin, pirtûkxaneyên tilîjimar, yên cîhanê ku li bajarên weke: Bexda, Semerkant, Amed, Rey û hwd. bûn, bi giştî dişewitînin. Civakên Rojhilata Navîn, ji her cure pêşveçûn û vebûnê qut dibin. Ewrûpa jî, di bin gefên Moxolan de jiyana xwe berdewam kiriye. Rojhilata Navîn bi giştî dest bi jiyana pêvajoyeke tarî kiriye. Vê navenda zextê, bi her awayî jiyana zanistî û civakî, bi giştî rawestandiye. Qada zextê ya Moxoliyan, ta sala 1410’an weke çaxa Tîmûr berdewam dike.

Êrîşên Moxolan, li Kurdistanê dibin sedema windahî û êşên mayînde. Windahiya herî girîng jî, di vê demê de lewazbûna jiyana civaka kurd û paşveçûna wê ye, heta rawestana wê ye jî. Seranserî xaka Kurdistanê rastî dagirkerî û talanê hatiye. Vê talanê di heman demê de civak jî, şkandiye. Gelê kurd ji bo ku xwe biparêze, xwe vekişandiye çiyayan, lê vê vekişandinê pêşveçûna jiyana civakê sekinandiye. Kurdan, tenê kariye xwe biparêzin. Dema Cengîzxan dimire, împaratorî di nava kurên wî de tê parçekirin.








# Pirsên Nirxandinê:

1- Sînorên Împaratoriya Moxol, ji kû ta kû derê dirêj dibin?

2- Bajar, an jî welatên ku Moxolî dikevinê, ger li ber xwe bidana, çi tanîn serê wan?

3- Bi ketina Moxolan a Kurdistanê re, gel li ber stemkariya wan bi çi şêweyî dijî?

4- Hevokên rast bi tîpa (R), yên şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bike.

- Damezrînerê Împaratoriya Moxol, Alparslan e. ( )

- Împaratoriya Moxol, ji çanda koçeriyê zêdetir, tiştekî din nizane. ( )

- Moxolan, di sala 1251'ê de tevahiya Çînê dagir kiriye.( )

- Moxolan, di sala 1220'î de, beşeke mezin a Kurdistanê dagir kiriye. ( )

## ÊRÎŞÊN HOLAKO Û TÊKÇÛNA ROJHILATA NAVÎN

Holako, neviyê Cengîzxan û damezrînerê dewleta Îlxaniyan e. Birayê Mengoxan û Kubîlexan ên xanên mezin ên Moxolan e. Ji bo ku axên Rojhilata Navîn ên nehatine dagirkirin, bistînin, ew ji aliyê Mengoxan ve hatiye erkdarkirin. Armanca wî bi van gotinan hatiye diyarkirin: Ew wê Lorê ku yekîtiyeke kurdan e bixe bin desthilatdariya xwe, terîqata Hesen Sabah a navenda wê li Keleha Alamûtê ye ji holê rake, xelîfetiya Ebasiyan têk bibe, Bexdaya ku navenda xîlafetiyê ye bi dest xwe bixe, Şama ku axa Emewiyan e dagir bike û dewleta Memlûkî ya li Misrê têk bibe. Mengoxanê ku van erkan diyar dike, ji Holako dixwaze ku nêzîkatiyeke baş nîşanî yên ku teslîm dibin, bike û yên ku li hember derdikevin jî, bi tevahî ji holê rake. Bi vê artêşa hatiye amadekirin re(ji bo vê êrîşê ji her pênc zilamên Moxolî, yekî digirin nava artêşê) di sala 1255'an de ber bi navenda Îranê ve pêş ketin û ji bo pêkanîna armancên ku hatine diyarkirin, ketin nava liv û tevgerê.



Kelha Alamûtê

Di demeke kurt de axa Loran dagir û tarûmar kirin. Piştre, berê xwe dan Kelha Alamûtê. Keleha ku pirî caran hatiye dorpêçkirin, lê nehatiye bidestxistin; bi çêkirina qenalan û petrolê dagirtina qenalan (tunel) û teqandina wê ve hat bidestxistin. Hemû kesên di kelehê de tune kirin. Piştî ku keleh hat bidestxistin,



Holako







pirtûkxaneya mezin jî ji holê rakirin. Piştî Keleha Alamûtê hat bidestxistin, Holako berê xwe da Bexdayê. Dema ku xelîfeyê Ebasiyan Mutasim, bersiva neyînî da banga xwe radestkirinê ya artêşa Moxolan, ev ji xwe re kirin sedema xerabkirina Bexdayê. Bexda dagir, talan kirin û xwestin tune bikin. Artêşa Ebasiyan di du pevçûnên destpêkê de bi ser dikevin. Ji ber vê sedemê, ji xwe bawer dibin. Bi vê baweriyê re, ji derveyî bircên bajêr xwe bi cih dikin.

Amadekariyên xwe nakin û ji ber vê yekê, di pevçûnên piştî wê de winda dikin. Ya ji vê girîngtir, piştî ku artêşên Moxolan bendavên li ser çemê Dicle şikandin, beşeke girîng a artêşa ji derveyî bircan di avê de dixeniqin. Piştî wê, Holako daxwaza lihevhatinê ya Xelîfe Mutasim napejirîne û di nava çend rojan de hemû bircên bajêr dixe bin destên xwe. Yên ji artêşa Ebasiyan dimînin, hemûyan dikujin.

13'ê Sibata 1258'an de Bexda bi tevahî tê bidestxistin, hemû mirovên li wê derê dikujin. Dîroknas diyar dikin, ku di dîrokê de komkujiya herî mezin, li vê derê pêk hatiye. Mirov nikare texmîn bike, ku li vê derê çend mirov hatine kuştin. Hin dîroknas dinivîsin ku 90 hezar mirov hatine kuştin. Dîroknasê misilman yê bi navê Ebdullah Wasaf diyar dike ku ev hejmar sed hezaran derbas dike. Tê gotin ku dema Holako nameyekê ji qralê Fransa yê bi navê Louis (Liwîsê) 9. re dişîne, di nameyê de diyar dike ku wan nêzî 200 hezar kesî kuştiye û Holakoyê ku ji kuştina mirovan, ji talankirina bajêr, ji şewitandin û xerabkirinê têr nabe, hemû pirtûkên di pirtûkxaneya bi nav û deng a Bexdayê de ku navenda zanista wê demê bû, nivîsên bi dest, davêje çemê Dicle û bi vê, nimûneyeke mezin a hovîtiyê nîşan daye.

Holako di şerê xwe yê ku meşandî de serkeftî bû. Armancên xwe, piranî pêk anî bûn. Lê belê, Misr hîna bi dest nexistibû û di nava tevgerê de bû. Di wê demê de Mengoxan dimire. Holako ji artêşa xwe qederek serbaz li şûn dihêle û vedigere Qafqasyayê. Dema ku Holako ji heremê diçe, di

navbera artêşa Moxol û Memlûkiyan de li Eyn Calûtê şer diqewime. Artêşa Moxolan têk diçe û xaka Filistîn û Sûriyê winda dike. Di vê navberê de li ser text jî, şer çêdibe.

Yekîtiya Moxolan, dibe çar parçe. Dewleta Îlxanî jî, di vê demê de bi destê Holako tê avakirin. Holako li ser vê rewşê, dixwaze artêşa Moxolan careke din vegerîne Rojhilata Navîn. Lê dema ku li ser rê bû, artêşeke din a Moxolî ya bi navê Berkexan êrîş dibe ser dewleta Îlxaniyan. Ew sedem jî, vegera Holako asteng dike. Bi artêşa Berkexan re dikeve nava şer û têkçûneke giran dijî. Di sala 1265’an de jî, dimire.

## Encamên Êrîşa Holako

Her çi qasî ne di heman çarçoveyê de be jî, bi dehan bajar hatin têkbirin û şewitandin. Şêniyekî mezin tê tunekirin. Dewlemendî û daneheveke mezin talan dike. Bi sed hezar - bi milyonan berhemên ku embara dîrokê bûn, tên tunekirin. Ev tiştên ku li vê derê hatine jiyîn, bandoreke diyarker li ser siberoja Rojhilata Navîn a wê demê dike û piştî vê dîrokê, careke din Rojhilata Navîn bi ser xwe ve nayê. Rojhilata Navîn a ku heya wê demê navenda zanistê bû, ji vê dîrokê û şûn de ber bi nezaniyê ve tê kişandin. Pêşkêşiya zanist û pêşketina civakê, dikeve destên Ewrûpiyan.




Rojhilata Navîn







## BANDORÊN DAGIRKERIYA MOXOL A LI SER ROJHILATA NAVÎN Û KURDISTANÊ

1. Rojhilata Navîn û Kurdistan bi giştî hatiye talankirin û rûxandin.
2. Di Rojhilata Navîn de pêşveçûnên zanistî û yên din, bi giştî rawestiyane.
3. Rojhilata Navîn û gelê kurd, tenê ji derveyî têkoşîna hebûn û çêbûna xwe, tu pêşketineke din çênekirine.
4. Pirtûkxaneyên ku jêdera kombûnên pir girîng in, hatine rûxandin û pirtûkên wan hatine tunekirin.
5. Di bîranînên civakan de şopên tirsnak hiştine. Gelên li Rojhilata Navîn û cihên din, ev şop demeke dirêj bi xwe re jiyane.
6. Ji bo kurdan serdema Moxolan, serdemeke tarî û hatiye windakirin e. Li Kurdistanê, tevahî sazî û berhemên girêdayî kurdan, wêran bûne. Demeke pir dirêj, tenê kurdan karîne, hebûna xwe biparêzin.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Neviyên Cengîzxan kî ne? Bi nav bike.

2- Bi çi şêweyî Mengoxan, ketina Xelîfetiya Ebasiyan diyar dike?

3- Holako, li Bexdayê çi qas mirov kuştine?

4- Holako, di kîjan şeran de têk çûye?

5- Encamên êrîşa Holako ya li ser Rojhilata Navîn, çi bûn?

## DEWLETA KARAKOYÛNIYAN

Dema ku dewleta Îlxanî parçe dibe, li cihê wê dewletên Akoyûn, Karakoyûn û Celayîrî tên damezirandin. Karakoyûnî di sala 1366'an de li navçeya Wan Ercîşê tê damezirandin. Ev der, demekê bûye paytexta Karakoyûniyan. Bayram Xoce, Dewleta Karakoyûnî damezirandiye. Di vê damezirandinê de bandor û yekîtiya begên kurdan roleke mezin dilîze. Hema bêje, dibe desthilatê tevahiya Kurdistanê. Piştî Bayram Xoce dimire, li cihê wî, kurê wî Kara Mihemed dibe paşa. Di vê demê de êrîşên Tîmûr dest pê dikin û gefan li Kurdistan û Anatolyayê dixwe. Kara Mihemedê ku bi Tîmûr re şerên dijwar û berfireh dike, dagirkirina Kurdistanê ya ji aliyê Tîmûr ve asteng dike. Piştî mirina Kara Mihemed, Kara Yûsifê ku dikeve cihê wî, nikare artêşa Tîmûr rawestîne û di sala 1400'î de tevahiya Kurdistan û Anatolyayê stuyê xwe li ber dagirkeriya Tîmûr ditewîne.











## DEWLETA AKKOYÛNIYAN

Ev dewlet, ji aliyê Kara Osman Beg ve hatiye avakirin. Di serdema Moxolan de ji Xorasanê çûne Azerbeycanê, piştre jî li derdorên Amed û Xarpûtê bi cih bûne. Koçeriya xwe di van xakan de berdewam kirine. Alîkariyê bi Împaratoriya Tîmûr re dikin. Di şerê Enqereyê de ku Tîmûr bi Osmaniyan re kiriye, weke alîgirê Tîmûr şer dikin. Ji ber van alîkariyan, Tîmûr Amed û derdorên wê dide Kara Osman Beg. Heta sala 1435'an girêdayî Dewleta Tîmûr dimînin. Paytexta Dewleta Akoyûnî, Amed e. Piştî Kara Osman Beg dimire, di nava dewletê de tevlîhevî dest pê dikin. Di nava Şêxzadeyan de şerê desthilatdariyê dest pê dike. Di sala 1452'yan de Ûzûn Hesen, vî şerî qezenc dike. Dema herî bi hêz a Dewleta Akoyûnî, dema Ûzûn Hesen e. Di sala 1469'an de dewleta Karakoyûnî dirûxîne. Dewleta Akoyûnî tevahî Kurdistan, Îran û beşeke Anatolyayê dixe bin destên xwe. Bi destê Ûzûn Hesen, Akoyûniyên ku sînoran berfireh dikin, bi Osmaniyan re têkoşîna desthilatdariyê dimeşînin. Ûzûn Hesen yekemîn şerê xwe yê bi Osmaniyan re di sala 1473'yan de li Meletiyê dike. Vî şerî qezenc dike. Lê di sala 1474'an de şerê li Otlûkbelî yê bi Osmaniyan re kiriye, winda dike û dewleta Akoyûnî binketineke giran dijî. Piştî Ûzûn Hesen dimire, di nava kurên wî de şerê textê dest pê dike. Di sala 1500'î de Dewleta Akoyûnî dibe du parçe. Di encama vê parçebûn û têkoşîna navxweyî de, dewlet têra xwe lewaz dibe. Dewleta Akoyûnî ji aliyê Şah Îsmaîlê Sefewî ve di sala 1508'an de tê rûxandin.




Dewleta Akkoyûniyan

## DAGIRKERIYA ÎMPARATORIYA TÎMÛR




Ew dewlet, a Barlasiyên ku yek ji qebîleyên Moxolan tê de desthilatdar in. Di sala 1365'an de ji aliyê Tîmûr ve hatiye avakirin. Damezrînerê dewleta Çaxatay, Tîmûr e. Ji ber ku lingê wî seqet e, jê re Tîmûrleng tê gotin. Tîmûr, ji bo dubare avakirina Dewleta Moxol, xebitiye. Ji ber ku ne ji nijadê Çaxatay hatiye, kesekî ku ji nijadê Çaxatay hatiye, dike pêşeng. Lê paşayê bingehîn ê dewletê, ew bi xwe ye. Di sala 1405'an de ta ku miriye, xebitiye ku dewletê mezin bike. Sînorên dewletê, ji Hîndistanê ta Derya Egeyê berfireh dike. Di sala 1401'ê de bi binxistina dewleta Karakoyûnî re Kurdistanê dagir dike. Di nava vê salê de bajarên weke: Amed, Wan, Kermanşah, Sine û Zaxoyê dixe bin destên xwe û qirkirineke mezin pêk tîne. Di serê sala 1402'yan de bajarê Sêwasê dagir dike û çi qas mirov tê de hebûn, hemûyan bi saxî bin ax dike. Kurdistan, ji nû ve bi seranserî tê şewitandin, hilweşandin û talankirin. Tîmûr di sala 1402'yan de li Enqereyê bi Osmaniyan re şer dike û di wî şerî de bi ser dikeve. Piştî vî şerî, tevahiya Anatolyayê dixe bin destên xwe. Dewleta Tîmûr, di sala 1507'an de ji aliyê paşayê Ozbek ve tê hilweşandin.









## Pirsên Nirxandinê:

1- Rola Kurdan a di damezrandina Dewleta Karakoyuniyan de, çi bû?

2- Dema dewleta Îlxanî parçe dibe, kîjan dewlet li cihê wê ava dibin?

3- Dema ku Tîmûrleng Kurdistanê dagir dike, li wê derê çi dike?

4- Bersiva rast hilbijêre.

- Paytexta Dewleta Akoyûniyan bajarê
  A) Wan bû B) Amed bû C) Enqera bû.

- Damezrînerê Dewleta Akoyûnî
  A) Kara Osman e B) Kara Mihemed e C) Ûzûn Hesen e.

- Yê ku Dewleta Akoyûnî di sala 1508'an de dirûxîne
  A) Tîmûr e B) Cengîzxan e C) Şah Îsmaîl e.

## PIRSÊN NIRXANDINA BEŞÊ

1. Di dema Selçûqiyan de têkiliyên kurd û tirkan çawa bûn? Lêkolîn bike.
2. Kîjan peyman di dema Selçûqiyan de, di navbera kurd û tirkan de çêbûn û armanca van peymanan çi bû?
3. Şerê Melazgirê, di navbera kîjan hêzan de pêk hat û di encama vî şerî de çi guhertin çêbûn?
4. Di şerê Melazgirê de rola kurdan çi bû, çi encam girtin?
5. Di dema Melikşah de têkiliyên kurd û tirkan çawa bûn? Lêkolîn bike.
6. Di serdema Xerzemşahan de rewşa kurdan çawa bû?
7. Împaratoriya Selçûqiyan kengî û di bin rêvebiriya kê de pêk hat?
8. Sînorên Împaratoriya Selçuqiyan destnîşan bike, heya kîjan herêman berfireh bûne?
9. Împaratoriya Moxolan kengî û di bin desthilatdariya kê de pêş ketiye?
10. Di dema Moxolan de rewşa Kurdistanê çawa bû? Lêkolîn bike.
11. Dewleta Karakoyûniyan kengî, di bin desthilatdariya kê de û li kîjan herêman belav bûye?
12. Dewlata Akoyûniyan kengî û li kîjan herêman belav bûye?
13. Dagirkeriya împaratoriya Tîmûr bandoreke çawa li Kurdistanê kiriye?
14. Împaratoriya Tîmûr, kengî û li kîjan herêman pêş ket?






# BEŞA 4

## PÊŞKETIN Û BERFIREHBÛNA OSMANIYAN

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1) Di navbera salên 1500-1800'î de rewşa eşîrên kurdan, çawa bû? Lêkolîn bike.
2) Gelo, di dema Împaratoriya Osmaniyan de rewşa Kurdistanê çawa bû? Lêkolîn bike.
3) Di dema Osmaniyan de peymanên kurdan ên bi wan re çêbûne, lêkolîn bike û armanca van peymanan çi bû?
4) Bi awayekî giştî, rewşa civaka kurd a di dema Osmaniyan de çawa bû? Lêkolîn bike.
5) Gelo armanca dagirkerên herêmê, di vê demê de li ser Kurdistanê çi ye? Lêkolîn bike.
6) Rewşa yekîtiya kurdan di wê pêvajoyê de çawa bû? Lêkolîn bike.

# PÊŞKETIN Û BELAVBÛNA ÎMPARATORIYA OSMANIYAN

Piştî şerê Melazgirê, Tirk li Anatolyayê bi şêweyê mîrektiyan dest bi cîhbûn û belavbûnê dikin. Her mîrekiyek li ser axa xwe rêveberiyekê saz dike. Yek ji van a ku navê xwe ji pêşkêşê xwe Osman Beg digire, ya bi navê Xanedana Osmaniyan bû. Piştî mîrekiya Osmanî li Anatolyayê bi cih bû, ber bi axên komên ku koka wan Yewnan û mîrtiyên ku koka wan tirk ve berfireh bû û şerê belavbûyînê bi rê ve birin. Osmaniyên ku li navçeya Sogut a Bûrsayê bi cih bûne, di demeke kin de qebîle û eşîrên derdorên xwe xistin bin desthilatdariya xwe û bûn dewlet.

## Sazbûna Mîrekiya Osmaniyan


Osman Gazî

Li beramberî êrîşên Moxolan ên ku zêde dibin, mîrekiya di bin rêveberiya Şah Silêman de, di sala 1224'an de bi şêniyekî ji 50 hezarî pêk tê, di ser Xorasanê re tên Anatolyayê. Piştî heft salan dema ku dixwazin vegerin, Silêman Şah di çemê Feratê de difetise û nîvê qebîleya wî şûn de vedigere. Nîvî jî di bin rêveberiya Ertûxrûl Gazî de dimînin û ber bi naverasta Anatolyayê ve pêş ketin. Ertûxrûlê ku li beramberî Moxolan, alîkarî dida dewleta Selçûqiyan, piştî şer dikeve bin parastina Eladîn Keykûbadê sêyem de. Ew, li Sogut û Domaniçê ku ji aliyê Eladîn Keykûbad ve xelat girtin, bi cih bûn. Ev mîrekî, di dema Ertûxrûl de dest bi belavbûnekê dike. Di







dema kurê wî yê mezin yê bi navê Osman (yê ku Osmanî li ser wî bi nav bûne) de, ev belavbûn bi lez pêk tê.

Osmaniyên ku bi şêweyê mîrekî girêdayî Selçuqiyan in, di sala 1299'an de piştî şkestina Eledîn Keykûbadê Sêyemîn, serxwebûna xwe radigihînin. Damezrandina mîrekiya ku piştre wê bigihêje rewşa împaratoriyê jî, di vê dîrokê de dest pê dike. Belavbûn û pêşketin, piştî vê dîrokê bilez berdewam dike. Dewletbûyîna di 1326'an de ji aliyê Orhan Gaziyê kurê Osman Beg ve tê temamkirin. Bûrsa, dibe paytext. Orhan Beg, bi pêkanîna du zewacên ramyarî, dikare hêza pêşîlêgirtina belavbûna Bîzansiyan birêxistin bike.

## Dewletbûyîna Osmaniyan

Di dema Orhan Beg de, gavên destpêkê yên dewletbûyînê hatin avêtin. Piştî dimire, Muradê Yekemîn dikeve cihê wî. Ew jî axa xwe û qadên ku dixe bin desthilatdariya xwe, berfireh dike. Edîrneyê bi dest dixe û dike paytext. Bi armanca astengkirina vê belavbûnê ji aliyê Papa Ûrbanûsê Pêncemîn ve artêşeke bi Xaç tê damezrandin. Lê, ew bi ser nakevin. Artêşa Osmaniyan heya Makedonya, Uskup, Saray Bosna û Sirbistanê belav dibe. Mûradê Yekemîn di şerê Kosova yê yekemîn de tê kuştin. Di vê pêvajoyê de pêngavên dewletbûyînê, ber bi temambûnê ve diçe. Mîrektiya Osmaniyan, vegeriyaye dewletê. Artêşa Yenîçerî ya di dewletbûyîna Osmaniyan de rola diyarker dilîze, di vê pêvajoyê de tê damezrandin. Ji ber ku di vê qada berfirehbûyî de rêvebirina navendî tengav dibe, pergala herêmî tê damezrandin. Mûradê Yekemîn li cihê rêgeza "Dewlet, malê hevpar ê rayedar û xizanên wê ye"; rêgeza "Dewlet, malê hevbeş ê rayedar û kurên wî ye" bi cih dike û di vê derê de guhertineke girîng pêk tîne. Bi vê guhertinê re pêşî li parçebûna desthilatdariyê û


Orhan Beg


Yildirim Beyazît

pevçûnên cuda digire. Yildirim Beyazîtê ku kurê Mûradê Yekemîn e, diçe cihê wî û êrîşên ber bi mîrektiyên tirkmenan ve pêk tîne. Hemûyan ji holê radike û axa wan bi dest dixe. Sînorên dewletê, heya çemê Feratê berfireh dibe.

## Dewrê Fetret (1402-1413)


Sultan Mihmedê Duyem

Dema ku Yildirim Beyazît, hemû mîrektiyên Anatolyayê ji holê rakirin, yekîtiyeke ramyarî pêk hat, lê li gel wê pirsgirêk jî pêş ketin. Artêşa Moxol a di bin fermandariya Tîmûr de jî, li Anatolyayê bû. Ew mîrektiyên ku axa wan ji dest diçin, xwe dispêrin Tîmûr. Di navbera artêşên Yildirim Beyazît û Tîmûr de şerê Enqereyê pêş dikeve. Artêşa Osmanî şikestineke mezin dijî û encamên şer jî giran dibin. Yekîtiyên ramyarî yên Anatolyayê ku di bin desthilatdariya Osmaniyan de bi zorê pêk hatine, parçe dibin. Di Osmaniyan de şerê textê pêş dikeve. Di navbera zarokên Yildirim Beyazît de di salên 1402-1413'yan de şerên textê pêş dikevin. Di dawiyê de Mihemed Çelebî birayên xwe jî dikuje û ji nû ve yekîtiya Osmaniyan çêdike. Ew pêvajoyeke navber a pêşketin û belavbûna rawestiyayî bû. Ji ber vê yekê, ew weke Dewrê Fetret tê binavkirin.

Mihemed Çelebî (Mihemedê Yekem) mîrektiyên ku li Anatolyayê serî hildabûn, ji nû ve dixe bin desthilatdariya Osmaniyan. Qadên tevahiya Trakya, Sirbistan, Eflaq û hwd. digire. Ber bi Macaristanê ve tev digere û dixe bin dest-hilatdariya xwe. Serhildana ku ji aliyê Şêx Bedredînê Qaziyê Sîmavna ve pêş ketiye, diperçiqîne. Komkujiyeke mezin, li ser







serhildêran pêk tîne. Şêx Bedredîn tê girtin û bi şêweyekî hovane tê kuştin. Ji ber ku wî di pêvajoya desthilatdariya xwe ya demkurt de Dewrî Fetret bi dawî aniye û yekîtiya ramyarî ya dewletê ji nû ve pêk aniye. Tirk Mihemedê Yekem, weke duyem damezrînerê dewleta Osmaniyan dipejirînin. Mûradê Duyem ê ku dikeve cihê Mihemed Çelebî jî, tevger û belavbûna xwe berdewam dike. Lê, li beramberî Qraltiya Macaran şikestineke giran dijî. Her wiha, li beramberî şerên ku ji aliyê serhildêrên Arnawûtan ên ku bi rêbazên çetewarî dihatin kirin windahiyên giran dide. Axa wan ji dest diçe û heya Trakyayê bi şûn de diçin. Rewşên weke vê, li Anatolyayê jî tên jiyîn. Lê Mûradê Duyem ji nû ve xwe kom dike, dubare beşeke girîng a axên ji dest çûye, dagir dike. Desthilatdariyeke ku ji împaratoriyê re amade ye, bi cih dihêle.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Osmanî, çawa bûn dewlet?

2- Mîrektiya ku di bin rêveberiya Şah Silêman de ye, ji ber kîjan sedemê, ber bi Anatolyayê ve koçber dibe?

3- Dawiya Silêman Şah, çawa bû û rewşa qebîleya wî çawa bû?

4- Hevokên rast bi tîpa (R), yên şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bike.

- Orhan Beg, Edîrneyê dike paytext. ( )
- Yildirim Beyazît, alîkariyê dide dewleta Selçûqiyan. ( )
- Belavbûna Osmaniyan, di dema Osman de kêm dibe.( )
- Mihemed Çelebî, birayên xwe dikuje. ( )

## Dema Împaratoriyê

Dema Mûradê Duyemîn di sala 1451’an de dimire Mihmedê Duyemîn ê kurê wî diçe ser text. Karê destpêkê yê wî dorpêçkirin û girtina Îstanbolê ye ku gelek caran hatibû dorpêçkirin, lê nehatibû girtin. Ev desteserkirin, serdemeke nû dide destpêkirin. Bi vê Mihmedê Duyemîn berjengê Fatîh Sultan Mihmed digire. Bi vê re jî, ji bo Ewrûpa û Osmaniyan pêşketinên pir girîng dest pê dikin. Împaratoriya Osmaniyan hêza pêşketin û belavbûyînê qezenc dike. Dawî li hebûna dewleta Pontos Rom a navenda wê li Trabzonê ye tîne.




Fatîh Sultan Mihemed, dixwaze Împaratoriyê ber bi Ewrûpayê ve berfireh bike, ji ber wê her tim berê wî li rojava bû. Daxwaza wî ew bû ku li ser axa ji başûrê çemê Tûna, heya rojavayê çemê Ferat împaratoriyeke navendî saz bike. Bi vê daxwazê tev digeriya. Qadên ku kiribû armanc bi dest xwe dixe û qadek heya wê demê a herî berfireh dixe destê xwe. Fatîh Sultan Mihemed fermanên bi navê wî têne nasîn, pêş dixe. Ji van fermanên ku dewletê di ser her tiştî re dibîne ya herî girîng, ji bo







parastin û pêşketina dewletê, dîtina erkê kuştina bira bû. Padîşahên ku piştî wî bên ser text karê destpêkê hemû birayên xwe yên şehzade dikujin. Hindek ji şehzadeyên nayên kuştin dixin zindanan û dema warisên împarator peyda dibe tên kuştin. Ev ferman e, heya destpêka sedsala 19'an hatiye pêk anîn. Dema Fatîh Mihemed di 1481an de dimire, Beyazîdê Duyemîn (Sofî Beyazîd) dikeve cihê wî. Ew berevajiyê bavê xwe berê xwe dide rojhilat. Ew gihîştibûn sînorên herî berfireh ên karîne bigihinê yên Ewrûpayê. Beyazîdê Duyemîn axên nû yên piraniya wê li rojhilat bûn, tevlî împaratoriyê dike. Ev berfirehbûn rê li ber pirsgirêkên nû vedike. Di navbera Memlûkî û Osmaniyan de bi ser mîrektiyên girêdayî wan re şer û pevçûn jiyane. Di encama van şeran de Çûkûrova, Edene û Tarsos ketin bin desthilatdariya Osmaniyan. Di vê pêvajoyê de dewleta Sefewî ya Îranê ya di bin rêveberiya Şah Îsmaîl de hêzeke mezin digire û derdikeve ser dika dîrokê. Dadikeve heya peravên çemên Ferat û Dicle. Amed û derdora wê bi dest xwe dixin, çav didin axên di bin desthilatdariya Osmanî û Memlûkiyan de. Êrîşan dibin ser mîrektiyên Dûlkadîroglû yên girêdayî Osmaniyan. Bi vê êrîşê berteka her du hêzan dipîve. Ev pêşketin dibe destpêka şerên di demên pêş de pêk bên.

## Belavbûna Osmaniyan a Rojhilat û Bidestxistina Efrîqaya Bakûr

Selîmê 1. (Yawûz Sultan Selîm) bavê xwe Beyazîdê 2. ji text tîne xwar û dikeve cihê wî. Dest bi şerên belavbûna ber bi rojhilat ve dike. Di 1514'an de li Çaldiranê Sefewiyan dişkîne. Amed û derdora wê bi navbeynkariya Idrîsê Bedlîsî bê şer bi xwe ve girê dide. Bi vî awayî, Selîmê 1. hêza şerker a Kurdan



Yawûz Sultan Selîm



Qanûnî Sultan Suleyman

digire gel xwe û axa Kurdistanê jî digire û sînorên rojhilat dixe bin ewlekariyê. Piştre, bi şerê li gel Memlûkiyên Misr havîna 1516'an de Dîlok, Besnî û derdora wê bi dest dixe. Di 1516'an de şerê Mercdabiq di 1517'an de şerê Rêdaniyê qezenc dike û dawî li hebûna Memlûkiyên Misr tîne. Bi vî awayî dest datîne ser hemû heyînên pîroz ên îslamê û wan tîne paytexta Osmaniyan. Xwe weke xelîfe radigihîne. Împaratorê Osmaniyan bi xîlafetiya ku xistî destê xwe komên îslamî yên din jî, bi xwe ve girê dide û dixwaze wan weke amûra belavbûyînê bi kar bîne. Beşeke mezin a Kurdistan, Sûriye, Iraq û Misrê dagir dike. Di pêvajoya demkurt a heşt salan de ji aliyê Yawûz Sultan Selîm ve Împaratoriya Osmaniyan li sê parzemînan belav dibe împaratorî qateke din mezin dibe û digihêje sînorên xwe yên berfirehbûyînê. Ev ji bo Împaratoriya Osmaniyan xeta dawiyê ye. Di 1520'î de Selîmê 1. dimire û Kanûnî Sultan Suleymanê kurê wî dikeve cihê wî. Ew jî heya Cezayîr, Erebistan û navenda Ewrûpayê pêş dikeve. Vîyaneyê dorpêç dike. Piraniya giravên Derya Spî, dixe bin desthilatdariya xwe. Li gel mirina Kanûnî Împaretoriya Osmanî dikeve pêvajoya sekinandinê.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Dema ku Mihemedê Duyemîn tê ser text, çi dike?

2- Fermanên ku Fatîh Sultan Mihemed pêş xistin, çi bûn?

3- Dema Yawûz Selîm, bavê xwe ji text dadixe, çi dike?

4- Cihên vala, bi peyvên guncaw dagire.

Di 1520'î de ……………….. dimire û …………… Sultan ……………… kurê wî tê cihê wî. Ew jî, heya Cezayîr, ……………… û navenda …………… ve pêş dikeve. ……………. dorpêç dike. Piraniya giravên Derya Spî dixe bin desthilatdariya xwe. Li gel mirina Kanûnî, Împaratoriya Osmanî dikeve pêvajoya ……………..... .






# TÊKILIYA KURD, OSMANÎ Û SEFEWIYAN

## 1- Di Navbera Salên 1500-1800'î de Rewşa Kurd û Osmaniyan



Kurdistan

Çînên serdest ên kurdan bi giştî bi serdema Yawûz re, bi Osmaniyan re di nava xweseriyeke berfireh de ne û bûne yên ku herî zêde piştgiriyê didin wan. Ev rewşa ku heta destpêka sedsala 19. berdewam kiriye, piştî ku mêtingeriya rojava ji sedsala 19. û şûnde gavên xwe yên yekem avêtiye herêmê, xerab bûye. Li vir polîtîkaya rêveberiya navendî ya lewaz ketiye, ya li ser berhevkirina baceke zêde û leşkeran jî diyarker bûye û bi vê re jî, dostanî û piştevaniyê cihê xwe ji serhildanan re hiştiye.

Polîtîkayên ku di vê serdemê de li Kurdistanê hatine meşandin, wiha ne. Gelê kurd, bi riya cudakariya elewî-sunî, şafî-henîfî, neqşî-qadirî, parçe kirine. Bi Peymana Qesrî Şirîn a di sala 1639'an de ji aliyê erdnîgarî ve parçe kirin. Nakokiyên navxweyî û dijbertiya eşîrtî kûr kirin û nehiştin ku nasnameya neteweyî bi dest bixin. Ev polîtîka, bi plansaziyên etnîk ên li gorî berjewendiyên serdestên biyanî û began bi kûrahî dihat birêvebirin. Pirsgirêkên ku di encama vê polîtîkayê de derketin holê, bi sed salan berdewam kirin, lewma jî cihê xwe girtin. Di

jiyana gelê kurd de, îro jî polîtîkayên bi vî awayî heta astekê berdewam dikin.


Çarçoveya bingehîn a têkiliya Osmaniyan a bi begên kurdan re, bi vê peymanê diyar bûye. Encamên wê yên erênî yên li ser civakê, ev in: Derfeta pêşketina çandî bi dest xistin, nehatin surgunkirin, rastî zext, tundî û komkujiyên fîzîkî nehatin. Lê di vê serdemê de çend tiştên neyînî jî hene. Mînak began di nava xwe de şerên eşîrtî kirin, di şûna yekîtiyê de ji hev dûr bûn, ji nirxên sade (otantîk) ên gel re biyanî bûn, paşeroja xwe destpêkê spartin farisan, piştre ereban, dawiyê jî tirkên oxûzan. Pirsgirêkên ku vê serdemê ji aliyê civakî, çandî û ramyarî ve di civaka kurd de ava kirin jî, bi kurtasî şewqa xwe dane destana Mem û Zîn a Ehmedê Xanî. Li gel her tiştî, serdema 1500-1800'î bûye pêvajoya sêsedsalî ya ku begên kurd ji rewşa xwe razî bûne ye.



Împaratoriya Osmanî

## 2- Nakokî û Pevçûnên di Navbera Osmanî û Sefewiyan de

Ger ku em li têkiliyên dewleta Sefewiyan a di sala 1501'ê de ava bûye, yên bi dewleta Osmaniyan a 250 salî binêrin, Dewleta Sefewiyan di sedsala 16'an de ji aliyê Şah Îsmaîl ve tê avakirin. Rojhilatê Anatolyayê, Azerbaycan û Rojavayê Îranê digire nav xwe û piştre ber bi Xorasanê ve berfireh dibe. Navê xwe, ji navê damezrînerê terîqetê Şêx Safiyûdîn digire. Di serdemên Beyazîtê 2. ê ku


Şah Îsmaîlê Sefewî







bergiriyên Sefewiyan bike de, astengiyan dibîne. Di serdemên Yawûz Sultan Selîm û Kanûnî de û piştî Kanûnî, Osmaniyan dest bi paşketinê kirine. Piştî Kanûnî, Sefewiyan bi qismî xwe dane aliyekî, lê êrîşên li hemberî sînor û propagandayên şîatiyê berdewam kirine. Bi lewazbûna dewleta Osmanî ya hêdî hêdî re û ji ber şerên ku di gelek eniyan de dimeşand, di têkiliyên bi Sefewiyan re, astengiyên Osmaniyan dest pê kirine. Di serdema Mûradê 4. de jî, di êrîşên Bexda û Rewanê de dewleta Osmaniyan bi ser ketin û derbeyeke mezin li Sefewiyan xistin. Hikumdarê Sefewiyan Şah Îsmaîl, ji desthilatdariya Osmaniyan a li Anatolyayê aciz bû. Tirkmen û rêberên wan, xwe nêzîkî dewleta Sefewiyan dikirin. Ji ber vê yekê jî, Şah Îsmaîl polîtîkaya parastina wan dimeşand. Yawûz Sultan Selîm jî, ne li Ewrûpayê, lê li rojhilat ji xwe re li dijberan digeriya û du dewlet ji xwe re kirin armanc. Ev, Sefewî û Memlûkî bûn. Yawûz Sultan Selîm, vê polîtîkaya Sefewiyan qebûl nake û di navbera her du dewletan de şer bû tiştekî jêveneger.

### 3- Di Serdema Yawûz Selîm de Têkiliyên bi Mîrekên Kurdan re


Yawûz Sultan Selîm

Ji bo fêmkirina dîroka bi hev re jiyîna kurd û tirkan a li Rojhilata Navîn, pêwîst dike di destpêkê de sedsala 16'an serdema Yawûz Sultan Selîm were nirxandin. Ji bo Yawûz Sultan Selîmê ku sînorên dewleta Osmanî li Rojhilata Navîn ber bi Rojhilat ve berfirehtir dikir, ji bo wî xeteriya herî mezin, Sefewî bûn. Serokê wan Şah Îsmaîl li Anatolyayê îsyan birêxistin dikirin û bi vî awayî, di vî warî de gefek ji bo Osmaniyan diafirand. Di şerê Çaldiranê yê 1514'an de Yawûz Sultan Selîm ziyana ku ji Sefewiyan dihat, bi tevahî ber alî kir. Serokê

eşîrên sunî, kurd û tirkmenên ji Sefewiyan nexweş bûbûn, di vî şerî de artêşa Osmanî destek kirin. Şah Îsmaîl, siyaseteke pir hişk li dijî kurdan pêk tanî. Lê belê, Yawûz Sultan Selîm, dijberî Şah Îsmaîl bi mîrekên kurdan re di nava rêbazên piştgirî û lihevkirinê de bû. Ji ber ku di wê serdemê de ji bilî têkiliyeke baş a bi kurdan re nikarîbû her çi rêbazeke din bi rê ve bibe. Osmaniyan dixwestin kurdan li dijî Sefewiyên ku ji Rojhilat ve mezintir dibûn, bi kar bînin.

Siyaseta Yawûz Sultan, Selîmê ku bi hevkariya feodalên kurdan re ku bi zanabûn ev yek pêk tanî û heta asteke bilind bi awayekî hevkarî bi wan re tev digeriya, bû sedem ku ev siyaset heta sedsala 19. bimeşe.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Polîtîkayên ku Osmaniyan di salên 1500-1800'î de li Kurdistanê meşandine, çi bûn?

2- Dewleta Sefewî, kengê tê avakirin û navê xwe ji ku digire?

3- Sedemên astengiyên Osmaniyan ên di têkiliyên bi Sefewiyan re, çi bûn?

4- Têkiliya Yawûz Selîm a bi mîrên kurdan re, çawa bû?

5- Bersiva rast, hilbijêre.

- Çînên serdest ên kurdan piştgiriyê didin
  A) Sefewiyan B) Osmaniyan C) Şah Îsmaîl

- Têkiliya Şah Îsmaîl a bi mîrên kurdan re
  A) Hişk bû B) Nerm bû C) Xweş bû

- Ji bo Yawûz Selîm, xeteriya herî mezin
  A) Holako bû B) Tîmûrleng bû C) Sefewî bûn






## TÊKILIYÊN KURD Û SEFEWIYAN

Dewleta Sefewî, li ser axa Îranê hatiye damezrandin. Di dîrokê de Sefewî weke faris tên nasîn. Li gorî mezheba şîatiyê hatiye avakirin. Beriya Sefewiyan, em li têkiliyên kurd û farisan mêze bikin. Kurd û faris, ji gelên Aryen in. Çand û zimanê van her du gelan, gelek nêzî hev in. Dibe ku demeke dirêj weke heman qebîle û du klanan jiyane. Heta rûxandina dewleta Medan, di dîrokê de zêde hebûna farisan tuneye. Bi Persan re derketin ser dika dîrokê. Lê belê, rûxandina Medan û hatina Persan a li ser desthilatdariyê tenê guherîna xanedaniyê ye. Bandora Medan, ji her aliyî ve li ser Persan zêde ye.




Dewleta Sefewî

Dîrokzanên Yewnan, di şerên Yewnan de nedigotin împaratoriya Pers, digotin Med. Jixwe di vê împaratoriyê de cu-

dahiya her du gelan tuneye. Lê belê, di vê pêvajoyê de rahîbên Zerdeştî, ji bo ku careke din desthiladariyê bixin destên xwe, raperînan dikin. Ev raperîn, hatine çewisandin. Piştî Persan, di pêvajoya xanedaniya Part de jî, ev jiyana hevpar û têkilî weke xwe berdewam dikin. Di pêvajoya xanedaniya part de giranî û bandora kurdan zêdetir e. Ta ku hin dîrokzan xanedaniya part weke xanedaniya kurd dipejirînin. Têkiliyên kurd û farisan ên jihevdûrketinê di dema sasaniyan de çêbûne. Ev jihevdûrketin, bi taybetî di beşên jor de hatiye jiyîn û piştre di nava gelan de hatiye belavkirin. Di têkoşîna desthilatdariyê ya bi Bîzansan re Sasaniyan Kurdistan weke herêmeke tampon bi kar anîne. Zerdeştî xistine nava polîtîkayên dewletê yên fermî. Ev polîtîka, bûye sedema xerabiya li ser kurdan.

Di encama vê rewşê de Zerdeştî ji cewherê xwe hatiye derxistin. Li hemberî vê yekê, derketina Mazdek û berdewamiya wî Huremî bi giranî kurd jî tevlî van têkoşîn û tevgeran bûne. Dema ku ev raperîn tên çewisandin, kurd ji ber vê yekê êşên mezin dibînin. Di vê pêvajoyê de têkiliyên her du gelan berdewam dikin. Lê belê, çînên serdest ji hev dûr ketine. Ji bo ku gel jî ji hev bên dûrxistin, dest bi polîtîkayan kirine. Bi ketina îslamê ya Kurdistan û Îranê re di aliyê baweriyê de jî her du gel cuda bûne. Sefewî, vê cudahiya mezhebî dikin polîtîkaya dewletê. Li hemberî kurdên ku ne şîa ne, tund nêz bûne. Vê yekê, qutbûneke din a kurdan bi xwe re kûr kiriye. Begên kurdan ji bo lihevkirinê çûn gel dewleta Sefewî. Lê belê, begên kurdan biçûk xistin û ew girtin, avêtin zîndanê. Li ser vê yekê, piraniya kurdan bi Osmaniyan re lihevkirin çêkirin. Ji vir û şûn de serdestên kurd, bi serdestên farisan re lihevkirin, çênekirine. Lê belê, gelên faris û kurd her dem bi hev re bûn. Her du gel, ji her aliyî ve ji heman çavkaniyê tên. Ji ber vê yekê, kurd û faris her dem nêzî hev sekinîne. Bi demê re hin guhertin çêbûbin jî dîsa di ziman, çand û jiyana civakî de gelek nêzî hev in. Di dîrokê de kurd û farisan, li hemberî serdestan di aliyê raperîn û têkoşînê de her dem alîkarî dane hev.






# Pirsên Nirxandinê:

1- Di dîrokê de Têkiliyên Kurd û Farisan, çawa bûn?

2- Têkiliyên kurd û farisan ên jihevkirinê, kengê û çawa dest pê dikin?


3- Bi hatina îslame re, rewşa kurd û sefewiyan, çawa dibe?

4- Dewleta Sefewî, çawa nêzî lihevkirina bi mîrên kurdan re dibe?

5- Cihên vala, bi peyvên guncaw dagire.

Kurd û faris ji her aliyî ve ji heman .................... tên. Ji ber vê yekê, kurd û faris her dem ............... hev sekinîne. Bi demê re hin .................... çêbûbin jî, dîsa di ziman, çand û jiyana ............. de gelek nêzî hev in. Di dîrokê de kurd û farisan, li hemberî .................... di aliyê raperîn û têkoşînê de her dem .................. dane hev.

## ROLA IDRÎSÊ BEDLÎSÎ Û PEYMANÊN KU KURDAN BI OSMANIYAN RE ÇÊKIRINE


Idrîsê Bedlîsî

Idrîsê Bedlîsî kurdekî ji Colemêrgê ye û xwendina xwe ya bilind li Îranê temam kiriye. Li gel zimanê kurdî, erebî, farisî û tirkî jî dizane. Wê demê paytexta tirkmenên Akoyûniyan, Amed bû. Idrîsê Bedlîsî, demeke dirêj di qesrên Ûzûn Hesen de weke mamostayê zarokên wî dixebite. Dema Şah Îsmaîl, Tebrîz dagir kir û dewleta Akoyûnî hilweşand, Idrîsê Bedlîsî jî diçe Stenbolê û bi Beyazîtê 2. re rûdine. Beyazîtê 2. Idrîsê Bedlîsî weke dîroknivîs di qesra Osmaniyan de erkdar dike. Bedlîsî jiyana her heşt padîşahên destpêkê yên Osmaniyan, di bin navê **‘Heşt Bihiştan’** nivîsî. Tişta ku di Heşt Bihiştan de behs kiriye, pesindana Osmaniyan e ku wan qata heştemîn a cinetê heq kiriye.

Piştî ku Yawûz Selîm dibe desthilatdar, Idrîsê Bedlîsî dibe şêwirmendê ramyariya Rojhilat ê Sultan. Li gel Yawûz beşdarî êrîşa Çaldiranê bû, piştî Tebrîz ket bin hikumdariya Osmaniyan, ew li wir demekê ma û li mizgefta Mezin şîretan li gelê derdorê dike. Di sala 1516’an de derket holê ku Şah Îsmaîl di nava amadekariyên dagirkirina Rojhilat û Kurdistanê de ye. Şah, Karahanê birayê fermandar Mihemed Xanê ku di şerê Çaldiranê de hatiye kuştin, dîsa şand Anatolyayê. Vî fermandarî Amed û derdorên wê dorpêç kir.






Di destpêkê de begên kurdan bi dewleta Sefewî re zêdetir di nava têkiliyan de bûn. Di dema 20 begên kurdan de diçin qesra Sefewiyan û xwestin girêdana xwe ya bi Şah re bînin ziman, lê piştre ji hêla Sefewiyan ve hatin girtin û li şûna wan hin fermandarên din hatin erkdarkirin, ev yek jî bû sedem ku têkiliyên di navbera kurd û Şah Îsmaîl de xerab bibin. Şah jî, ji began xwest ku bê bendewariyekê girêdayî Sefewiyan bibin. Vê yekê, di nava begên kurdan de bê bawerî û nerihetiyeke mezin çêkir.

Şah Îsmaîl li rojhilatê Anatolyayê li herêmên ku dagir kiribû, begên kurdan avêtibûn zindanê. Di vê rewşê de ji ber ku eşîrên kurdan sunî bûn û ji çandeke baweriya sunîbûnê ya bihêz dihatin, her wiha di nava kurdan de bicihbûneke mezin a di nava xelîfetiya Ebasiyan de hebû, eşîrên kurdan xwe spartin Osmaniyan. Hin begên kurdan ên derketibûn êrîşê, di civata Yawûz Sultan Selîm de diyar kirin ku welatê wan ji hêla Şah Îsmaîl ve hatiye dagirkirin û alîkariya li dijî Şah Îsmaîl xwestin. Ji ber vê yekê, gelek eşîrên kurdan di şerê Çaldiranê de mil bi mil, bi Yawûz Sultan Selîm re li dijî Şah Îsmaîl ketin nava şer. Di wê demê de rûspiyên kurdan, bangên yekîtiyê kirin. Desthilatdarên Amêdiyê, begên Heskîf, Bedlîs û Colemêrgê hin mînakên vê ne. Ev cara yekem bû ku hevkariyeke bi vî awayî di nava begên kurdan de pêk hat.

Di wan salan de bi rêbertiya Şah Îsmaîl re li Sêwasê jî bi begên kurdan re hevkariyek hatibû bidestxistin.Di sala 1509’an de Amed jî ketibû bin destê wan. Her wiha, gelek bajarên Kurdistanê hatibûn desteserkirin.

Di vê pêvajoyê de Idrîsê Bedlîsî jî tevlî van civînan bûbû. Idrîsê Bedlîsî wê demê, mamoste û nivîskarekî ku di qesra Yawûz Sultan Selîm de dima û kar dikir. Di civînê de yekîtiyeke mezin pêk anîbû û girêdana xwe ya bi Osmaniyan re, ya li dijî Sefewiyan bi nameyekê radigihîne. Navê hemû begên beşdar, li ser wê nameyê tên nivîsîn.

Yawûz Sultan Selîm jî bi awayekî rêzdar bersiva wê nameyê dide. Yawûz, daxwaza wê yekê dike ku kurd ji nava xwe mîrtiyeke berfireh ava bikin. Daxwaz dike ku kurd di nava xwe de begê vê mîrekiyê (mîrê mîran) diyar bikin. Ne tenê ev yek, her wiha gelek senedên muhrkirî û bênivîs jî rêdike. Diviyabû kurdan navê begên ku dixwazin binivîsiya û Osmaniyan jî ew weke beg bipejirandana.

Bi kurtî, bersiva begên kurdan ên di bin pêşengiya Idrîsê Bedlîsî de daye, wiha ye: “Em di nava xwe de li hev nakin, em naxwazin bibin yek û em nikarin Mîrê mîran derxin. Hûn ji me re Mîrê mîran bişînin.” Osmanî jî li ser daxwaza desthilatdariya kurdan, Mîrê mîran dişînin. Piştî ku ev lihevkirin çêbû, di sala 1514’an de Osmanî û Sefewî li Çaldiranê tên beramberî hev. Li aliyê din jî, kurd bi hêzên mezin li aliyê Osmaniyan cih digirin û li dijî Sefewiyan dikevin nava şer. Di encamê de Osmanî bi ser dikevin.


Begên Kurdan

Ji bo dîroka kurdan salên 1514-1516’an pêvajoyeke pir girîng e. Di van salan de desthilatdarê Osmaniyan, Yawûz Sultan Selîm û mîrê kurdan Idrîsê Bedlîsî peymanê îmze dikin. Împaratoriya Osmaniyan ku ji aliyê Rojava ve vebûn pêk aniye, bi Yawûz Sultan Selîm re amadekariyên xwe yên ji bo vekirina Rojhilat dikin. Hevgirtina ku Kurdistanê jî digire nava xwe, ta Bexda û Qahîreyê berfireh bû. Êdî Osmanî bûbûn împaratoriyeke cîhanî.

Ji vê dîrokê û pê ve, Amed û Mêrdîn dikevin nava xaka Osmaniyan. Idrîs bi navê Yawûz Selîm û bi saya peymana begên kurd û tirkan, herêmên weke: Ûrmiye, Îtak, Îmadiye, Cizîr, Gêl, Hîzan, Xerzan, Palû, Sêrt, Heskîf (Hesenkeyf) Meyafarqîn û bi giştî 25 herêm bi rêveberiya Osmaniyan ve tên







girêdan. Ji ber vê serkeftinê, Yawûz Sultan Selîm, Idrîsê Bedlîsî xelat dike. Jê re fermanekê dişîne û herêma Amedê weke milk dide Bedlîsî. Wekî din, “Dadgeha leşkerî ya ereb” a ku di 1516’an de Yawûz Selîm navenda wê li Amedê ava kiribû, ji Idrîsê Bedlîsî re dibexşîne. Bi vî awayî, Idrîsê Bedlîsî bi payeya ramyarî ya herî bilind, di dadgeha leşkerî de kirin rayedar. Idrîsê Bedlîsî di sala 1520’î de dimire.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Beyazîdê Duyem, Idrîsê Bedlîsî weke çi erkdar dike?

2- Eşîrên kurdan, çima xwe spartibûn Osmaniyan?

3- Di şerê Çaldiranê de helwesta eşîrên kurdan çi bû?

4- Ji bo çi, Yawûz Sultan Selîm, Idrîsê Bedlîsî xelat dike?

5- Osmanî, çawa bûbûn împaratoriyeke cîhanî?

## PIŞTÎ PEYMANA KURD Û OSMANIYAN ŞERÊN HATINE KIRIN


### a- Şerê Çaldiranê

Ji şerê ku di navbera Yawûz Sultan Selîm û desthilatê Sefewiyan Şah Îsmaîl de 23'yê Tebaxa 1514'an de 113 km dûrî rojhilatê Wanê (Ji herêma ku îro dikeve nava sînorê Çaldiranê) ji Deşta Çaldiranê pêkhatî re tê gotin.

Osmaniyên ku dîtin Sefewî bi hêz bûne, dest bi gerên ji bo rojhilat kirin. Êrîşa herî mezin û ya ji bo me herî girîng, sala 1514'an di dema Yawûz Sultan Selîm de di navbera Osmanî û Sefewiyan de pêkhat ango şerê Çaldiranê bû. Ji vê dîrokê û pê ve, êdî şer di navbera kurd, Osmanî û Sefewiyan de derneket holê.

**1-** Artêşa Osmaniyan bi ser ket û Sefewî şkestin.
**2-** Şah Îsmaîl reviya û bi zorê rizgar bû.
**3-** Yawûz derbasî Tebrîzê bû.
**4-** Gelek hunermend û zanyarên li bajêr şandin Stenbolê.
**5-** Di encama vê serkeftinê de Şah Îsmaîl, bandora xwe ya li ser Sefewiyan winda kir.
**6-** Piştî şerê Çaldiranê, Erzincan û Baybûrt ketin bin desthilatdariya Osmaniyan.






## b- Şerê Mercdabiqê

Yawûz Sultan Selîm di dema êrîşa Misrê de şerê yekem bû ku bi dewleta Memlûk re kirî. Di sala 1516'an de li Bakurê Bajarê Helebê şerê ku di navbera artêşa Osmanî û Mem lûk de derketî, Osmaniyan serkeftin bidestxistin. Di encama şer de Sûriye, Libnan û Filestîn tevlî xaka Osmaniyan bûn. Dema tirsnakiya li hemberî Sefewiyan hat rakirin, Yawûz Sultan Selîm li hemberî Memlûk artêşeke mezin amade kir.


Şerê Mercdabiqê

Sultan Memlûkê Misrê Qanso Gorî, li bakurê Helebê hat beramberî artêşa Osmaniyan (Mercdabiq cihekî nêzîkî Kilisê ye). Lê belê Şerê Mercdabiqê bi serkeftina Osmaniyan di 24.08.1516'an de bi dawî bû.

## c- Şerê Rîdaniyê

Di 22.10.1517'an de şerê ku di navbera dewleta Osmanî û Memlûkan de çêbûyî, artêşa Osmanî ya di bin fermandariya Selîmê 1'em de bi ser ketibû. Piştî şerê Mercdabiqê Tomanbay dibe Sultanê Memlûkiyan û weke desthilatdariya Osmaniyan nepejirandî, ji bo xwesteka aştiyê, qasidê aştiyê yê Osmaniyan jî dikuje.

Selîmê 1'em bi artêşa xwe ve di nava 13 rojan de di Çola Sîna re (11 – 16'ê çileya dawî) derbasî Rêdaniyê dibe û tê beramberî artêşa Memlûk. Li Rêdaniyê Sultanê Memlûk Tomanbay, ji Venedîkê top û çek girtibûn û çeperek bi hêz a parastinê dirust kiribû. Selîmê 1'em li çiyayê El-Muqetemê li dora artêşa Memlûk tev digere. Ji başûr ve êrîş dike, bi vî awayî berên neguher ên topên artêşa Memlûk dibîne û wan bê bandor dike.

Sultanê Memlûk Tomanbay, bi tevî kedeke pir mezin a amadekirina şer, di 22'ê Çileya dawî de li şerê Rêdaniyê dema zanî wê ji dest biçe, bi leşkerên xwe yên herî wêrek re avête li ser fermandariya navendî ya Osmaniyan û Sînan Paşa dikûjin. Bi vê kuştinê dema armanca dixwest nedît, Tomanbay ji herêma şer paş ve kişa. Bi vî awayî di 22'yê Çileya dawî ya 1517'an de serkeftina Rêdaniye hat bi dest xistin.

Bi vê serkeftinê re sultantiya Memlûk hilweşiya û tevahî xaka wan ket bin destê dagirkeriya Osmaniyan. Dewleta Osmanî li Misirê bû desthilat û Xelîfetî derbasî Osmaniyan bû. Emanetên pîroz(Ebeya Pêxmeber) ji Misrê anîn Stenbolê. Dewleta Osmanî, li rojhilatê Deryaya Spî bû yekem desthilatdarê rê û rewşa wê bilind bûye û Derya Sor û Okyanosa Hind vekiriye.



Şerê Rêdaniyê







# Pirsên Nirxandinê:

1- Şerê Çaldiranê, bi çi encaman bi dawî bû?

2- Şerê yekem ê ku Yawûz Sultan Selîm bi dewleta Memlûk re kirî, çawa pêk hat?

3- Osmaniyan, Şerê Rêdaniyê çawa bi dest xistin?

4- Piştî serkeftinên Osmaniyan li dijî Memlûkan, çi kirin?


5- Cihên vala bi peyvên guncaw dagire.
Osmaniyên ku dîtin ................ bi hêz bûne, dest bi gerên ji bo ............... kirin. Êrîşa herî mezin û ya ji bo me herî girîng, sala ............. an di dema Yawûz Sultan Selîm de di navbera Osmanî û Sefewiyan de pêkhat ango şerê .......................... bû.

## PEYMANA QESRÎ-ŞIRÎN Û PARÇEBÛNA KURDISTANÊ

Di navberan de be jî, carinan bi şêweyê şer, carinan jî bi şêweyê aştiyê di navbera împaratoriya Osmanî û dewleta Sefewiyan de, şer bi awayê domdar hatiye. Îsmaîlê yekem (Şah Îsmaîl), di dema Beyazîdê duyem de li hemberî axên di bin desthilatiya Osmaniyan de bûye xwediyê helwesteke êrîşkar. Yawûz Selîm ê ku bavê xwe ji text tîne xwar, bi şer bersiva vê dide. Di şerê 1514'an yê li Çaldiranê jiyanbûyî û bi windakirina Şah Îsmaîl bi dawî bûyî de, şerên piştî wê jî bi xwe re anîne. Ev jî bûye sedema ku xaka Kurdistanê di navbera van hêzan de bibe qada şer. Ji derveyî van şeran ên di 1500'î de çêbûbûn, a girîngtir û ya ku wê pêşeroja Kurdistanê diyar bikira, şerên di navbera salên 1623-1639'an de hatine jiyîn bûn. Împaratoriya Osmaniyan li hemberî artêşa Sefewiyan a ku Bexda bi dest xistibû, di sala 1637'an de dikeve şer.

Di navbera împaratoriya Osmaniyan a ku ji nû ve Bexda bi dest xistî û Sefewiyan de, di sala 1639'an de bi navê peymana Qesrî-Şirîn peymanek tê muhrkirin. Di encama vê peymanê de, xaka Kurdistanê cara yekem piştî wê tê parvekirin. Piştî vê peymanê jî, di navbera Osmanî û Sefewiyan de şer tên jiyîn û di sînoran de guherîn pêk tên. Lê her dem bi bingehgirtina xetên sînorên vê peymanê, pirsgirêkên di navbera xwe de çareser dikin. Hin ji sînorên di navbera Îran û Tirkiyê de, sînorên bi peymana Qesrî-Şirîn a di sala 1639'an de hatin xêzkirin tên diyarkirin. (Di pêvajoya serhildana Agirî ya sala 1930'î de guherîneke biçûk çêbûye).







## Peymana Qesrî-Şirîn (17'ê Gulana 1639)

Ev peyman, li ser encama qezençkirina Osmaniyan a şerê Bexdayê pêş ketiye. Ev hevpeyman li ser daxwaza Şah Safiyê yekem. Di navbera Mustefa Paşa ku sedir-azemê Miradê çarem bû û şah Safî li Qesrî-Şirîn hatiye muhrkirin. Bi vê hevpeymanê, şerê di navbera Osmanî û Sefewiyan de bi fermî bi dawî dibe. Ev hevpeymana li ser bingehê windahiyên di şerên navber ên ji 16-23'yan û heya wê demê pêk hatine, pêk tê. Piştî şerên Rewan û Bexdayê, her du alî jî dibin xwedî helwesteke ber bi aştiyê ve.



Miradê Çarem




Xalên girîng ên hevpeymanê, ev in:

- ✓ **Wê dawî li şerê di navbera her du aliyan de bê.**
- ✓ **Wê Ahiska û Rewan ji dewleta Sefewiyan re bimînin.**
- ✓ **Wê Bexda û Besra ji Osmaniyan re bimînin.**
- ✓ **Wê sînorên her du dewletan her dem weke xwe bimînin.**

Ev hevpeyman, di dema pêvajoya rawestînê ya her du împaratoriyan de pêş dikeve. Ev împaratoriyên ku ji derve zêde pêşketinê nîşan nakin, bi vê peymanê dixwazin herî kêm sînorên di destê xwe de biparêzin. Li hemberî pêşketinên ku dihatin jiyîn, li ser kurdan çûyîna împaratoriyan, her wiha xwestekên mafên nû bidestxistin û bi pêşxistina serhildanan parastina mafên xwe yên kurdan, bûye sedema ku ev hevpeyman hîn bi hêsantir pêk were. Ger ne pir berfireh be jî, serhildana Keleha Dimdimê ya di pêşengiya Emîrxanê Yekdest (lepzêrîn) de, di vê pêvajoyê de pêşketî weke mînak dikare were nîşankirin.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Sedemên van bûyeran, çi ne?
   - Xaka Kurdistanê di navbera Osmanî û Sefewiyan de bibe qadeke şer?
   - Peymana Qesrî-Şirîn, bi hêsanî pêk were.

2- Çawa şerê di navbera Osmanî û Sefewiyan de bi dawî dibe?

3- Hevokên rast bi tîpa (R), yên şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bike.
   - Peymana Qesrî-Şirîn a di sala 1539'an de hat muhrkirin. ( )
   - Yawûz Selîm, birayê xwe ji text tîne xwar. ( )
   - Di Peymana Qesrî-Şirîn de Ahiska û Rewan ji dewleta Sefewiyan re bimînin. ( )
   - Xaka Kurdistanê piştî Peymana Qesrî-Şirîn tê parçekirin. ( )






## LI KURDISTANÊ ENCAMÊN ŞERÊ DI NAVBERA KURD Û SEFEWIYAN DE

**Weke encam:** Roleke kurdan a sereke di çûyîna Osmaniyan a ber bi rojhilat ve hebû. Piştî Melazgirê , yekîtiya herî mezin, desthilatdarên kurd û tirkan bi şerê Çaldiranê yê Osmaniyan ber bi rojhilat ve pêk hat. Ya din jî, ew e ku axa kurdan ji bo Împaratoriya Osmanî û Sefewiyan bûye jîngeh, dîsa şerê Çaldiranê bûbû sedem.
Di vê demê de ku ji bo kurdan di warê rêxistinkirineke ramyarî de derfetên nû hatibûn afirandin, kurdên feodal ên girêdayî mîrekiya Bedlîsê (Derdora 20 mîran ) bi riya Idrîsê Bedlîsî, têkilî bi Osmaniyan re hat danîn.



Ji aliyekî ve Împaratoriya Osmanî û Sefewiyan xaka xwe berfireh kirin û ji aliyê din ve jî, kurd û welatê wan bûn navenda şerê her du aliyan. Piraniya bakurê Kurdistanê ji hêla Sefewiyan ve bi darê zorê ji tirkmenan hat stendin, lê belê piştre xanedana Osmaniyan dîsa ew der ji wan stend. Piştî demeke kin neçar bûn radestî Osmaniyan bikin. Şerê Çaldiranê yê 1514’an ê di navbera her du hêzan de, di dîroka kurdan de bû xwediyê cihekî taybet. Di gel ku Osmanî hêza Sefewiyan a bilindbûyî kiribin bin venêrîna xwe de jî, lê belê nikariye hemûyan bêbandor bikin. Bi windakirina vî şerî re Sefewiyan beşa girîng a axa Kurdistanê ya di bin destê xwe de jî, winda kiribûn. Her çi qas şerê di navbera Osmanî û Sefewiyan de car caran rawestiya jî, lê belê bi giştî derdora 300 salî, berdewam kir.

# DI SERDEMA OSMANIYAN DE REWŞA CIVAKÎ YA KURDAN

Di sedsala 16'an de bi hêzbûna împaratoriyê bi awayekî ji dil bandor li ser çîna serdest û mîrektiyên kurdan kiribû. Di şerên van dewletan de hem di nava xwe de, hem jî bi hêzên derve re yê ku dida meşandin, Welatê Kurdistanê weke erdnîgariya şer, gelê Kurdistanê jî weke gelê herî zêde di navbera her du hêzan de hatiye bikaranîn û zordarî lê hatiye kirin. Lê di aliyekî din de jî, di şerê van dewletan de çi li beramberî hev, çi jî li ser Kurdistanê desthilatdarî didan meşandin. Çîna desthilatdar a kurd û mîrektiyên kurd piştgiriya herî mezin pêşkêş dikirin. Li beramberî xizmeta ji bo navenda nû ya desthilatdewlet hin ji wan weke mîrektiyan hatine sînordarkirin, hin ji wan jî, pir bihêztir berjewendiyên xwe yên malbat-xanedanî parastibûn. Bi şêweyekî giştî ev statu heya sedsala 18'an parastine.

Du sedemên girîng ên ku hiştine dewleta Osmanî neçar bibe bi kurdan re di nava têkiliyeke nerm a îdarî û ramyarî de be û bimîne, mirov dikare wisa bi lêv bike: Ya yekem hizira avaker a şêwazê rêxistinbûyîna ramyarî û îdarî ya împaratoriyê ye, ya duyem jî weke kelehekê bikaranîna mîrektiyên kurdan li beramberî dewleta Îranê.




**Erdnîgariya Kurdistanê**






## ENCAMA TÊKILIYA KURD, OSMANÎ Û SEFEWIYAN

Di derdora salên 1500'î de du hêzên sereke çêbûbûn:

1- Osmanî
2- Sefewî.

Osmanî di sala 1299'an de ava bû, di sala 1453'yan de bûn emperetorî. Ji sala 1500'î û pê ve jî li Ewropayê û xeta Qefqasyayê cihê herî dawî ku karîbû biçinê çû.

Dewleta sefewiyan ji nû ve ava bûye. Dewleta Apkûyan û Karakiyan (tirk) rûxiyane û sefewiyan hema hema tevahî Kurdistan xistine bin kontrola xwe, sultanê sefewiyan şah Îsmayîl sala 1507an şîatî weke mezheba fermî li Îran û Kurdistanê ragihandiye. Civaka kurd ji sedî not îslama sunî dipejirîne, siyaseta şah Îsmayîl di navbera kurd û îraniyan de pirsgirêkan çêdike. Kurd şîatiyê red dikin, şah Îsmayîl bi tundî tê ser kurdan. Di navbera kurd û sefewiyan de şer derdikeve, bi taybet li herêmên Cizîr, Amed û Heskîfê serhildanên dijwar derdikevin. Di encamê de bi hezaran kurd bi fermana şah Îsmayîl tên kuştin. Ew komkujî û nakokî dibin sedem ku kurd li derveyî sefewiyan li hevpeymanan bigerin.

Osmanî ji ber ku di aliyê rojava de êdî nikarin bi pêş de biçin, berê xwe dabûn Rojhilata Navîn. Ji bo ku bikarin Rojhilata Navîn bi dest bixin, pêwîstiya wan bi kurdan hebû. Hevpeymana Çaldêran di sala 1514'an de bi pêşengyia Idrîsê Bedlîsî li ser bingehê van pêwîstiyan çêbû. Şerên Çaldêran 1514'an, Mercdabiq 1516'an, rêdaniyê 1517'an, di van her sê şeran de, ji ber ku kurdan bi osmaniyan re li hev kirin, osmanî bi ser ketin. Bi vî awayî deriyê Rojhilata Navîn ji osmaniyan re hat vekirin. Piştî ku osmanî bi ser ketin û di cîhanê de bûn hêzeke sereke, sultanê osmaniyan Yawûz Selîm xwest ku kurdan xelat bike. Li ser vî bingehî ji kurdan xwest ku ji nav xwe mîrê mîran derxin û kurd bi xwe kurdistanê bi rê ve bibin.

Idrîsê Bedlîsî li nav mîrên kurdan demekê geriya û xwest ku yekî ji wan bike mîrê mîran, lê belê ji ber ku mîrên kurdan hev nedipejirandin, kurdan ji nava we tu kes dernexist. Osmaniyan ji nav xwe mîrê mîran yê bi navê Biyîqlim Mihemed Paşa şandin Kurdistanê.

Idrîsê Bedlîsî li ser vê rewşê ji bo birêvebirina Kurdistanê sîstemekê çêdike û pêşkêşî padîşah dike, padîşah jî dipejirîne. Li gorî vê sîstemê hinek erkên ku kurd û hinek erkên ku osmanî pêk bînin jî diyar dibin. Li gorî vê:

Erkên kurdan:

1- Di dema şer de wê leşkeran bidin artêşa osmaniyan.
2- Li gorî mezinahiya xwe her mîratî wê salane baca xwe bidin osmaniyan.
3- Mîratiyên kurdan wê sînorên ji wan re hatine diyarkirin, derbas nekin, ango wê êrîşî mîratiyeke din ya kurdan nekin.
4- Dema şerê sultanetê di nav osmaniyan de çêbibe wê kurd tu aliyan negirin.


Erkên osmaniyan:

1- Li kîjan mîrîtiyê wê kî bibe mîr, osmanî dê destwerdanê nekin. Mîrîtî wê ji bav derbasî kur bibe, heke kur tunebe wê ji aliyê rûspiyên wê mîrîtiyê ve were diyarkirin.
2- Li hember mîrîtiya kurdan dema êrîş pêk werin, wê osmanî wan biparêzin.
3- Mîrîtiyên kurdan dê weke herêmên serbixwe werin birêxistinkirin, wê osmanî destwerdana kar û barên hundirîn (dibistan, dadgeh, bac û hwd) nekin.
4- Mîrîtiyên kurdistanê wê xweser bin.

Idrîsê Bedlîsî li gorî şert û mercên wê demê, ew peyman çêkir û nêzî sêsed salî hin pirsgirêkên biçûk derketibin jî sîstema ku Idrîsê Bedlîsî ava kirî hat meşandin.

Rewşa kurdan li Rojhilatê Kurdistanê cuda bû. Li Rojhilatê Kurditanê dewleta Îranê sîstema ilxanetiyê pêş xist. Xwestiye ku li Kurdistanê sîstemeke weke ya osmaniyan ava bike, lê weke osmaniyan sîstema xwesertiyê nedan kurdan.






Dewletê derfet neda ku kurd bi awayekî xweser xwe birêxistin bikin. Ev sîstem heya sala 1799'an dimeşe.
Sîstema li rojhilat û parçeyê ku di destê osmaniyan de bû heya despêka sala 1800'î hatina modîrnîteya kapîtalîst berdewam kiriye

Ku car caran pirsgirêk derketibin jî (1655'an li Bidlîsê şerê di navbera osmanî û kurdan de – 1606'an di navbera sefewî û kurdan de) bi giştî ev sîstem heya hatina kapîtalîzmê ya Kurdistanê (1800) meşiyaye

Bi hatina modêrnîteya kapîtalîst re ev dîrok wê were guhertin. Ji bo kurdan û neteweyên Rojhilata Navîn serdema felaketê wê dest pê bike.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Mîrên kurd, çawa têkilî bi Osmaniyan re danîn?

2- Di sedsala 16'an de xaka Kurdistanê û gelê kurd, çawa dihatin bikaranîn?

3- Du sedemên girîng ên ku hiştine dewleta Osmanî neçar bibe bi kurdan re di nava têkiliyeke nerm de be, çi bûn?

4- Cihên vala bi peyvên guncaw dagire.

Şerê ..................... yê 1514'an ê di navbera her du hêzan de, di dîroka kurdan de bû xwediyê ............. ............. . Di gel ku Osmanî hêza ..................... a bilindbûyî bikirin bin venêrîna xwe de jî, lê belê nikariye hemûyan bêbandor bikin. Bi windakirina vî şerî re Sefewiyan beşa girîng a axa ...................... ya di bin destê xwe de jî, winda kiribûn.

## PIRSÊN NIRXANDINA BEŞÊ

1. Rewşa yekîtiya eşîrên kurdan di dema desthilatdariya Osmaniyan de çawa bû?
2. Sedsalên 1500 û 1800'î ji bo kurdan, çi didin îfadekirin?
3. Dewleta Osmaniyan hebûna xwe di kîjan dîrokê de domandiye û belavî kîjan herêman bûye?
4. Rola kurdan di pêşketin û berfirehbûna Dewleta Osmaniyan de çawa bû? Rave bike.
5. Têkiliyên Yawûz sultan selîm bi kurdan re çawa bûn? Ger kurd nebûna, wê derfetê pêşketina dewleta Osmaniyan çawa bûna?
6. Rola Idrîsê Bedlîsî di dîroka kurdan de çawa ye? Rave bike.
7. Sedema derketina şerê Çaldiranê, çi ye?
8. Peymana Qesrî-Şirîn di navbera kê û kê de pêk hatiye û ji bo kurdan çi wateyê dide?
9. Encamên şerê di navbera Osmanî û Sefewiyan de çawa bûn?
10. Şerê Rêdaniyê di navbera kê û kê de pêş ketiye û encamên wî çi ne? Rave bike.
11. Şerê Mercdabiqê di navbera kê û kê de pêş ketiye û encamên şer çi ne? Rave bike.






# BEŞA 5

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1)** Gelo, derketina kapîtalîzmê encameke çawa bi xwe re pêş xist û xeteriyên çawa anîn holê?


**2)** Gelo, kapîtalîzmê di dîrokê de bi xwe re çi guhertin anîne?

**3)** Bi pêşketina kapîtalîzmê re şoreşên girîng ên di civakê de derketine û bûne sedemên guhertinên mezin kîjan in? Lêkolîn bike.

**4)** Gelo, derketina kapîtalîzmê ji bo pêşketina civakê weke qeder bû? Lêkolîn bike.

**5)** Raperînên gelan an jî şoreşên gelan, li hemberî kapîtalîzmê helwesteke çawa nîşan dan? Lêkolîn bike.







## KAPÎTALÎZM

**Di sedsala 16'an de** di dîroka cîhanê de pêvjoyeke nû dest pê dike. Ew pêvajo ji dîroka borî tevahî cudatir wê were jiyîn. Di jiyanê de  di wateya hemû tiştên bingehîn de wê guhertin çêbibin. Dewlet, artêş, ol, sermaye, ax, malbat, zanist, teknîk, mirov û hwd. Bi kurtahî mirov- civak û jiyana wî wê ji nû ve were şîrovekirin.
Ji bo ku ev guhertin pêk were, hinek sedemên madî û hinek sedemên manewî-hişmendî hene. Sedemên manewî-hişmendî: Ronesans, reformasyon û ronakbûyîn e.
Sedemên madî:
Vedîtinên erdnîgarî, dîtina barûdê, anîna çapxaneyê ya Ewrûpayê, dîtina pisûleyê, di bajar-dewletên Îtalyayê de avakirina bankan, bikaranîna çek û sendan( şêk), di bazirganiyê de bikaranîna deryayê ...
Ji bilî van sedeman koçberkirina cihûyan ya ji Ispaniyayê (1492). Cihûyên wê demê yên hatin koçberkirin, piranî çûn Holenda û Birîtanyayê.
Vedîtinên erdnîgarî:
Bi pêşengiya quptanên Portekîz û Ispanî jî, di sala 1492'an de parzemîna Emerîkayê hat vedîtin. Di vê demê de li Emerîkayê şaristaniya Înka hebû. Înka nîvdewlet û nîvkonfedresyon bû. Welatekî dewlemend bû. Dewlemendiya wan ew qas pir bû ku paytextên xwe piranî bi zêr çêkiribûn. Zêr û zîvên wan têrî tevahî Ewrûpayê dikir. Bi dîtina Emerîka û şûnde ewrûpiyan bi kuştina milyonan çermsoran ew zêr û zîvê Emerîkayê anîn Ewrûpayê.
Dîtina barûdê:
Sedsala 16'emîn de li tevahî Ewrûpayê sîstema derbegî hebû, bi hezaran dewletên biçûk peyda bûbûn. Serokên wan dewletên biçûk li ser teht û zinaran ji xwe re keleh çêkiribûn.

Heya ew keleh nehatin dagir kirin, ew keleh weke dewleteke cuda xwe berdewam dikir. Bi dîtina barûdê re ew pirsgirêk çareser bû. Topên giran hatin çêkirin û yên ku di destê wan de topên giran hebûn ew kelehên ser zinaran rûxandin û li Ewrûpayê pêvajoyeke nû dest pê kirin. Ji wê pêvajoyê re monarşiya mutleq tê gotin. Ango di dewletekê de hemû biryar di destê yek qralî de be, îfade dike.

Dîtina çapxaneyê:

bi hezarê salan dîtin, xwendin, nivîs di destê hin kesan de bû. Ango zanabûn di bin yekdestariya çîna serwer de bû. Bikaranîna çapxaneyê ew yekdestarî şkand. Di civakê de her kesî derfet dît ku bigihêje zanabûnê.

Dîtina pisûleyê:

Berî vê demê keştiyên ku derdiketin ser deryayan, li benda bayê diman, ba ji kîjan aliyê dihat li gorî wê keştî dimeşiya û keştiyeke ku derketî ser deryayê, nizanîbû ka bi çi aliyê de diçû. Bi dîtina pisûleyan mirovan aliyên ku diçinê, tesbît kirin û derya weke parzemînekê ji wan re hêsan bû.

Li derveyî van pêşketinan, çêkirina keştiyên mezin, bikaranîna banka û borsa, di aliyê madî de ji bo sîstema kapîtalîzmê zemînek çêkir. Pêşketina ronanas, reformasyon û ronakbûyînê li ser van pêşketinên madî hişmendiyeke nû ava kir. Ev hişmendiya nû wê pêşî ji serdemeke nû re veke.

## 1- Pênaseya Kapîtalîzmê

Kapîtalîzm, weke peyv, tê wateya make-sermaye. Kapîtal, bi girtina paşgira "îzm" bûye kapîtalîzm. Lê, weke bêje, kapîtalîzm, tê wateya malê mak, sermayê mak jî, lê weke şêwe, pergal û awa heman wateyê nade. Weke pergal Kapîtalîzm, ji malê mak,



Kapîtalîzm







sermayedariyê zêdetir, li ser bingehê bidestxistina pir fêdeyê bi kar tê û pergala bikaranîna sermayeyê pênase dike. Lê, piştî bi pergala dewletdariya şaristanî û dagirker re bû yek, pênaseyeke berfirehtir dixwaze. Bi vê ve girêdayî kapîtalîzm bi riya zor, xap û rîpan bi xwarina keda mirovan qezencê bi dest dixe û li ser vê xwarina keda mirovan û berhevkirinê, dibe desthilat, dibe dewlet û pergala dagirkirina civakan.


## 2- Cih Û Dîroka Pêşketina Kapîtalîzmê

Kapîtalîzm, di sedsala 16’an de weke sîstem li Holenda û Îngiltereyê derketiye. Kapîtalîzm, di qonaxeke rizîbûna dîroka şaristaniyê de derketiye holê. Di nava 400 salan de hat rewşa pergaleke cîhanî. Qraliyeta Îngilîz û Holendayê xwe bi şêweyê kapîtalîst bi rêxistin kirin û derbasî çalakiyê bûn. Baca rêkûpêk, sazûmaniya aborî, burokrasî û artêşa pispor pêş xistin. Bi hêza xwe ya bilind a deryayî, Îspanya û Fransa şkandin. Di vê serkeftinê de kesên kapîtalîst alîkarî dan dewletan. Banker û bazirgan, cih û pereyan bi deyn didin dewletên Holenda û Îngiltereyê. Ev pere, di qezenckirina şer û bihêzbûna wan dewletan de risteke mezin dilîzin. Çima kapîtalîzm, li Îngiltere û Holendayê pêş ket. Ji ber ku rewşa erdnîgarî ya welatên Holenda û Îngiltereyê destdayî bû ku li wir kapîtalîzm pêş ket.

Sedemên destdayî jî, ev in:

1) Ev li dawiya bakurê rojavayê Ewrûpa ya hemû şaristanî dereng gihîştibû Okyanûsa Atlas dema gihîştibûn pir lewaz bûbûn, cih digirt.
2) Sê qraliyetên mezin ên Ewrûpayê, yên weke: Fransa, Awûstûrya û Îspanya di navbera xwe de şerê desthilatdariyê yê li ser Ewrûpayê bi rê ve dibirin.
3) Wan weke metirsî, di asta bajarên Îtalyayê de nedidîtin û bi hêzeke hevgirtî û ya têrê dike, bi ser de neçûn.
4) Pêşkêşî ji berfirehbûna refermasyonê ya li Bakûrê Ewrûpayê re dikirin.
5) Ji ber ku ew li peravên Okyanûsa Atlas bûn, derfetên mezin ên bazirganiya dûr û nêzîk ji bo wan peyda dibûn.
6) Hemû çandên heyberî û rewanî yên bajarê Îtalyayê, ji dest wan girtin.
7) Ew, hem ji aliyê heyberî, hem ji aliyê çanda rewanî ve qadeke sereke ya feodalîzmê bû, lê lewaz bû.
8) Feodalîzmeke bihêz a ku li pêşiya kapîtalîstbûnê, hat û çûyîna bazirganî, çandinî û endustriyê bibe asteng, çênebûbû. Şaristanî, li gelek deveran bi şêweyê kapîtalîzm cara yekem pêş dikeve.






# Pirsên Nirxandinê:

1- Piştî ku kapîtalîzm bi pergala dewlet û şaristaniyê re dibe yek, çi wateyê digire?

2- Çima kapîtalîzm, li Îngiltere û Holendayê bi pêş ket?

3- Sedemên destdayîniya erdnîgariya Îngiltere û Holendayê ya kapîtalîzmê, bi cewherî binirxîne?

4- Bersiva rast, hilbijêre

- Kapîtalîzîm weke peyv, tê wateya
A) Aborî B) Dewlet C) Make-sermaye

- Kapîtalîzm, di nava 400 salan de hat rewşa pergaleke
A) Cîhanî B) Herêmî C) Netewî

- Di vê serkeftinê de kesên kapîtalîst alîkarî dan
A) Dewletan B) Partiyan C) Rêxistinên civakî

## 3-Çavkanî û Sedemên Pêşketina Kapîtalîzmê



Pergala Kapîtalîzmê

Di dîrokê de nîşaneyên destpêkê yên kapîtalîzmê, bi pêşketina bazirgantiyê re derdikevin holê. Şêwazê destpêkê yê kapîtalîst û kapîtalîzmê li ser bazirganiyê pêş dikeve. Bi bazara di navbera gund û bajêr de, pîşeyek ji derveyî hilberînê, komeke qezencê pêk tê. Pisportiya tesbîtkirina pêwîstiyên koman, desthilatdariya li ser bazar û veguhertina pêwîstiyên jiyanê, bû sedema ku bêyî kapîtalsît tevlî hilberîna komanî bibin, li ser hiberînên heyî kedxwarî û qezencê bi dest bixe. Ên kapîtalîstîk ên ku li ser bazirganiyê pêş ketin, bêyî ku tevlî çalakiyên hilberînê bibin, li ser hilberîna aborî ya koman qezencê bi dest dixin. Bi vî awayî, li gel dewletê cara yekem çîneke bazirgan destwerdana aboriya koman dike.


Cihê destpêkê yê jidayîkbûn û pêşketina kapîtalîzma bazirganî Mezopotamya ye. Di 4000-3000 sal B.Z de weke destpêkekê, li Mezopotamya û derdora bajarê Ûrûkê, taxeke bazirganiyê tê avakirin. Piştre Asûrî vê mîrateyê dewr digirin (1050-626 B.Z) ji Anatolyayê heya Hindistanê di parzemîneke mezin de tevneke bazirganiyê pêş dixin. Di dîrokê de yên ku dewleta destpêkê ya yekdestiya bazirganiyê ava kirine, Asûr in.







## a- Merkantalîzm



Merkantalîzm

Merkantalîzm, di navbera sedsalên 16 û 18’an de weke awayekî pêkanîna aborî û ramanê, li Ewrûpayê pêş ketiye. Bi armanca zêdekirina hêza dewletê, ji aliyê hikumetê ve ji sazûmankirina aboriya neteweyî re **merkantalîzm** tê gotin. Polîtîka-aboriya ku kapîtalîzmê di dema xwe ya kevn de ji berhevkirina sermayeyê bi kar aniye ye. Berovajî lîberalîzmê, merkantalîzm, ji bo bûrjûwaziya neteweyî, parastina dewletê bihêz bike, polîtakaya ku gumrikên netewî bilind digire, parastina bazara hundir li hemberî bazara ji derve û hevsengiya bazirganiya ji derve li gorî berjewendiyên bûrjûwaziyê bi rêk û pêk dike. Ya dixwazin bi vê polîtîkayê bikin, di bin parastina dewletê de pêkanîna sermayeya bûrjûwaziya neteweyî ye. Merkantalîzm, pêkanîna berhevkirina sermayeya bûrjûwaziya neteweyî “mutlaq” bi desteka dewletê ve girê dide. Bi vî awayî, bingeha aboriya neteweperestî ya netew-dewletê pêk aniye.

## b- Şoreşa Pîşesaziyê



Şoreşa Pîşesaziyê

Di navbera nîvê duyem ê sedsala 18. û salên destpêkê yên sedsala 19’an de bi lezgînî peydabûna enerjî, tekstîl, hesin, pola û bi riya bandorkirina hilberînên

veguhestinê li Îngiltereyê pêşketinek çêdibe.

Her çi qasî dîrokeke wê ya misoger nehatibe zanîn jî, lê tê texmînkirin ku ev pêşketin, di navbera salên 1760 û 1829’an de pêk hatiye.

Heya sala 1769’an çalakiyên aborî li ser herikînên mak dihatin pêkanîn. Çandinî û bazirganî heya vê dîrokê, faktorên bingehîn yên jiyana aborî kesên gundî, bazirgan, endamên karcivan (korporasyon) bûn. Karkerên kargehê tunebûn. Kapîtalîstên pîşesaziyê jî, derneketibûn qada aborî. Piraniya dewlemendan sermiyanê xwe, ne bi çêkirina tiştekî, bi riya bazirganî, bi veguhestinî, an jî bi deyndayîna diravan pêk anî bûn.

Di dîrokê de cara yekem hilberîna bajêr, ketiye pêşiya hilberîna gund. Bi hezarê salan hilberîna bi dest a bajar, ji hilberîna gundan re alîkar bû. Lê, bi şoreşa pîşesaziyê re, ev pêvajo berovajî bû. Ev rewş bû sedem ku bi her awayî fermandariya bajêr, bikeve pêşiya fermandariya gund.

Ji aliyê çînî ve, rê li ber hêzbûyîneke bêsînor a yekdestiya kapîtalîst û bûrjûwaziyê vedike. Bi awayekî bi plan zanist tevlî pîşesaziyê kirin û ji zanista ku li pey rastiyê digere, vegerandin zanista ku li pey hêza desthilatdariyê digere. Bi vî awayî, zanist ji armanca xwe dûr ket û hat rewşeke wisa ku bibe amûra hêza madî û hilberîna desthilatdariyê.

Rê ji pêşketina kapîtalîzma yekdestiya pîşesaziyê re vekiriye ku ji yekdestiya bazirganî û hilberînê pir wêdetir be.

Encamên ramyarî yên şoreşa pîşesaziyê girîngtir in. Vê şoreşê, ji aliyekî ve rê ji dewlet-neteweyê re vedikir, ji aliyê din ve pêvajoya emperyalîzmeke ber bi derve ve dest pê kir. Bi pêvajoyên xwe yên sedsala 19’an re desthilatdariya şaristaniya Ewrûpayê li ser cîhanê tê misogerkirin.







## Pirsên Nirxandinê:

1- Kapîtalîzm, li kû derketiye û li kû deran bi pêş dikeve?

2- Pisporiya tesbîtkirina pêwîstiyên koman, çi kir?

3- Çawa fermandariya bajêr, dikeve pêşiya fermandariya gund?

4- Berovajî lîberalîzmê, merkantalîzm çi dike?

5- Encamên ramyarî yên şoreşa pîşesaziyê, çi bûn?

6- Bersivên rast hilbijêre.

- Merkantalîzm, awayekî pêkanîna aborî û
  A) Pêşbirkan in B) Ramanê ne C) Çandiniyê ne

- Di dîrokê de cara yekem hilberîna bajêr, ketiye pêşiya hilberîna
  A) Gund B) Neteweyî C) Dewletê



Ronesans

## c- Ronesans

Tê wateya ji nû ve jidayîkbûnê. Weke lêvegera xwezayê jî tê zanîn. Di sedsala 13'an de ji Filoransayê dest pê kiriye û li tevahî bajarên Îtalyayê belav bûye. Di serî de wêne, peyker û mîmarî, tevahî herikînên hunerê bandor kirine û ji bo pêşketina bîrkarî, astronomî û zanista endezyariyê risteke vedîtiner lîstine û ji tevahî herikînên ramanî yên li pey pêşketinê re bûne ronahî. Ramana mirovî, bûye ramana vê demê û ji bo derbaskirina skolastîkê risteke girîng lîstiye.

Vejîna destpêkê 4000'î B.Z li Kevana Toros û Zagrosê bi dema Neolîtîkê re pêş dikeve. Ji bo ku mirovahî derbasî şaristaniyê bibe, di vê kevanê de tevahî amûr hatine afirandin. Li gel amûrên weke: tekel, tevn û cotkirin, gundên mezin, nivîsên hatine afirandin û destanên lehengiyê yên mezin hemû di vê demê de hatine afirandin û xwediyê van afirandinan Jin-Dayîk e. Bilindbûyîna dayîkê û weke xwedawend pejirandin, bi vê taybetmendiya wê ya afirandinê ve girêdayî ye. Di cewher de bilindkirina dayîkê bi vê hêza watedayîna pîrozbûnê ve girêdayî ye. Şopên vê bilindbûyînê, hîna jî di civaka kurd de zindî ne. Di kurdî de bi navkirinên Stêr-Star, hêj jî di civaka kurd de weke qudret, bilindahî û sembola xwedatiyê tên bibîranîn.


Şoreşa ramanê ya duyem jî, salên 600-300'î B.Z li ber peravên Derya Egeyê jiyaye. Li hemberî xwedayên koledar ên ku hiş û vîna mirov tune dikin, bi pêşxistina raman, felsefe û zanistê re bersiv hatiye dayîn. Berhevkirina felsefî ya ku ji Rojhilatê girtin, bi hostayî û afirîneriyeke mezin serdest kirin û nirxekî mezin ê felsefe û zanistê li pey xwe hiştin.







## d) Reformasyon





**Reformasyon,** ji Pêşketinên di sedsala 16'an de di bin pêşengiya Martin Lother(Martin loser) de li Elmanyayê çêbûne re tê gotin û bûye sedema derketina Mezhebê Protestant. Yên ji vê re dibêjin şoreşa olî jî hene. Ev dêra tevlîhev û ji rê derketî, bingehê pêkanîna vê yekê ye. Di vê serdemê de dêr û keşetî bi xwe bi jiyana ramyarî ya Ewrûpayê re têkildar dibûn. Bêterziya di nava kesên oldar de pêş dikeve, derxistin û firotina tiştên pîroz (çikên lêborînê) û dagirkeriya oldaran dibe sedema lewaziya moralên dêrê.

Her çi qas ji beriya wê çaxê jî ji van kesên oldar daxwaza reforma dêrê hatibe kirin jî, kesî zêde guhdar nedikir û heya bi afarozkirina wî jî diçû. Dîsa her çi qas Keşe Desîderîos xwestibe rewşa ji rê derketî ya dêra Îrasmos bi reforman rêk û pêk bike jî, bi ser nakeve.

Nêrîna paradîgmaya modernîteyê, ronesans û reformasyonê weke rojên pêş ên desthilatdariya bûrjûwaziyê dibîne û dibêje qey amadekar û lehengên tevahî van pêş-ketinên îdeolojiyên bûrjûwaziyê ne. Lê, di rastiyê de ev dem bi rabûn û serhildana gundiyan pêş ketibû û dema qeyrana feodalên xwe dispartin dêrê bû. Ji bilî ku van pêşketinan bixe di xizmeta xwe de tu armancên bûrjûwaziyê tune bûn. Li Rojava piştî ronesansê, reformasyon bû şoreşa ramanê ya duyem. Bi reformkirina olê, di asteke mezin de zexta li ser bawerî û rama-nên mirov hatibûn rakirin. Reformasyon di cewherê xwe de

tevgera ola navendî, wergerandina ola milî û kesî ye. Reformasyon, di cehwer de li hemberî desthilatdariya ola navendî û zextên wê, têkoşîna azadiya gelan e. Tevgera milîkirin û kesîkirina olê ye. Armanca gel ku ol û azadiya xwe bi awayekî serbest bijîn. Ji aliyê bûrjûwaziyê ve bikaranîn û îstîsmarkirin vê rastiyê naguherin. Bi pêşketina reformasyonê re astengên li pêşiya zanist û felsefeyê di asteke mezin de hatine rakirin, bi pêşketinên çêbûyîn re, rê ji ronahîbûyînê re hatiye vekirin. Bûrjûwaziyê, ji bo ji xwe re bi kar bîne pîrozkirina neteweyî û ji bo desthilatdariya xwe rizgarkirina hestên neteweyî bûn sedem ku êşên mezin bijîn. Li ser vê, şerên mezhebî yên sedsalan hatin destpêkirin.

## e- Ronahîbûyîn


Davîd Hûm

Zanyarê Îskoçî Davîd Hûm, armanc kiribû ku rêbaza ceribandinê tevlî lêkolîna girêdayî hişmendiya mirov bike û zanista xwezayî ya bi Mekanîka Neotin re gihandî xala herî bilind, bawer kiribû ku wê qeyranê di rêkûpêkiya pergala xwezayê de, bi çend rêgezên bingehîn peyda bike.

Adem smîth, çarçoveyek a ramanên erênî ji bo dewlemediya neteweyan bi bazara serbest û parvekirineke rast a aboriyê xet dabû. Fîzîkvan û zanyarê Elman: Îmmanwel Kant jî, parastina zanîna cih û demê kirde nedikir û ramana rewşa tişta rastîn û ya ji me tê xuyakirin ji hev cuda ye û ceribandin û hizirandin ji hev vediqetandin.

Ronahîbûyîn bi riya pir baskên weke: wêje, huner, zanist, ol û felsefeyê belav bûye. Di ronahiya van pêşketinên giştî de mirov dikare ronahîbûyînê bi du awayan binirxîne: Ya yekem, ronahîbûyîn, weke herikîneke dîrokî ji aliyê zanist, huner û teknolojiyê ve, weke pêvajoyeke pêşxistina raman û






peydakirinê, binirxîne. Ya duyem, li gorî têgeha wê, qutbûn û tevlîhevî ye.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Ronesans, kengî dest pê kir û xwe li ser çi ava dike?

2- Dayîka xwedawend, kîjan amûrên ku dibin bingeha derketina ronesansê li Mazopotamyayê afirandine?

3- Reformasyon, tê çi wateyê?

4- Sedema lewazbûna dêrê, çi ye?

5- Ronahîbûyîn, bi riya kîjan baskan belav bûye?

6- Cudahiya di navbera ronesans û reformasyonê de çi ye?

## 4- Amûrên Ku Kapîtalîzmê ji bo Pêşveçûna Xwe bi Kar Anîne



Pîramîda Kapîtalîzmê

### 1- Zanist

Nêzîkatiya ku tenê girîngiyê dide hîmê zanyariyê, rêbaza zanistê ye. Ev jî diyar dike ku bi ceribandin û çavdêriyan em digihêjin zanînên rast. Lê belê, kapîtalîzm zanistê, tenê ji bo daneheva pereyan bi kar tîne. Wê demê pir ziyan digihêjin xweza û jîngehê, ev jî bandoreke neyînî li ser civakê dike. Bi vî awayî, zanist dibe zanistperestî.

### 2- Olperestî

Ji ber berjewendiyên têkel ên di navbera kapîtalîzm û olperestan de dibe sedem ku kapîtalîzm, olperestan ji bo desteserkirina civakê, weke amûrekê bi kar bîne. Bi riya rêzgirtina civakê ya ji nirxên olî re, wisa civak tê xapandin û dibe amûreke kapîtalîzmê.

### 3- Zayendperestî

Zayendperestî, bîrdoziya ku zayendekê di ser zayenda din re dibîne û vê baweriyê diparêze ye. Di civakê de parastina bîrdozî, bawerî û ramana ku zilam ji jinê bi nirxtir, ango zilam ji jinê hêjatir e, dike. Ev têgeh, bi pêşketina çanda desthilatdar a zilam (baviksalarî) re dest pê dike.








## 4- Netew-Dewlet

Ew dewleta ku di bingehê xwe de tenê yek neteweyî dihewîne ye. Hemû endamên wê li ser bingehê netewebûyînê hevgirtinekê bingeh digirin, ew jî şêweyê sereke yê dewletê ya di modernîteya kapîtalîzmê de ye ku tu carî netew-dewlet ji faşîzmê nayê cudakirin.

## 5- Lîberalîzm

Hizirînerê sedsala 17'an, ê bi navê John Locke (Con Lok) (1632-1714), weke damezrînerê lîberalîzma ramyarî tê pejirandin. John Locke, di heman demê de teorîsyen û pêşengê sazûmaniya dewleta lîberal tê pejirandin. Lê belê, teorîsyeniya aboriya herêmî ya lîberalizmê cara pêşî hizirînerê îngilîz ê bi navê Adem Smith (Adem Simît) kiriye. Di vê mijarê de Smith weke Damezrînerê aboriya lîberalîzmê tê pejirandin. Di bingehê de li gel pêşketina lîberalîzmê, aborî û siyaseta lîberalîzmê, hev temam - kirine. Di roja me de lîberalîzmê, nasnameyeke aborî, ramyarî û civakî qezenc kiriye. Xweperestiyê bingeh digire.



John Locke

## 6- Xweperestî

Tê wateya kesê ku tenê bi xwe dihizire, berjewendiyên xwe di ser hemû tiştan re dibîne, ji sinc û nirxên civakî dûrketinê dijî.

## 7- Pîşesazîtî (Endustriyalîzm)

Qadeke bingehîn a ku pergala kapîtalîzmê hebûna xwe li ser saz kiriye. Pîşesazî (endustrî) û pîşesazîtî, ne heman tişt in. Pîşesazî tê wateya pêşketina teknîk û teknolojiyê. Pîşesazîtî jî, tê wateya yekdestkirina pêşketinên teknîkê û wê li dijî civakê vedigerîne pergala fêde û dagirkirinê.

## 8-Yekdestî-Aborîperestî

Kapîtalîzm, kombûnên aborî yên civakê dixe bin venêrîna xwe, di yek destî de kom dike û li ser vê desthilatiyê dike.

## 9- Talankirin



Di cîhanê de dewletên sereke bi vedîtinên cîhanê yên nû re dikevin nava pêşbirkê, ji bo dagirkirin û talankirina welatên dewlemend, her tim di navbera wan de nakokî û pevçûn hene. Cihên ku têne vedîtin û welatên tên dagirkirin hemû nirx û dewlemendiyên wan tên talankirin.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Çawa zanist, dibe zanistperestî?
2- Çawa zayendperestî di civakê de tê meşandin?
3- Çima şêweyê netew-dewletê, ne li gorî civakbûyînê ye? Binirxîne.
4- Cudahiya di navbera pîşesazî û pîşesazîtiyê de çi ye?
5- Bersiva rast hilbijêre.
- Netew-dewlet
A) Ew dewleta ku di bingehê xwe de pir neteweyan digire ye.
B) Ew dewleta ku ji faşîzmê nayê cudakirin.
C)Ew dewleta ku hemû endamên wê li ser bingehê netewebûyînê hevgirtinekê bingeh nagirin.







# ŞOREŞÊN KU KAPÎTALÎZMÊ BI KAR ANÎNE

## a- Şoreşa Îngiltereyê

Di Şoreşa Îngiltereyê ya di sala 1648'an de diyardeya olê, bingehê bîrdoziya şoreşê pêk aniye. Yekane xala ku dijminên qral tê de hem raman bûn, ew bû ku li hemberî Dêra Anglîkan in. Ji bo puritenan (piyûrîtenan) saziya metranan, bi qasî ku li dijî giyana wekheviyê ya Încîlê ye, di heman demê de hebûna hiyerarşîk a dêrê jî, berovajî cewhera ramana xirîstiyaniyê bû.

Ji aliyekî din ve di şerê navxweyî de pirsgirêk ev bû: Li Îngiltereyê wê bi awayekî stemkar ol û dêr bi destê metran û sermetranan hatibana birêvebirin, an jî wê ol û dêr ji aliyê endamên komeleyê yên bi hilbijartinan ve hatine hilbijartin, werin birêvebirin. Di encama şoreşa bûrjûwazî de bandora monarşiya mutleq, begên feodal, dêra mutleq girêdayî qral ji holê hatin rakirin. Astengiyên ku li pêşiya pêşketina kapîtalîzmê bûn, ji holê hatin rakirin. Li Îngiltereyê piştî şoreşê, pîşesaziya ku xwe dispêre çandinî û keda dest, bi taybetî kargehên hesin û hiriyê gelekî pêş ketin.



Charles

Şoreşa Îngilîz, ji aliyê hin kesan ve weke şerê navxweyî dihat şîrovekirin. Hin kesan jî, weke raperînekê digirtin dest û hin kesan jî, weke aloziyekê didîtin. Cudahiya şoreşa îngilîz a ji şoreşên din ev bû: Armanca wê, ne ew bû ku bi temamî pergalê biguhere. Armanca şoreşa îngilîz, xwedîlêderketina li kevneşopiyên xwe bû. Bi giştî, parastina mafên ramyarî bû. Di vê şoreşê de bandora olê jî pir bû. Rêbazên ku Charlesê (Çarlis) Yekemîn di rêveberiya welat de bi kar tanîn, di nava gel de rê li ber

aciziyan vekiribû. Pêkanînên şaş ên qraliyetê û nerazîbûnên li hemberî wan pêkanînan li welat, rê li ber aloziyekê vekir. Parlementoya ku ji ber aloziyê kom bû û dema ku ji bo şerê li hemberî Îskoçyayê desteka aboriyê nepejirand, Charles ji bo civînê bangawazî kir. Armanca wî ya di vê civînê de jî, ew bû ku dawî li rêveberiya 11 salan bîne. Rêveberî, ji bo ku destûrê nede tiştekî wiha, kesên ku Charles ew anîbûn erkên girîng, ji kar kişandin. Paşê jî, ew kes bi darvekirinê ceza kirin.

Charles jî weke qralên din, neçar bû ku gelek qraliyetan bi rê ve bibe. Vê rewşê, encamên neyînî çêdikir. Piştî ku beşa yekemîn a şer qediya, îskoçan Charles radestî parlamentoyê kirin. Di wê pêvajoyê de di navbera artêş û rêveberiyê de nêrînên cuda pêş ketibûn. Pêşinyarên ji bo çareseriyê yên rêveberiyê artêş dixist nava fikaran. Charlesê ku artêş ji destê parlamentoyê wergirtibû, dema ku reviya, şer ber bi asteke cuda ve çû. Charles, piştî wê bûyerê hat darvekirin. Piştî darvekirina qral, pêvajoya ceribandinê ya 10 salan dest pê kir. Dihat gotûbêjkirin ku li şûna rêveberiya ku bi ser nakeve, wê çi were bicihkirin. Astengiyên ku di parastina şoreşê de derdiketin holê, bûn sedem ku kesên pêşengî ji şoreşê re kirine, hinek bergiriyan bigirin. Tevî vê jî, Îngiltere bi awayekî ramyarî negihîşt pêvajoya şoreşê.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Di Şoreşa Îngiltereyê de, yekane xala ku dijminên qral tê de hem raman bûn, çi bû?

2- Di Şoreşa Îngilîz de pirsgirêka şerê navxweyî çi bû?

3- Cudahiya Şoreşa Îngilîz a ji şoreşên din çi bû?

4- Cihên vala, bi peyvên guncaw dagire.

Charles jî weke qralên din .......... bû ku gelek qraliyetan bi rê ve bibe. Vê rewşê encamên ............ çêdikir. Piştî beşa yekemîn a şer qediya ............... Charles radestî parlamentoyê kirin. Di wê pêvajoyê de di navbera artêş û .................... de nêrînên cuda pêş ketibûn.







## b- Şoreşa Emerîka

Di şerên heft salan ên di navbera 1756 û 1763’yan de rûdayî, her çi qas Birîtanya bi awayekî serkeftî ji vî şerî derketibe jî, di aliyê aborî de tengav dibû. Dema ku rêveberên Birîtanya dixwestin ziyanên şer, ji koloniyan bi girtina bacan derbas bikin, rastî nerazîbûnên koloniyên li Emerîkayê hatin. Li hemberî vê helwesta Birîtanya, berpirsên koloniyên Birîtanya yên li Emerîkayê, di sala 1774’an de kongreya Fledelfiyayê li dar xistin.

Di vê kongreyê de du biryarên girîng hatin stendin. Ev biryar, wiha ne:


- Bêyî ku rizaya Meclisa koloniyan bê girtin, wê bac ji hêla Îngiltereyê ve neyên stendin.
- Biryara zagonên ku bazirganiyê asteng dikin, hat rakirin.

Dema ku Brîtanyayê ev biryar red kirin, di navbera Brîtanya û koloniyan de şer derket. Li ser vê rewşê di kongreya duyemîn a li Fledelfiyayê kombûyî de serbixwetiya 13 koloniyan hat ragihandin. Biryara şerê bi Brîtanyayê re hat girtin. Wekî din di sala 1776’an de‘’Danezana Mafê Mirovan’’ hat pejirandin û hat ragihandin.



## c- Şoreşa Fransa

Fransa, dewleteke ku bi qraliyetan ve dihat birêvebirin. Ji sedsala 16'an û pê de, lihevnekirina di navbera gel û qralan de, her ku diçû zêde dibû. Çewisandinên rejîma qral ên ku li ser gel pêk dihatin, gel pir tengav dikirin û ber bi dawiya sedsala 17'an ve pêwendiyên di navbera rêveberiya ramyarî û gel de hatibûn ber qutbûnê. Têkçûnên ku di rêveberiya qraliyetê de hatine jiyîn, di siyaseta ji derve de jî, xwe dane der û ev li dijî ramanên saziya qraliyetê bi hêz kirin û bûne bingeh ji bo hilweşîna sazûmaniya qraliyetê.



Şoreşa Fransa

Li Fransayê ji beriya şoreşê, çêkereke ku xwe dispart newekhevîbûneke civakî hebû. Li gorî vê gel bi giştî weke çînên xwedî maf û yên ne xwediyên tu mafan, ji hev belav dibûn. Çîna xwediyê maf ji malmezin û keşeyan, a bê maf jî ji bûrcûwazî û gundiyan pêk dihat. Bi taybetî, ji gelê hejar ê ku li hemberî çîna serdestiyê, diperçiqî.

Ramana rasyonalîst (biaqil) li dijî sazûmaniya rêveberiya Fransayê bû. Ji vî alî ve ramana rasyonalîst, di pêkhatina şoreşê de roleke girîng lîstiye. Rewşenbîrên fransî yên ku ramana rasyonalîst diparastin (Montesko, Jan Jak Rosso, Voltaire) rejîma Fransayê rexne kirin û riyên nû yên çareseriyê destnîşan kirin.








Şoreşa Fransa (Zindana Bastîlê)

Di tevahî sedsala 18'an de, şerên hatine kirin û mesrefên çêbûne, rewşa aboriya Fransayê xerab kiribû. Astengiyên aborî û giraniya bacan, gel xistibûn rewşeke pir tengezar. Wekî din, piştî vedîtinên erdnîgarî, çîna bûrjûwazî dewlemend bûbû û dixwest ku mafên ramyarî jî bi dest bixe. Ev jî, dibû sedemeke din a girîng a şoreşê.

Bandora Birîtanya û Emerîkayê ya li ser gelê Fransayê, roleke din a girîng lîst. Gelê Fransî, ew maf û azadiyên ji bo gelên Brîtanya û Emerîkayê hatine dayîn, dixwestin ji bo wan jî, heman maf bên dayîn. Gelê ji bo vê armancê serî hildan, destpêkê êrîşê dibin ser Zindana Bastîlê ku girtiyên ramyarî di vê zindanê de diman, serbest berdidin. Piştî vê bûyerê, gel êrîşî qesra rêveberiyê dike û dawiyê li rejîma qraltiyê tîne.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Çima berpirsên koloniyên Brîtanyayê li Emerîka, kongreya Fladelfiayê li dar xistin?
2- Encamên kongreya duyemin çi bûn?
3- Di Fransayê de sedemên ku rêveberiya ramyarî û gel ber qutbûnê ve dibirin çi bûn?
4- Çîna ne xwediyê tu mafan beriya şoreşê di Fransayê de ji kê pêk dihat?
5- Hevokên rast bi (R), yên şaş jî bi (Ş) nîşan bike.
- Çîna xwediyê maf ji malmezin û keşeyan pêk dihat.( )
- Rewşenbîrên Fransî yên ku ramana rasyonalîst diparastin (Montesko, Jan Jak Rosso, Voltaîre) bûn.( )
- Şoreşgerên Fransî, destpêkê êrîşî Zindana Bastîlê dikin. ( )

# LI DIJÎ MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST RAPERÎNÊN GELAN

## a- Raperînên di Sala 1848'an de

Raperîna Lyonê ya sala 1830'î bi daxwazên civakî yên bingehîn pêk hat. Lê bi şeweyekî pir bi xwîn hat tepisandin û bûye yekem raperîna berfireh. Lê belê, raperîn di aliyê encamê de belavî qadên pir berfireh bû û di encamê de raperîna 1848'an pêk hatiye.



Raperîna 1848'an

Bi daxwazên weke ji bo mafê dengdanê, kêmkirina demên karkirinê, ji bo 10 demjimêran û ji bo pergaleke hêj demokratîktir, rêzeraperîn rûdidin, ji van a yekem di 24'ê Sibata 1848'an de li Parîsê pêş dikeve û piştre belavî tevahî Ewrûpayê dibe. Ev raperîn li bajarên Ewrûpayê yên pîşesaz pêş dikeve.

13'ê Adarê li Viyanayê, 18'ê Adarê li Berlînê dij-rabûn pêk tê, 10'ê Nîsanê li Îngilîstanê, Çartîstan xwepêşandaneke mezin pêk tînin, Di destpêka Gulanê de jî, teqîna raperînên gel li Îtalyayê pêk tê. Li gel vê, gelên Ewrûpaya Rojhilat jî ji bo ku xwe ji pergala serdest rizgar bikin, rabûn. Gelên bindest (Çek, Hirvat, Bûlgar, Sirp) ên ji gelên Slav in ku di bin desthilatdariya gelên weke Polonyayî, Macarî, Prûsyayî, Awûstûryayî de jî, ji bo azadiya xwe di rewşa raperînê de bûn.








## b- Komuna Parîsê (18'ê Adara 1871)

Di 19'ê Tîrmeha 1870'yî de Fransa, li hemberî Elmanyayê şer dide destpêkirin. Ev şer 2'yê Îlonê li Sîdanê bi binketina Fransayê bi dawî dibe. Fransa, di şer de bi binketina xwe re di dîroka xwe de sêyemîn dema komarê (1871-1940) wê bibîne.

Elmanya di şer de serketinê bes nabîne û Fransayê dagir dike. Di Çileyê 1871'ê de Fransa xwe radestî Elmanyayê dike. Dema ku hukûmet di 18'ê Adarê de dixwaze gel bê çek bike, gel derbasî berxwedanê dibe. Ev roj, weke roja komuna Parîsê tê bîranîn. Êdî, ji wê rojê û şûn de li Fransayê du hukûmet çêdibin. Yek hukûmeta komuna Parîsê, ya din jî, hukûmeta bûrcûwaziyan e. Her çi qas van komunan demkurt berdewam kiribin jî, di milê civakbûnê de gelek pêşketin bi dest xistine. Gelek komîn, koperatîf, sazî û dezgeh hatine avakirin. Bi vî awayî, ji hemû beşên gel rêxistinbûyînek pêş ketiye. Bi giştî li ser hîmê nirxên komînal û demokrat pêş dikeve. Di heman demê de ji bo komun û şoreşên pêşerojê, bingehekî ava dike. Di 28'ê Gulan a 1871'ê de ji aliyê hukûmeta bûrcûwaziyan ve bi êrîşên pir hovane, ji holê tên rakirin.

## c -Şoreşa Rûsan (24'ê Cotmeha 1917'an)

Li gorî salnameya Rûsî Jul bi kar tînin an jî, weke Şoreşa Cotmehê jî, tê pênasekirin, di sala 1917'an de di bin pêşengiya Lenîn de pêş dikeve. ( Li gorî salnameya zayînî dîroka şoreşê 7 Mijdarê 1917'an e) Di bin navê gelê hatî perçiqandin de şoreşa herî berfireh e ku Marksîzm ji xwe re bingeh girtiye dest pê dike. Li hemberî desthilatdariya bûrcûwaziyan, dest bi têkoşînê dikin, di



Karl Marx

encamê de Bûrcûwazî û desthilatdarî, şkestin û Partiya Bolşewîk bi ser dikeve. Di vê şoreşê de dewlet dest diguhere, bi vê yekemîn şoreşa komonîst bi ser dikeve.

## Pirsên Nirxandinê:

1- Bi çi armancan, rêzeraperîn li Ewrûpayê rûdidin? Şîrove bike.

2- Fransa ji aliyê kê ve tê dagirkirin û rewş çawa dibe?

3- Şoreşa 17'ê Cotmehê bi pêşengtiya kê dest pê dike û li dijî kê bû?

4- Hevokên rast bi tîpa(R), yên şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bike.

- Raperîna Lyonê bi şêweyekî pir bi xwîn hat tepisandin.

- Di 19'ê Tîrmeha 1870'yî de Fransa li hemberî Îtalyayê şer dide destpêkirin.

- Şoreşa Cotmehê di sala 1817'an de dest pê dike.

- 18'ê Adarê, roja bîranîna Komuna Parîsê ye.







# LI DIJÎ MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST ŞOREŞÊN RIZGARIYA NETEWEYÎ

Li dijî modernîteya kapîtalîst, her dem têkoşînên gelan û neteweyan pêş ketine. Bi taybetî, di sedsala 20'an de ji bo rizgariya neteweyan têkoşînên mezin hatin pêşxistin. Armanca van têkoşîn û berxwedanan, xwe ji bin desthilatdariya dewlet û hêzên mêtinger rizgarkirin û dewletên serbixwe avakirin, bûn. Ev şoreş, bi berxwedana gelên bindest û bi taybetî beşa karker hatin pêşxistin.

## 1- Şoreşa Çînê

Cihê ku destpêkê ji Şoreşa Cotmehê bandor bûyî, Çîn e. Piştî nîvê duyem ê sedsala 19'an û pê ve pêşbaziya li ser bazara Çînê tundtir dibe û di van deman de kapîtalîzm li Çînê pêş dikeve. Li ser Çînê, ji berê de Japonya, Îngilîstan û Fransa di rewşa pêşbaziyekê de bûn. Bi vî aliyê xwe ve mirov dikare Çînê, weke "*mêtingeriya hevbeş*" bigire dest û ev di cih de ye. Di destpêka sala 1911'an de bi pêşengiya Komutan Sun Yet Sin li hemberî serdestên ji derve, piştre Partiya Komînîst a di bin pêşengiya Mao de hem li hemberî dagirkeriya Japonan, hem jî li hemberî xanedanên hundir, têkoşîna gel bi rê ve dibin û encamê digirin. Bi vî awayî, Şoreşa Çînê pêk tê.


Mao

## 2- Şoreşa Cezayîrê


Ramdanê Abane

Cezayîr (1954-1962) mêtingeheke Fransayê bû. Şerê serxwebûna Cezayîrê (Şoreşa Cezayîrê) yê li hemberî dagirkerên Fransayê, di bin pêşengiya (Eniya Rizgariya Neteweyî) de pêş dikeve. Serxwebûn di encama şerekî gêrîlatî de bi encam dibe. Ev têkoşîna ku li hemberî Fransizan pêş ket, Ahmed Ben Bela dibe yekem serokomarê Cezayîra serbixwe û Ramdanê Abaneyê ku di encama pêkanîneke hundirê rêxistinê de li Mexribê hat kuştin. Di şerê heşt salan de ku di wê demê de şêniya Cezayîrê 9 milyon bû, bi qasî 1,5 milyon kes jiyana xwe ji dest dide. Di 1'ê Tîrmeha 1962'yan de bi referandûmekê, gelê Cezayîrê bi yekîtiya dengan re biryara serxwebûnê digire. Êdî Fransa nikare mêtingeriya xwe ya li Cezayîrê bidomîne, neçar dimîne vê rewşê bipejirîne û hêzên xwe yên dagirker vedikşîne.

## 3- Şoreşa Vîetnamê

Vîetnam, ji 1858'an ve dikeve bin dagirkeriya Fransayê. Di dema Şerê Cîhanê yê duyem ê sala 1940'î de bi ketina Hitler a Fransayê ve girêdayî, Japonya jî dikeve Vîetnamê û fransî jî vê yekê dipejirînin. Vîetnamî di vê demê de destpêkê li hemberî Japonan dikevin nava berxwedanê. Berxwedana ku di 1940'î de dest pê kiriye, di 1945'an de bi qezenckirina Vîetnamê bi dawî dibe. Di 2'yê Îlona 1945'an de ji aliyê Ho-Chî-Minh ve komara demokratîk a Vîetnamê tê ragihandin.




Piştî rizgarbûna ji dagirkeriya Japonan di dorê de dagirkeriya Fransiyan tê. Şerê di Kanûna 1946'an de destpêkirî, Giap(Giyab) jîriya xwe ya şer di şerê Gulana 1954'an de bi êrîşa Diyan







Biyan Fu de nîşan dide û şer bi dawî dibe. Di encama nîşandana serkeftina gel de di konferansa Cinêvê ya 1954'an de kombûyî biryar tê girtin ku Vîetnam weke Bakur û Başûr bibe du parçe. Li başûr komara Vîetnamê tê damezrandin, Giap di 1960'î de bi armanca alîkarîdayîna Eniya Rizgariya Neteweyî ya Vîetnama Başûr û ji nû ve birêxistinkirina Yekîneyên Artêşa Gel ên Vîetnamê dişîne Başûr. Hêzên DYE bi 500 hezar leşkerî ve li Vîetnamê dimîne û hemû derfetên teknîkê di destên xwe de digire, li hemberî vê hêzê, hêzên Vîetnamê di bin fermandariya Giap di dawiya şerekî dirêj û asteng de digihîje serkeftinê û Vîetnam di sala 1976'an de bi giştî ji destên mêtingeran tê rizgarkirin û dibe komareke yekgirtî. Serokê Şoreşê Ho Chî Mînh e. Giap jî fermandarê sereke ye.

### 4- Şoreşa Hindistanê


Ji ber erdnîgariya xwe ya stratejîk, bûye welatekî ku mêtingeran, li ser şerê parvekirinê meşandine. Herî dawî, ketiye bin mêtingeriya Îngilîzan. Li hemberî Îngiltereya kapîtalîst, aboriya berê hilweşiyaye, pîşekar tunebûn û civak bi tevahî hatibû gundîkirin.

Bi pêşengiya Gandhî, şerê serxwebûnê, tenê di nava çîna navîn û bi hêza çîna gundiyan pêk tê. Serkeftina Şoreşê, tenê bacên xwê yên nedadî yên Îngilîzan û bi boykotkirina berhemên tekstîlê yên Îngilîzan ve, wê bê pêkanîn. Ger tevgera Gandî ya ku li ser bingeha bêyî zor, yekîtî çêkirin nebûya, têkoşîna serxwebûnê dikare tenê bi pir xwînrijandinê çêbe. Dema ku Îngilîz têgihîştin ku nikarin li pêşiya bûyerên 1947'an bigirin, biryara ji welat veqetînê digirin. Hindistan di Hezîrana 1948'an de digihîje serxwebûna xwe.



Gandhî

## 5- Şoreşa Kubayê


Che Guevara

Ev şoreşa navê serhildana bizava 26'ê Tîrmehê ya şoreşgerê kûbayî Fîdel Kastro ye. Li dijî dîktatorê Kûbayê Batêsta tê nasîn. Serhildan, di navbera salên 1953 û 1959'an de çêbûye. Di 26'ê Tîrmeha 1953'yan de komên di pêşengiya Fîdel Kastro de, avêtin ser payegeha Monkada ya li Santiyagoyê. Serdegirtin, bi ser neket. Di Çileya 1956'an de bi beşdarbûna şoreşgerê pêşeng Che Guevara ve dest bi şerê gerîla dike. Di encamê de di Çileya 1959'an de digihîje serkeftinê û serxwebûna xwe radigihîne. Lê Guevara, li Bolîvyayê ji aliyê sîxurên istixbarata Emerîkayê ve bi reşkujiyekê şehîd dikeve.


Fîdel Kastro

## Pirsên Nirxandinê:

1- Şoreşa Çînê li hemberî kê radibe? Şîrove bike.
2- Giap, yekîneyên artêşa gel şandin Vîetnama Başûr, armanca vê çi bû?
3- Gandî bi çi şêweyî, şoreş li hemberî Îngilîzan birêxistin kiribû?
4- Taybetmendiya şoreşa Hindistanê, ji şoreşên cîhanê çi bû?
5- Têkoşîna Fîdel Kastro, çawa serkeftinê bi dest dixe?
6- Emperyalîzmê, çawa dawî li jiyana Che Guevara anî?






## BANDORA KAPÎTALÎZMÊ YA LI SER ROJHILATA NAVÎN Û KURDAN

Her çi qas çaxa Kapîtalîst ji bo gelan bibe çaxek a bi nasnameya xwe ya neteweyî, serhildan û pêşketinên mezin, lê ji bo Gelê Kurd bûye çaxeke hêj bêhtir jixwedûrketinê. Pirsgirêka kurd a bi civakên çîndar ên berê derketî û pêşketin nîşandayîn, di serdema kapîtalîzmê de êdî bûye reşegirêkek. Bi qasî guftûgoyên wek “heyîna kurdan heye, an na” bikin, hatine înkarkirin, ji mafên herî mirovî-gerdûnî heta pîvanên demokratîk, hemû azadî û mafên jiyanî yên kurdan hatine desteserkirin. Sedema kûrbûna pirsgirêka kurd bi ketina kapîtalîzmê ya Rojhilata Navîn ve girêdayî ye.

Bandorên kapîtalîzma ku bilind dibe, di sedsala 19’an de li Rojhilata Navîn xwe dan der. Gelên di bin desthilatiya Împaratoriya Osmaniyan de bi bandora aliyên neteweperest ketine şerên serxwebûnê. Van bûyeran di sala 1830’î de li Yewnanîstanê dest pê kir, bi rêzê ve li Sirbîstan, Romanya, Bûlgarîstan, Arnawûtê berdewam kir û bi vî awayî, ev gel gihîştin serxwebûna xwe. Di vê navberê de dewleta Osmanî bi hin lîstokên hevsengiyê yên weke kapîtalîzmê bipejirîne û biçe reforman, an jî li hemberî wê sekneke tund nîşan bide û li ber xwe bide, xwestiye hebûna xwe berdewam bike.

Dema ku li aliyekî, dixwestin Împaratoriya Osmaniyan li ser lingan bigirin, li aliyekî din, di serî de Îngiltere û dewletên emperyalîst, li Rojhilata Navîn bi polîtîkayên xwedîderketina li xirîstiyanan tev geriyane. Kurd tecrîd kirin û bi vî awayî weke hêzeke dijber ji bo ku Împaratoriya Osmanî bi emperyalîzmê ve

were girêdan, bi kar anîne. Çêkera Împaratoriya Osmanî ya her diçe navendî dibe û tecrîda li ser kurdan dihat meşandin, rê li ber du encaman vekir: Yek, serhildanên sedsala 19’an, a din jî zemînekî baş ji bo polîtakaya 'belav bike-bi rê ve bibe' ya Îngiltereyê çêkir. Neteweperestiya ku li Rojhilata Navîn pêş ketiye, dibe sedema ji hev cudabûn û dijberbûna gelan. Di cewher de bi pêşketin û girêdana kapîtalîzmê ya li Rojhilata Navîn pêş ketiye. Bûyîna kurd tenê jî, tê wateya hilgirtina metirsiyeke pir mezin. Serdema kapîtalîzmê, ji bo kurdan tê wateya stemkarî û zordariyên di tevahî pergala şaristaniyê de berdewamkirin û bilindkirina wan e. Pirsgirêka Kurd, êdî bûye girêkeke kor. Serhildan, mîna pejirandina jiyaneke herî birûmet ragihandin. Kurd, ya wê dev ji hemû mafên gerdûnî, mirovî û pîvanên demokratîk berdin, an jî ji bo qezenckirina wan wê berxwedaneke bêhempa bimeşînin.




Di Rojhilata Navîn de Cihê Kurdistanê







# Pirsên Nirxandinê:

1- Sedema kûrbûna pirsgirêka kurd, çi bû?

2- Serdema kapîtalîzmê, ji bo gelê kurd serdemeke çawa bû?

3- Dewleta Osmanî, dixwest bi çi awayî hebûna xwe berdewam bike?

4- Tecrîda ku li ser kurdan dimeşandin, rê li ber çi vekir?

5- Cihên vala, bi peyvên guncaw dagire.

Pirsgirêka kurd, êdî bûye girêkeke kûr. Serhildan, mîna pejirandina jiyaneke herî .............. ragihandin. Kurd, an wê dev ji hemû .............. gerdûnî, ................... û pîvanên demokratîk berdin, an jî ji bo qezenckirina wan wê ............................. bêhempa bimeşînin.

## Pirsên Nirxandina Beşê

**1.** Pênaseya kapîtalîzmê çi ye? Binivîse.
**2.** Kapîtalîzm, pergaleke çawa ye? Binirxîne.
**3.** Çalakiyên aborî yên xwe dispêrin gundan çi ne û xwe dispêrin kîjan armancan? Veke.
**4.** Tevlîbûna çalakiya aboriyê ya bajaran, li ser kîjan bingehî pêş dikeve? Veke.
**5.** Têkiliya aborî ya di navbera gund û bajaran de li ser kîjan pêwîstiyên bingehîn pêş dikeve?
**6.** Bazar çi ye, li ser kîjan pêwîstiyên civakî pêş dikeve? Veke.
**7.** Kapîtalîstê destpêkê çawa û li ser çi derdikeve holê? Veke.
**8.** Merkantalîzm çi ye û çawa pêş dikeve, armanca polîtîkayên merkantalîst çi ne? Şîrove bike.
**9.** Bandora merkantîlîzmê ya li ser gelan û çanda wan çi ye? Veke.
**10.** Têkiliya şoreşa pîşesazî û kapîtalîzmê, çi ye? Veke.
**11.** Encamên şoreşa pîşesaziyê bi xwe re çi anîn? Veke.
**12.** Zanistperestî, çi ye? Şîrove bike.
**13.** Neteweperestî, çi ye?
**14.** Bûrjûwazî, çima neteweperestiyê bi kar tîne?
**15.** Neteweperestiyê, çi ziyan daye gelan? Veke.
**16.** Oldarî, çi ye? Ji aliyê kê ve û çima tê bikaranîn?
**17.** Netewe, çi ye? Cudahiya di navbera netewe û dewletê de veke.
**18.** Dewlet-netewe, çi ziyan dane gelan? Veke.
**19.** Lîberalîzm, çi ye? Kengî û bi kîjan armancê derketiye holê?Veke.
**20.** Çi pêwendiya lîberalîzmê, bi kapîtalîzmê re heye? Veke.
**21.** Xweperestî, çi ye? Veke.
**22.** Çima kapîtalîzmê dest avêtiye pîşesazîtiyê?
**23.** Yekdestî, çi ye? Armanca yekdestiyê çi ye? Veke.
**24.** Şoreşên rizgariya neteweyî kengî û li kîjan welatan hatin destpêkirin û sedemên pêşketina van şoreşan çi bûn? Lêkolîn bike.







| FERHENGOK | |
|---|---|
| **Mencenîq** | Amûra ku di şer de agir û kevir pê dihatin avêtin. |
| **Komînal** | Civakên ku bi awayê komî  bi hev re dijîn. |
| **Cihû** | Yehûd, baweriya Ola Mûsewî |
| **Payîn** | Texmînkirin |
| **Dualîtîk** | Tiştê ku du aliyê wî heye, Mînak: Di felsefeya Zerdeşt de Ahûra Mazda û Ehrîman hene. |
| **Potansiyel** | Hêza hundirîn |
| **Esen** | Terîqeteke cihûyan e |
| **Paganîzm** | Baweriya pûtperestiyê |
| **Qulifê ayînî** | Têkoşîna civakê, di bin qulifê ayînî de dihat birêvebirin |
| **Dogmatîzma Olî** | Qalibên olî yên ku bê guftûgo tên erêkirin, ango pêşî li hizirînê digire. |
| **Bangeşe** | Propoganda, dema ku tu bi armanca nasandin, belavkirin an jî li ber dil xweşkirina doz, bawerî yan jî ramanekê bi riya axaftin, nivîsîn an jî amûrên ragihandinê kar û xebat bikî. |
| **Bertek** | Nerazîbûna li beramberî qewimîna bûyer an jî tiştekî |
| **Eşîrperwer** | Eşîrhez, ji eşîrtiyê hez dike û nirxên eşîrtiyê diparêze. |
| **Mîtolojî** | Zanista ku destan, efsane û çîrokên gelan ên kevnar rave dike. |
| **Stemkarî** | Zordarî,  çewisandina ku li ser gelan tê meşandin. |
| **Monarşî** | Desthilatiya qraltiya yek kesî. |